

naveroke

dosye

- ✱ **SERGOTAR** / Editor - 2
- ✱ **QEDRÎ CAN, OMER SEYFETTÎN Û ÇEND PIRS** / Servet DENÎZ - 3
- ✱ **SÊ NAV: HESARÎ, SEYDA, CEGERXWÎN** / Arjen ARÎ - 7
- ✱ **MÎRATEYA HEVPAR A MIROVAHIYÊ: WÊJE** / Adar JIYAN - 11
- ✱ **LOTTOYÊ KURDISTAN RIZGAR KIR** / Qado ŞÊRÎN - 13
- ✱ **ÎŞARETA BI XETER** / Ehmed TARÎ - 14
- ✱ **LEVKETIN** / Amed Çeko JIYAN - 17
- ✱ **ŞEVA HINÊ** / Recep DILDAR - 19
- ✱ **ZILAMÊ BAŞÛRÎ** / Ronald DAHL - 21
- ✱ **EM DIKIN Û NAKIN TIŞTEKÎ JÊ FAM NAKIN** / Evdile KOÇER - 54
- ✱ **SAR** / Ronî WAR - 55
- ✱ **LÊ LÊ NELORÎNE: HEYRANBÊJÊN GUNDÊN ME JÎ NEMANE** / Omer DILSOZ - 56
- ✱ **LEHENGÊ NUMAREYA 8'AN** / Kamran Simo HEDILÎ - 57
- ✱ **QÊJÎNA GUVERNÎCA** / Tuvfik YAŞLI - 58
- ✱ **JIYANA TENTENEKIRÎ** / Eziz XEMCIVÎN - 59
- ✱ **AGIR Û XWELÎ** / Îlhamî OZER - 60
- ✱ **MIRÎ TÊN JIMARTIN** / Cihan ROJ - 61
- ✱ **GULAN NEHÊLE** / Mizgîn AYDIN - 62
- ✱ **DENGÊJEK Û LAWIJEK** / Hilmi AKYOL - 64

- ✱ **WÊJEYA KURDÎ Û MEDRESE** / Amadekar: Azad ZAL - Omer FÎDAN - 27
- ✱ **WÊJEYA KURDÎ Û MEDRESEYÊN KURDAN** / Ayhan MERETOWAR - 28
- ✱ **JI HUNDIR VE ZANÎNGEHÊN QEDÎM; MEDRESEYÊN KURDISTANÊ** / Merdan NEWAYÎ - 31
- ✱ **MEDRESEYÊN KURDÎ** / Zeynelabidin ZINAR - 34
- ✱ **MEDRESEYÊN KURDISTANÊ** / M. Reşid IRGAT - 38
- ✱ **FERMANA BO MELAYÊN BÊ MÎ'AŞ** / DILKANÎ - 39
- ✱ **"DÎ MEDRESEYAN DE ZIMANÊ KURDÎ Û WÊJEYA KURDÎ BI XWEZAYÎ HATIYE PARASTIN"** / Hevpeyvîn: Azad ZAL-Omer FÎDAN-Servet DENÎZ - 40
- ✱ **GAZINA JI FELEKÊ** / Mele XALIT - 49
- ✱ **LI SER MEDRESEYA KURDÎ LÊKOLÎNEK** / Kerem SOYLU - 51
- ✱ **ÇEND SERPÊHATİYÊN MEDRESEYAN** / Berhevkar: Omer FÎDAN - 52
- ✱ **GILOR BE DIBE**
- ✱ **HÊSTIRA PÎR**
- ✱ **DEF'UL BELA**



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ
Kovara Dumehane
Hejmar - 17
Sermawez-Berfanbar 2007

Xwedî & Berpirsiyariya Nivîsaran:
Semra OZBEY

Editor:
Enise Şirin ÇAGER - Azad ZAL

Sererastkirin:
Semra OZBEY - Servet DENÎZ

Mizanpaj & Berg
Azad ZAL

Wênayê Berga Pêşin:
Mizgefta Sor/Cizirê (Selmet GULER)

Şewirmendê Hiqûqê:
Av. Muharrem Erbey

Çapxane:
Berdan

Navnîşan:
Kalem Sk. No: 32 Huzurevleri
DIYARBAKIR

Tif:
(0412) 237 43 16

E-Mail:
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB:
www.kovaraw.com

Şertên Abonetiye:

Nava Welat, salek: 20 YTL
Welatên Dereke, salek: 60 EURO

Banqe & Nimroya Hesabê:

Semra OZBEY
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakir
YTL: 8300 195 27 89
EURO: 8300 071 16 47
USD: 8300 071 16 52

Nimroya Hesabê PTT'ê:

Semra Ozbey - 5426215

*Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tên şandin, li xwediyên wan nayên vegerandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji Edîtor...

Merheba

Payîz hat û bi payîzê re çend nivîskar û wêjevanên me yên hêja jî wekî pelên daran yên ku di payîzê de diweşin yek bi yek ji nava me bar kirin û tevî karwanê koça dawî bûn. Mirinên li welatê me her tim bê wext bûne û li dû xwe xemgînî û dilêşî hiştine. Di demeke kin de çend nivîskar, ferhengzan, lêkolîner û rewşenbîrên me li dû hev çûn ser dîlovaniya xwe... Wek roman-nûsê hêja Mehmed UZUN, nivîskar û ferhengzanê hêja Salah SAADALLAH, lêkolîner û ziman-zanê birûmet Ordîxanê CELÎL... Em jî vê hejmara Kovara Wyê diyarî giyana wan a pak û rind dikin.

Vê payîzê jî aliyê siyasetê ve jî sorbûn û germahiyek bi xwe re anî. Wekî her car dîsa agirê şer li Rojhilata Navîn tê gurkirin û dîsa li ser xaka me, li ser daw û doza me kurdan benê xenîqê tê jidandin. Şûr ji kalanan hatine kişandin, çavên guran sor bûne, guhên roviyan bel bûne û li ser xaka me halana şer tê lidarxistin. Şatika hewara şer li dar ketiye dîsa....

Di bin siya halana şer û çavsoriyê de me xebatên xwe domand û bi hêviya ku başî, xweşî, sadî û bextewarî li welatê me bibare me hewl da ku bi naverokeke wêjeyî ya rind em derbikevî pêşberî we...

Di vê hejmarê de me wekî dosye mijareke balkêş û girîng girte dest. Qada ku wêjeya Kurdî tê de aj daye û nîhal û şax vedaye girte nava rûpelên kovarê... Medreseyan Kurdî...

Di medreseyan de (her çiqaş li ser bingeha perwerdehiya olî bin jî) gelek wêjevan û hozan û helbestvanên hêja derketine. Bingeha Wêjeya Klasîk a Kurdî li medreseyan hatiye danîn. Lê hê jî Wêjeya Klasîk a Kurdî bi dorfirehî nehatiye vekolandin. Ev jî bi zanîna bingeha medreseyan gengaz e. Nivîskar û wêjevanên me yên nûjen zêde haya wan jî wêjeya klasîk tune ye, ya jî zêde girîngiyê nadinê; jî aliyê din ve jî nivîskar û wêjevanên me yên nîfşa medreseyan jî zêde bi çêyî li wêjeya nûjen nanihêrin. Ji ber vê me bi vê mijarê xwest ku qet nebe derî lê vebe û nîfşên nûjen û nîfşên klasîk bi hev bihesin...

Xwendevanên delal;

Di vê hejmarê de jî me xwest ku em kovareke têr û tijî bigihînin ber destê we. Di vê hejmarê de Serwet DENÎZ, Arjen ARÎ, Adar JIYAN bi nîrxandinên xwe; Qado ŞÊRÎN, Ehmed TARÎ, Amed Çeko JIYAN, Recep DILDAR, Ronald DAHL, Evdile KOÇER, Ronî WAR, Omer DILSOZ, Kamran Simo HEDILÎ bi çîrok û hêçanên xwe; Tevfîk YAŞLI, Ezîz XEMCIVÎN, Îlhamî OZER, Cihan ROJ, Mizgîn AYDIN bi helbestên xwe û Hilmî AKYOL jî bi berhevkariyê ya Zargotina Kurdî dibin mêvanê we.

Dosyeya me ya vê hejmarê jî aliyê Azad ZAL - Omer FÎDAN ve hate amadekirin û bi nivîs û helbestên xwe Ayhan MERETOWAR, Merdan NEWAYÎ, Zeynelabidîn ZINAR, M. Reşîd IRGAT, Kerem SOYLU, DILKANÎ, Mele XALIT û Melayê Cizîrî dibin mêvanên we.

Me di hejmarên berê de diyar kiribû ku em ê bi tenê kesan wekî dosye negirin dest; em ê heyam û berhemên ku li wêjeya kurdî bandor kirine jî bigirin dest. Di hejmara 18'an de em ê li ser "Bingehên Nûjenîya Wêjeya Kurdî" bisekinin û wekî dosye bigirin dest. Yên ku di vê mijarê de gotina wan hebe û bixwazin beşdarî vê nîqaşê bibin dikarin nivîsên xwe ji me re bişînin...

Bi hêviya ku aştî û bextewarî para we be û wêjevanên me bi xweziyên nûcomayî û hesreta welatê xwe ji nava me bar nekin bimînin di xweşiyê de....

Qedrî Can, Omer Seyfettîn û Çend Pirs

Serwet DENÎZ

Ji vir û çend sal berê gava min Antolojiya Edebiyata Kurdî ya Mehmed Uzun xwend tiştêkî bala min kişandibû. Di antolojiyê de qala Qedrî Can dihat kirin. Û ligel jiyana wî sê çîrokên wî jî di antolojiyê de ci girtibûn. Çîrokên wî yên bi navê 'Sond' û 'Guneş' jî min re pir nas dihatin. Ev cara pêşîn bû ku min ev çîrok bi kurdî dixwendin. Lê min baş dizanibû ku min berê jî ev çîrok xwendine. Paşê min da hişê xwe û hat bîra min ku min ev çîrok di dibistana seretayî de xwendine. Di pirtûka dersa tirkî de, di ya pola çaran an jî pêncan de bûn.

Di gulana 2007'an de Weşanxaneya Lîsê bi navê Pirtûkxaneya Ehmedê Xanî rêzek pirtûkên ku ji klasîkên kurdî pêk dihat weşand. Di nava van pirtûkan de çîrokên Qedrî Can jî bi navê 'Guneş' hatine weşandin. Min pirtûk xwendin û dor hat ser ya Qedrî Can. Gava min çîroka 'Guneş' xwend heman tişt hatin bîra min.

Min jî xwe re gotibû ku ez ê vê yekê vekolim. Lê ji ber mercên ku wê gavê ez tê de bûm ne pêkan bû. Ya din jî ne navê çîrokê û ne jî navê nivîskar dihat bîra min. Tenê naverok di bîra min de mabû. Gelek sal di ser re derbas bûbûn. Gava ku min di antolojiya Mehmed Uzun de xwendibû 12-13 sal di ser re derbas bûbûn û niha jî 22-23 sal di ser re derbas bûne. Min kir û nekir navê nivîskar û çîrokê nehatin bîra min. Ez li pirtûkên wê demê geriyam. Min bi dest nexistin. Çûm pirtûkxaneya Amedê, wekî ku pêşiyên me gotine; hundir bi qurbana derve be. Di dawiyê de min hawar û gazî li Googleyê daxist û min yek sererast kir. Sond (Ant) a Omer Seyfettîn e. Min lê nihêrt, erê ya ku ez lê digeriyam ew bi xwe bû. Lê 'Guneş' hîna jî min bi dest nexistiye.



Gava ku mirov 'Sond'a Qedrî Can û 'Ant'a Omer Seyfettîn dide ber hev mirov dibîne ku heman çîrok in. Tenê ziman cihê ye. Cî heman cî ne. Bûyer heman bûyer in. Encam heman encam e. Lê ji bo mirov bizanibe kî di bandora kê de maye, kê ev çîrok jî kê girtiye divê mirov li jiyana her du nivîskaran binihêre. Dibe ku mirov hinekî mijarê zelal bike.

Omer Seyfettîn bi eslê xwe ji Kafkasyayê ye. Bavê wî di artêşa osmanîyan de leşker bûye. Ew bi xwe di 28'ê sebata 1884'an (koçî 1300) de li Gonena Balikesirê ji dayik bûye. Piştî ku xwendina xwe kuta kiriye, wek efser tevli artêşê bûye. Di sala 1914'an de ji artêşê veqetiyaye û li Kabataş Erkek Lisesiyê dest bi mamostehiya wêjeyê kiriye. Di 6'ê adara 1920'an de miriye. Ew bi xwe kesekî netewperest e. Ev yek xwe di berhemên wî de jî dide xuyakirin.

Qedrî Can di sala 1911'an de li Dêrika Çiyayê Mazî hatiye dinyayê. Di sala 1931'an de koçî binxetê kiriye. Di 09. 08. 1972'yan de çûye ser dîlovaniya xwe. Çîroka bi navê 'Sond' di 12.09.1941'an de, di hejmarê 35'an a Kovara Hawarê de weşandiye.

Li gor van agahiyan ne pêkan e ku Omer Seyfettîn di bin bandora Qedrî Can de mabe an jî çîrok jê girtibe. Lewre 21 sal di ser mirina Omer Seyfettîn re derbas bûne, hîna Qedrî Can ev çîrok weşandiye. Gava ku Omer Seyfettîn miriye Qedrî Can 9 salî bûye. Aliyekî pîrsa me zelal bû. Omer Seyfettîn bi tu awayî di bin bandora Qedrî Can de nemaye û ev çîrok jî ber çîroka wî negirtiye.

Dibe ku Qedrî Can jê girtibe?

Belê dibe û îhtimaleke pir xurt e. Qedrî Can di dibistanên tirkî de xwendiyê. Ku mirov ji aliyê pergalekê ve bê perwerdekirin, normal

e ku mirov di bin bandora wê de ji bimîne. Û dema ku Qedrî Can dibistan xwendiyê, hişmendiya Omer Seyfettîn û yên wek wî di gurê de bûye, li Tirkîyeyê ew li ser kar bûne. Pergala perwerdehiyê jî li gor wan teşe girtiye. Ji ber van sedeman em dikarin bibêjin ku Qedrî Can ev çîrok jî Omer Seyfettîn girtiye.

Lê du ihtimalên din jî hene. Yek; dibe ku her duyan jî ji yekî/a din jî girtibin. Lê ji bo piştrastkirina vê ihtimalê anîha tu delîl di destê me de tune ne. Em tenê dikarin wek ihtimalê lê binihêrin. Em ne ji sedî sed dikarin bibêjin 'erê' û ne jî dikarin bibêjin 'na'. Ya duduyan; dibe ku her duyan ev çîrok jî ber

çîrokeke zargotinî (devkî) girtibin. Ev jî tenê ihtimalek e. Di van mercan de em nikarin piştrast bikin. Lê gava ku mirov çîrokê him bi tirkî û him jî bi kurdî dixwîne, hîsên mirov jî mirov re dibêjin; ev çîrokek devkî ye, paşê hatiye nivîsandin. Tiştên ku van hîsan bi mirov re çêdikin awayê vegotina çîrokê û sadebûna ziman in. Bi taybetî di dema Omer Seyfettîn de zimanê tirkî yê nivîskî ew qas xwerû û sade nebû. Tevî ku Omer Seyfettîn û hempayên wî ev yek parastine jî ez ne bawer im ku zimanê nivîskî bi vî rengî be. Lê dijberî vê yekê zimanê çîrokên devkî yên ku di nav gel de tînin gotin pir sade ye. Tevî van gumanan

BEŞEK JI "SOND" A QEDRÎ CAN (*)

Di dersxanê de awakî cezayê hebû, felaqe. Heta keçikên mezin jî xwe ji felaqê xelas nedikirin. Kesê ku ji felaqê netirsiya û jê nericifîya tune bû. Ew ê ku cirma wî biçûk bûya, Xocê biçûk bi çend şimaqan û Xoca mezin bi çend daran canê wî dîtevizand û serê wî diwerimand.

Ji aliyê lêxistinê para min ji gişan kêmîr bû. Bi tenê carekê Xoca mezin jî ber "derew"ê guhê min pir zêde kişand û ez êşandim. Heta çend rojan sorbûn û êşa guhê min neçû. Digel vê qasê tu qebaheta min tune bû û min rast gotibû...

Rojekê, zarokêkî bilbilokê bermîla nimêjê şikandibû. Her du xocan dixwest bizanin xwediyê vê cirmê kî ye? Yê ku ew şikandibû zarokêkî biçûk, ziravok, nexweş û bêcan bû. Min ew jî Xoca mezin re got. Xocê dikira ew bavêta felaqê. Wî jî înkâr dikir. Wê gavê zarokêkî din hate ba Xocê û got: "Yê ku bilbilok şikandiye ez im û ne Misto ye." Û xwe li ber felaqê dirêj kir. Hingî darê Xoca xanimê hilat û daket; zarok bi kel û girî, bi ax û waxîn bîst sih dar xwarin. Paşê Xoca mezin li min vegeriya û got: "Te çima derew û bêbextî li hevalê xwe kir?" Wê gavê guhê min çend caran û wer kişand ku ez ji erdê bilind dibûm...

Ez giriyam... giriyam... çima ku min derew nekiribû. Belê, yê ku bilbilok şikandibû Misto bû; û min ew bi çavên xwe dîtibû û paşê min jî Xoca mezin re gotibû.

Piştî ku em ji dersxanê belav bûn, min ew zarokê ku derew li xwe kir û xwe li ber felaqê direj kir,

dît û min bi destê wî girt û ji wî pirsî:

-Te çima ez derewker derexistim û te bi ser de derew li xwe kir û bêsêbeb xwe da ber kotekan; te bilbilok neşikandibû.

Ewî got:

-Belê min şikandibû...

-Na, te ne şikandibû, Misto şikand; min ew bi çavên xwe dît û paşê min ji xocê re got.

Êdin nikaribû rastî veşarta, li ruyê min nêrî û qederekî ma û paşê jî min re got: "Heke tu sond dixwî ku ji xocan re nebêji, ez ê rastiyê bêjim." Min jê re sond xwar, ji min re bûbû meraq. Ewî got:

-Belê, bilbilok Misto şikandibû, ez jî pê dizanim, lê ew pir bêcan e,

nexweş e, tu nabînî ma dikare xwe li ber felaqê bigre.

-Te çima li dewsa wî kotek xwar?

-Çima? Çima ko min bi wî re sond xwariye. Ew iro nexweş e, ez rehet im, min ew xelas kir.

-Sond çi ye?

Ewî got: "Ma tu nizanî?" Min got: "Na." Hebekî bi dûr ket û got:

-Em xwîna hevdû dimêjin û bi hev re sond dixwin. Yên sondxwarî dibin xwînberayên hev û heta mirine bi her awî arîkar û alîkariya hev dikin.

Paşê, min bala xwe dayê ku gelek zarokan bi hev re sond xwaribûn.

Rojekê, min ew bi çavên xwe dît. Xocê biçûk, li ber bermîla avê destmêj digirt. Xoca mezin, paşîya wê li me bû; nimêj dikir. Du zarokan bi kêreke dardestî, milên hev diqelişand; dilopen xwîna sor di cihê birinkirî didan û dimêtin û bi hev re sond dixwarin.

Sondxwarin û xwînberatî jî min re bûbû meraq. Xwînberakî min hebûya, gava Xoca mezin guhê min dikişand, ew ê xwe bida ber min û nehişt ku guhê min bête kişandin û carina jî ez ji felaqê xelas bikirama.

Di nav dibistanê de min xwe bi tenê didît. Hinek hevalên min hebûn. Lê me bi hev re sond nexwaribûn û em nebûbûn berayên hev.

Rojekê min daxwaza xwe ji diya xwe re got; min ji wê re çîroka sondxwarinê da zanîn. Diya min ruyê xwe bi min re tîrş kir û got: "Nebe ko tu dîn bûyî; ez wisan zarotîyan naxwazim".



jî ev tiştên ku me gotin tenê ihtimal in. Ji wê zêdetir mirov nikare tu wateyê lê bar bike.

Divê ez tiştêkî din jî bibêjim. Bêhna wergerê ne ji çîroka tirkî tê ne jî ji ya kurdî tê. Her du çîrok jî orjînal dixuyên. Lê gava ku mirov dide ber hev mirov xweş dibîne ku heman tişt in. Bi qasî ku min lê kola di tu derê de qala wergerandina van çîrokan nayê kirin. Dilawer Zengî di lêkolîneke (Ev gotar di pirtûka wî ya bi navê Qedrî Can 1911-1972 Weşanên Komal adar 2004 Stenbol de jî cih digire.) ku di malpera Tirêjê de weşandiye de dibêje; çîroka nivîskarê Misrî 'Menfelûtî' ya bi navê 'Tayek porê spî' wergerandiye zimanê

Kurdî. Lê di pirtûka ku Lîsê weşandiye de qala tiştêkî wiha nayê kirin, tenê li serê çîrokê rêzika Li Ser Şopa Menfelotî hatiye danîn (heman rêzik di Kovara Ronahiyê de jî heye). Bi baweriya min ev rêzik nade zanîn ku çîrok werger e. Ku hebin xwezî agahiyên din jî dabûna. Minak; Nûredîn Zaza kîjan çîrok jî kîjan nivîskarê girtiye û li kurdî aniye, diyar kiriye. Lê di yên Qedrî Can de mirov rastî tiştêkî wiha nayê.

Piştî ku min çîrokên Qedrî Can û Omer Seyfettîn careke din xwendin hin tiştên din jî bala min kişandin. Çîrok wek bîranîneke dema borî hatine vegotin. Bûyer bi piranî

BEŞEK JI "ANT" A OMER SEYFETTÎN (**)

Okulda yalnz iki türlü ceza vardı. Dayak... Büyük suçlular, hatta kızlar bile falakaya yatarlardı. Falakadan korkmayan, titremeyen yoktu. Küçük suçluların cezası ise belli olmazdı. Küçük hoca'nın ağır tokadı... Büyük hoca'nın uzun sopası... (ki rast geldiği kafayı mutlaka şişirirdi) Ben hiç dayak yememişim. Yalnız bir kere büyük hoca kuru kemikten elleriyle yalan söylediğim için sol kulağımı çekmişti. O kadar hızlı çekmişti ki, ertesi gün bile yanıyordu. Kıpırmızı idi. Oysa ki, hiç suçum yoktu. Doğru söylemişim. Bahçedeki abdest fıçısının musluğu koparmıştı. Büyük hoca bunu yapamıyordu. Bu mavi, cepkenli, kırmızı kuşaklı hasta zayıf bir çocuktuktu. Haber verdim. Falakaya konacaktı. inkar etti. Sonra başka bir çocuk çıktı, kendi kopardığını onun suçu olmadığını söyledi. Yere yattı. Bağıra bağıra sopaları yedi. O zaman büyük hoca; "Niçin yalan söylüyor, bu zavallıya iftira ediyorsun?" diye kulağıma yapıştı. Yüzünü buruşturarak darıldı.

Ağladım, ağladım. Çünkü yalan söylemiyordum. Evet musluğu koparıırken görmüştüm. Akşam azadında dayağı yiyen çocuğu tuttum:

-Niçin beni yalancı çıkardın? dedim. Musluğu sen koparmamıştın.

-Ben koparmıştım.

-Hayır, sen koparmamıştın. Öbür çocuğun kopardığını ben gözümlle gördüm.

Üsteleyemedi. Yüzüme baktı. Bir an öyle durdu. Eger hoca'ya söylemeyeceğime yemin edersem, saklamayacaktı. Anlatacaktı. Ben hemen yemin ettim. Merak ediyordum.

-Musluğu Ali koparmıştı, dedi. Ben de biliyordum. Amma o çok zayıf, hem hastadır. Görüyorsun, falakaya dayanamaz. Belki ölür, daha yataktan yeni kalktı.

-Amma sen niçin onun yerine dayak yedin?

-Niçin olacak. Biz onunla andıçmışız. O bugün hasta ben iyi kuvvetliyim. Onu kurtardım işte.

Pek güzel anlamadım. Gene sordum.

-And ne?

-Bilmiyor musun?

-Bilmiyorum

O zaman güldü. Benden uzaklaşarak cevap verdi.


-Biz birbirimizin kanlarını içeriz. Buna andıçmek derler. Andıçenler kan kardeşi olurlar. Birbirlerine ölünceye kadar yardım ederler, imdada koşarlar.

Sonra dikkat ettim. Okul'da bir çok çocuklar birbirleriyle andıçmışlerdi. Kan kardeşiler. Hatta bazı kızlar da kendi aralarında andıçmışlerdi. Bir gün bu yeni öğrendiğim adetin nasıl yapıldığını da gördüm. Yine arka rahlelerde idi. Küçük hoca, arkasını bize vermişti; yavaş yavaş. Bir sümüklü böcek kadar ağır, namazını kılıyordu. İki çocuk tahta saplı bir çakıyla kollarını çizdiler. Çıkan büyük kırmızı damlayı kolları üzerindeki bu çizgiye sürdüler. kanlarını karıştırdılar. Sonra birbirlerinin kollarını emdiler. Andıçerek kan kardeşi olmak... Bu beni düşündürmeye başladı. Eğer benim de kan kardeşim olsaydı hocaya kulağımı çektiirmeyecek, belki falakaya yatacağım zaman beni kurtaracaktı. Koca okulun içinde kendimi yapayalnız, arkadaşsız, koruyucusuz sanıyordum. Anneme düşüncemi her çocuk gibi birisiyle andıçmek isteğimi söyledim. And'ı anlattım. Razi olmadı. "Öyle münasebet-sizlikler istemem. Sakın yapma ha...!" diye tembih etti.

Tebîni:

⁽¹⁾ Ji pirtûka "GUNEH" ya Qedrî Can hatiye girtin. Weşanên Lîs, Gulan 2007

⁽²⁾ Ji pirtûka "Omer Seyfettin Hayati ve Eserleri" ya ku jî aliye Evrim Yeşilyurt ve hatiye amadekirin hatiye girtin. Yeryuzu Yayinevi, Eylul 2002



çend sal berê pêk hatine. Her du nivîskaran jî heman awa bi kar aniye.

Çi kesên ku li ser Qedrî Can nivîsîne, gotine ku ev çîrok beşek ji jiyana wî ne. Piranî jî ji bo çîrokên bi navê Sond, Guneh, Rojên Derbasbûyî û Serencam ev yek tê gotin. Rast e ev çîrok şopa jiyanekê ne, lê ne ya Qedrî Can. Dibe ku Rojên Derbasbûyî beşek ji jiyana wî be lê ji bo yên din ev nayê gotin. Lewre di çîroka Serencamê de jî şopên Kaşagiya (Mehes) Omer Seyfettîn diyar in.

Di Kaşagiye de leheng diçe mehesa zîvîn dişikêne û davêje cîrnê ber kaniyê. Gava ku bavê wî tê û mehesa şikênandî dibîne, ew jî ji tîrsa bavê xwe dixê stûyê birê xwe yê biçûk Hasan. Hasan ne li wê derê ye li malê ye. Gava ku tê, bavê wî sîleyekê lê dixê û wî di malê de heps dike, nahêle derkeve derve. Salek bi şûn de bi nexweşîna xirtikê (kuş palazi) dikeve û ji nişka ve dimire. Beriya ku bimire dixwaze here cem bavê xwe û jê re bibêje ku wî mehes şikênandîye û ji ezabê wijdanê xelas bibe. Lê ji ber ku bavê wî di xew de ye, qerwaş destûrê nadê. Serê sibê gava ku ji xewê şiyar dibe, dibihîze ku wê şevê birayê wî miriye. Bi wî awayî birîna dilê wî nekewandî dimîne.

Di ya Qedrî Can de mijar li ser diziya fêkiyan e. Lehengê çîrokê li denê fêkiyan xistiye, yek vala kiriye ji çîrokbêja bi navê Xecê re biriye. Şeva sersalê gava ku diya wî dixwaze here den û kûpên fêkiyan veke dibîne ku yek vala bûye û bi rûyekî tîrş vedigere. Lehengê me diziyê dixê stûyê birayê xwe yê biçûk Fethî. Fethî wê gavê ne li mal e, çûye sersala meta xwe. Gava ku tê diya wî du şîmaqên bi tîn li ruyê wî dixê. Piştî wê ji nişka ve Fethî nexweş dikeve û çend roj bi şûn de dimire. Tevî ku bîst û pênc sal di ser re derbas bûne jî bûyer jiyana wî jehrdayî dike.

Ku mirov çîrokan bide ber hev mirov ê hîn baştir fêhm bike. Lê ev mînak ne wek Sondê ye. Mirov dikare bibêje lêanînek (adapte) e. Îskelet yek e lê bi awayekî cihê hatiye honandin. D. Zengî xwestiye bi mirina Fethî,

jidayikbûna Qedrî Can Zelal bike. Nizanim ka lê kola ye ku birayekî wî yê bi navê Fethî hebûye an na, ku wek rastiyeke girtiye dest û dîrok pê zelal kiriye.

Ku em ji daneyên destê xwe bi rê bikevin, em nikarin bibêjin ev çîrok beşek ji jiyana wî ne. Her çiqas di destpêka Serencamê de gotibe; Sond. Guneh. Rojên Derbasbûyî. Serencam. Her yek ji van, ji kitêba jiyîna min a hezîn rûpelekî rengîn in. Lê rengîn dibin, zengîn dibin...Dîsa peline çiriyayî û riziya yî ne. Serencam jî, rûpelek ji wan pelan e jî, bi baweriya min ne mimkûn e ku heman tişt hem hatibin serê Qedrî Can û hem jî hatibin serê Omer Seyfettîn!

Jan
Dost ji bo
Qedrî Can
wiha gotiye; 'ew
wekî pêşengê
nûjeniyê te
hesibandin û bi rastî
jî wî tefşoyê yekem di
rêya çemê nûjeniyê
de çikand'; ku ew
pêşengê nûjeniya
me be, di nûjeniya
me de pirsgirêk
heye

Baş e. Van tiştên ku min gotin rast bin em encameke çawa bi dest dixin? Em ê bibêjin Qedrî Can çîrokên Omer Seyfettîn dizîne. Na! Ji bo min ya girîng ne ew e. Ya girîng; tesbîtkirina bingehe nûjeniya me ye. Lewre Jan Dost di pêşgotina pirtûka wî ya ku Lîsê weşandiye de ji bo Q. Can wiha gotiye; ew wekî pêşengê nûjeniyê te hesibandin û bi rastî jî wî tefşoyê yekem di rêya çemê nûjeniyê de çikand. Ku ew pêşengê nûjeniya me be, di nûjeniya me de pirsgirêk heye.

Lewre ew nûjeniyeyeke xweser nîn e û bingeha xwe ji dibistanên tirkî digire. Wisa be hinek pirsgirêkên me yên ku îro tînin jiyîn ji serê sedsalê ve hene. Tovê li hember serdestan xwe biçûk dîtinê wê gavê di bin hişê me de hatiye çandin. Ji ber wê yekê ye ku zimanê serdestan ji me re ew qas şîrîn e û her ku me ber bi nûjeniyê ve gav avêtiye parek ji zimanê xwe winda kiriye.

Gelo ku me bi derfetên xwe, bi hişmendiya xwe bingeha nûjeniya xwe danîbûya em ê îro di heman rewşê de bûna? Wê dîsa zimanê me ber bi windabûnê ve biçûya? Em ê dîsa ew qas binaliyana? Ez li bersiva pîrsekê geriyam. Min pîrsa di hişê xwe de bersivand. Aniha jî bo min a girîng bersiva wan pîrsên li jor in. An na kê çî ji kê girtiye ji min re ne derd e!

e-mail: xunav2121@hotmail.com

Sê Nav: Hesarî, Seyda, Cegerxwîn

Arjen ARÎ

*Ne ji bo ku di pirtûkan de bême hepskirin dinivîsim
yan jî ji bo şagirtên binevşê;
bo yên ku dê biçin û bîn û pêdiviya jiyînê:
weke avê, weke heyvê û pergala ku nayê guhertin
û bo nan, bo şerabê û dibistanan
û gitarê û hacetên destan*

(Pablo Nerûda)

Hemdemê Seyda Cegerxwîn helbestkarê Emerikaya Latîn, 'Albatrosê' helbesta Şiliyê Nerûda ne di destpêkê de; piştî demeke dûdirêj navê Pablo Nerûda li binê helbesta xwe bi cih dike.

Jixwe Nerûda paşnavê helbestkarê Çekî Jan Nerûda ye. Nerûda jî vî navî û jî vî helbestkarî pirr hez dike. Ev hez dike ku Nerûda li şûna navê xwe yê resen Ricardo Neftali Reyes Basoalto navê Pablo hîlbijêre û paşnavê Nerûda bike nav û nasnameya helbestkariya xwe.

Çi di wan deman de çi niha/îro, gelek şair û nivîskaran nav û paşnavine remzî/çêkirî/ yê hinekên din... ji xwe re hîlbijartine.

Ev rewş di Şiîra Diwanê de yekcar eşkeretir e.

Di şîira klasîk de kêr şairan navên xwe yên resen hilgirtine rêz û malik û bendên helbestê. Ev şêwe helbest, yanî helbesta klasîk bi qasî qalib û şêwehuner û hunerbaziya helbestkarên xwe, bi navên şairên xwe yê remzî/mahlasî jî balkêş e. Bikaranîna navê mahlasî, ne tenê taybetiyeke helbesta klasîk a kurdî ye; şairên Erebb, ên Faris û yên Osmanî jî ev yek kirine.

Di helbesta klasîk a kurdî de hin şairan çendî navên xwe yê tewaw; weke Hecî Qadirê Koyî, Şêx Rîza Talabani, Baba Tahirê Uryan/Hemedanî dîwan li dû xwe hiştibin jî; van şairan di rist û malik û çarîn û bendan de navek bi tenê: weke Koyî, Tahir, Rîza...bi kar anîne. Bi baweriya min jî helbestkarên klasîk î kurdî yê ku di şîira xwe de sê nav li dû hev; carinan cuda cuda, carinan di bendeke de li dû hev; pirr caran li ristê daraştî bi kar anîye Mele Şêxmûsê Hesarî angû Cegerxwîn e. Cegerxwîn çîroka bidestxistin -belkû bikaranîna vî navî- di helbesta xwe ya bi navê 'Ez û Gundê Hesarê' de weha eyan dike:

*Ji sala bîst û çara
Ketim rêza hişyara
Ji bo jîn û felatê
Ketim nav kêferatê
Ji çîroka Mem û Zîn
Navê xwe kir Cegerxwîn (Şefaq, rp. 96)*

Seyda di rist û malik û çarîn û bendên helbesta xwe de, herî zêde çendî wekî mahlas Cegerxwîn bi cih kiribe jî, di gelek helbestan de em li navine din ên remzî/mustear/li xwe kirî rast tîn: Weke Şêxmûs (navê resen), Mûsayê Hesarî (cihê ku jê ye, gundê wî) Hesarî û Seyda!

Ku; em hemû helbestên Cegerxwîn raçav bikin, em ê li gelek cihan rastî vê rastiyê bîn:

*Ez Mûsayê Hesarî im
Ji we tevan dilsar im
Lê ez bi we nikarim
Ez nizanîm çi bêjim (Ronak, rp. 28)*

Wekû jî çarîna li jor jî diyar e; Cegerxwîn di destpêka şairiyê de mîna şairên berî xwe: Hemedanî, Herîrî, Xanî, Koyî... hewl daye navê xwe yê resen (Şêxmûs) û navê gundê ku jê ye (Hesarê) di şîira xwe de weke remz bi cih bike, bi kar bîne.

Ev serencam heta çaxa ku biryara bikaranîna Cegerxwîn dide, dom dike:

*Ne gernas im ne egîd
Ez Şêxmûs im bê mirîd
Lê dilewkim wek berîd
Ez nizanîm çi bêjim (Ronak, rp. 28)*

Şêxmûs û Hesarî yê ku piştî xwendina Mem û Zînê biryarê dide ku navê Cegerxwîn li xwe bike, bi pêvajoya helbestê re mahlaseke din bi dest dixê: Seyda!

Şêxmûs û Hesarî û Cegerxwînê ku piştî demekê di nava gel/xelkê de bi çavê 'seydaiyê' lê têt meyzandin -ku ev yek jî ji hêla gel ve pejirandin û pesendkirina şairiya wî ye- êdî di ristê de navê/remza Seyda li gel Hesarî bi cih dike:

*Ê ko bê kuştin cihê wî bihişt
Dîwana Seyda jê re diyarî
Cegerxwîn bimrî negihê doza xwe
Gorî serê we pîrê Hesarî (Ronak, rp. 69)*

Kêfa Cegerxwîn weke mahlas, ji Cegerxwîn bêtir ji Seyda re têt ku vê remzê di gelek helbestên xwe de geh di malika dawîn de, geh di du sê malik û bendan de bi cih dike:

*Di xezel û qesideyan de di malika dawîn de:
"Ji rengê sihrê harûtî te reşçavê xwe kil daye
Kevanê ebriwê reştûz bi ser xalê de hildaye
(.....)*

*Dirisim ez bêjim lê dilê xanîm nexweş bi pê
Meraqa maçeke Seyda mexeyde hêj di dîl da ye
(Kîme Ez, rp. 220)*

*Kî dizanî ka çira yar xwe ji min wer dîr dikî
Awirek çavên belek dîl perçe perçe hûr dikî
(.....)*

*Min ji wan çavên belek sed ah û nalîn roj û şev
Lê evîn pêlan didî, wek Dicle û Xabûr dikî*

*Ma ji vê xûnxiwariyê carek kesî karek diye
Ez bi qurban bo çi Seyda dilkul û rencûr dikî!
(Kîme Ez, rp. 244)*

*Dilo mizgîn li te şabe, ko dektora birînê hat
Derefsa Kawa hilgêve şehînsaha evînê hat
(.....)*

*Evîna ber dilê Seyda ji lêvan şerbet û mey da
Perî bû yan zerî bû, di roja cejn û îne hat
(Kîme Ez, rp. 242)*

Xeyda ji min xeyîde nizamî bo çî hew tê
Zanim ji ber diya wê, ne ez diçim ne ew tê
(.....)
Ristan ji mir dibêjî şekir ji dev dirêjî
Ceger li min dipêjî, ji dil me nal û tew tê

Padîşahê hebûnê carek were tu rûnê
Seyda mekûj bi çûnê, soza te bê derew tê
(**Kîme Ez, rp. 29**)

Ji bo ko roj herî ava li dil carek bibî şevreş
Du biskên wek şeva tarî bi ser dêman de berdane
(.....)
Ji bo dil heyverona min tu derman î sebona min
Wejîn û kuştina **Seyda** di lêvên wek şeker da ne
(.....) (**Kîme Ez, rp. 250**)

Di bendên çarînî di çarîna dawîn de:

Welat va me ez şewitîm

Da ko tu zû rûgeş bibî

Ez tême kuştin çarkenar

Da ko tu zû dilxweş bibî

(.....)

Gazî dikir min xwendewar

Her dem li van min kir hewar

Hêvî ji kê bikim niha

Seyda ji wer bê hiş dibî (**Aştî, rp. 52**)

Berî çil sal me ew xwest û

Bi xeyd go: sêwiya nakim

Me go: Bê ci û bêar im

Kenî, go: Bê ciya nakim

(.....)

Me riş û cibe avêtin

Du gund ava kirin carek

Go: **Seyda** ev çî dolab in

Nizanî gundiya nakim! (**Aştî, rp. 58**)

Di du sê malikan de:

Ne tenha pîr biwe **Seyda** berê rojê li ava ye

Meger jar û birîndar e ji tîrên her du çava ye

(.....)

Her gernas di vê rê de tê kuştin her dem û gavan

Belê **Seyda** siwarê wan hemû gava û nava ye

(**Kîme Ez, rp. 280**)

Şerab û şerbeta sêva ji lêvên erxewanî da

Bi wan destên spî dilber bi cama zêrşanî da

(.....)

Li pêşber min kete kursî evîna dil ji min pirsî

Go: **Seyda** qey tu natirsî? Me bersiv pehlewani da!

(.....)

Go: Ev rast e, tu Seyda ye, dilê xemgîn te key daye

Te mal û can û mîl daye, belê wek Berdeşanî da

Bihayê wan şevên tarî evîndarî û xemxwarî

Ji **Seyda** re du sêvên sor diyarî û nişanî da

(.....)

Ji lew **Seyda** evîndar e diristê de pesindar e

Gelek pesnê xweş û şêrîn, gelo ma kî nizanî, da?

(**Kîme Ez, rp. 314**)

Di du sê bendan de:

(.....)

Go: Bêje ka **Seyda** çî ye

Bêxan û mal û bê ci ye
Bê pera û bê xercî ye
Min go: Ji Şahan qencî ye
Daxwaz me demê gurcî ye
Lê ên wekû narincî ye
Min dil ji wan re birçî ye
Heta nedî naçim ji rê
(.....)

Min go: Bi qurbanê nebî

Dil bigirî carek, tewbe bî

Seyda li ber der kole bî

Her dem li dîwana te bî

Heta spîdê ranebî

Guhdarê fermana te bî

Her çî tu bêtî her we bî

Ey gewher û taca serê (**Kîme Ez, rp. 225-226**)

Cegerxwînê ku Seyda ye angoy Seydayê Cegerxwîn

Piştî ku di nava gel de weke şair namîdar dibe
û têt naskirin, helbestên Cegerxwîn ji hêla
kurdperwer û dildarên helbesta kurdî ve têne
jiberkirin, li gund û navçe û bajarên Kurdistanê
mîna çîrok û stranên gelêrî di mawayeke kurt de
dibin malê gel.

Ev rewşa ‘rastewxo’ taybetiyeke helbesta
Cegerxwîn e.

Cegerxwînê ku xwe ji medreseyê ‘qewirandîye’
û ‘cib û şaş’ avêtiye û ‘şîir ji ezmana daxistiye erda’
bi helbesta xwe serdemeke nû dide destpêkirin: Ev
serdem di helbesta klasîk a kurdî de serdema
bicihkirina welat û welatperweriyê ye.

Wê demê bi qasî ku ji hêla hin derdoran ve bi
navê ‘dîn’, ‘bêdîn’, ‘ji rê ketî’, ‘kafir’...têt binavkirin
ji, ev yek nikare bibe sedema ku helbestên
Cegerxwîn li gel şîir û qasîdeyên Xanî û Cizîrî ji
hêla feqîyan ve neyên gotin û neyên jiberkirin.

Li vir divêt em ji bîr nekin ku Dîwana Cegerxwîn
a yekem ‘Agir û Pirûsk’ di sala 1945’an de li Şamê
têt çapkirin.

Yanî Mele Şêxmûsê ku di 24 saliya xwe de navê
Cegerxwîn li xwe dike piştî helbestkariyeke dûdirêj,
piştî 21 salên xitîm dibe xwedî diwan.

Jixwe dibe ku ji vê rastiye be; Cegerxwîn
nexwestibe di hişê guhdar de şaşıyek pêk were, di
helbesta xwe de remza Seyda geh bi tena serê xwe,
carinan li gel hev, pîr caran li ristê daraştî bi kar
tîne û vê yekê dike qalibekî taybet yê rista helbesta
xwe:

Seyda rast û ronî ye

Lewra **Cegerxwîn** namîdar

Zana dizanîn ew kî ye

Ên ker dibêjin kafîr e (**Agir û Pirûsk, rp. 48**)

Seydayê rast û rastbêj e ku bi navê Cegerxwîn
têt naskirin êdî bêmîtale û bê xem her du remzan;
Seyda û Cegerxwîn li gel hev dike yek kes:

Heçî maçek ji lêvan bir

Wekû sed maç ji laleş bî

Li ser pê ger bidî **Seyda**

Ew ê dilxweş û rûgeş bî

(.....)

Şeva tarî li min kir ro

Bi ken berjor kirin ebro

Me maçek xwestibû wê go:

Ji bo **Seyda** bila şeş bî
Cegerxwîn ko ji wan lêva
 Vexwarî şerbeta sêva
 Serî bir ber piyên wê ve
 Jixwe wê mest û bê heş bî” (**Aştî. rp.122**)

Di destên min de melhêb e
 Didêrim bendera kayê
 Cihan tev toz û dûman e
 Hemû jîn çûye ber bayê!
 (.....)

Eger Xeyda bidî **Seyda**
 Ji lêvan şerbeta sêva
 Ji rêve dê qiyamet bî
 Li Misr û Şam û Bexdayê
 (.....)

Cegerxwîn ê bixwîne ey
 Delala nazik û dilber
 Tu van ristên xweş û şêrîn
 Bî saz û cumbiş û nayê! (**Aştî. r.106**)

Seyda tu rêzanê min î
Seyda tu pêzanê min î
 Hoste û hozanê min î
 Peyvên te wek qend û nebat
 (.....)

Evîn şewat û nuhtin e
 Sed wek **Cegerxwîn** suhtine
 Dermanê vî derdî tune
 Her dem divêtin kêferat (**Aştî. rp. 111-112**)

Li gel vê şewaza li jor, Seyda di gel ku remza
 Cegerxwîn bi kar tîne, vê bikaranînê ne weke
 remzê; di wateyêke din de li ristê belav dike:

Di malikên xezel û qesîdeyan de:
 Mala me xerab kir te bi hatin û çûnê
 Wer rûne li nik min berî bîmrim wer rûnê
 (.....)
 Maçek bide **Seyda** û bi carek tu mexeyde
 Sed heyf e ku dil bi kul herê bin ax û nebûnê
 Hingî wekû sax e bere dilxoş û ciwan bî
 Lê kengî serî danî bi carek meçe şûnê

Seyda ku **ceger xwîn** e ji tirê biriwên reş
 Dil jar e li ser sorgulê dêmên te dixûnê
 (**Ronak, rp. 185**)

(.....)
 Bi wan destên spî mizde birînim
 Bere **Seyda** wilo nemrî were têz
 (.....)
 Ji derdê te **ceger xwîn** e dinalî
 Li ser bejna te çekirîne wî ev rêz (**Kîme Ez, rp. 311**)

Cejn e îro dûrîdest im lê dilim naxweş çî ye?
 Ev cihan yekser ji min re bê te ey mehweş çî ye?
 (.....)

Ez di vê rê de birîştîm **ceger û dil bûne xwîn**
 Min ji nû zanî evîna serxweş û bêheş çî ye
 (**Kîme Ez, rp. 206-208**)

Heval meyzê cihan îro du bend û perçe û doz e
 Li alikî şefeq hilda, li alikî reş û toz e (.....)
 Meger **Seyda** ji tir û awirên yarê **ceger xwîn** e
 Belê pir payedar im ez ku tiravêj e amoz e
 (**Kîme Ez, rp. 279**)

Di bendên çarînan de:

Wê **ceger xwîn** kir bê dîne
 Agirek da ser birînê
 Ah ji destê vê evîne
 Pêt e diwarek heyê (**Kîme Ez, rp. 247-248**)

Li ser te dîsa qîr û şîn
 Disa ji nû ve derbûn birîn
Cerg û hinav tev bûne **xwîn**
 Bibihîze xweş dengê me jî (**Aştî, rp. 36**)

Ji we **ceger** bi **xwîn** im
 Çil sal e dil birîn im
 Tarîxê rê me daye
 Bêtir ji we dibînim (**Aştî, rp. 34**)

Welat bi min şêrîn û Zîn
 Dil daye ber dax û birîn
 Hetta **ceger** min bûye **xwîn**
 Min dil tijî pêt û şewat (**Aştî, rp.14**)

Li ser çîyan nal û girîn
 Gûhdêrê qîr û deng û şîn
 Bi berf û serma bin bes e
 Disa **ceger** tev bûye **xwîn** (**Aştî, rp. 46**)

Gava me ew gul bin kirin
 Sed kul di dil de şîn kirin
 Can û **ceger** tev **xwîn** kirin
 Wê nêrgîza yekta û ter (**Sewra Azadî, rp. 208**)

Em dê vexwîn wer dîn bibin
 Pir serxweş û bê dîn bibin
 Can û **ceger** tev **xwîn** bibin
 Ahî ji destê te evîn (**Ronak, rp.164-166**)

Digel vê şewekariyê, Seyda di vê biwarê de
 şeweparêziyêke hişk nahimîne; di birek cihan de
 weke ku hinek bangî wî bikin û ew wan bi rist û
 malikan bibersivîne Cegerxwîntiya
 Seyda/Seydatiya Cegerxwîn derdixê pês:

Tiran tu direşênî li dil begler û mirê
 Dil gazî û nalîne ji ber gezme û tirê
 (.....)
Seyda Cegerxwîn e ji derdê te dinalî
 Daxwaz çî ye zanî me ji vê gazî û qirê
 (**Kîme Ez, rp. 198**)

Lebxunçe û dîmsorgul û ebrû te ji nûnê
 Ma dê çî bibî ger tu werî qasekê rûnê
 (.....)
 Maçek ji du lêvan bide **Seyda** û du sêvan
 Piştî ko mir û çû megîrî qet meçe şûnê
 (.....)

Seydayê Cegerxwîn e dinalî wekû hayê
 Sotiyê ji dil her wekû êtûn û qelûnê
 (**Kîme Ez, rp. 307**)

Dev û lîvên şekerî bes bike inwanê xwezî
 Çî dibî ko ji sereya cerekê bê bi dizî?
 (.....)

Seydayê Cegerxwîn rustemê meydan bî çî karî
 Dêwê spî ye çerxê felek destî bi gurz daberizî!
 (**Kîme Ez, rp. 210**)

Seyda Cegerxwîn bes bibêj

Çîrok gelek dûr û dirêj

Hingî tu gazinan dikî

Serê wî bêtir gēj dikî **(Aştî rp. 86)**

Ji bilî vê şeweya li jor, Seyda Cegerxwîn di gelek helbestên xwe de, di birek malik û çarînan de di malikekê de Seyda, di yekê de Cegerxwîn bi cih dike:

Di malikan/beytan de:

Bi min mizgîn gihîştî ko tu hati

Li ser çavên me hati pût û lat î

(.....)

Bi lêvan dil bir û sêv dane **Seyda**

Serî sor û binî gewr û xelati

(.....)

Cegerxwîn şa bike carek bi hembêz

Li ber destê te ez rûnim bi Tatî **(Kîme Ez, rp.**

261)

Li **Seyda** ger tu bipirsî can qelabendê Siweyda ye

Ji min carek mexeyde da nebêjim ko tu Xeyda ye

(.....)

Di piştî ko te dil kuştî ji nû tê serxweşî xanim

Ji lêva şerbeta sêva didî **Seyda** çi feyda ye?

(.....)

Hemû kes dilbijê wê bejn û bala wek neya avî

Tenê ê ko perîşan û ceger xwîn maye **Seyda** ye

Ji roja ko me dil dayê me can da destê zîbayê

Cegerxwîn daye nav dafan di benda zilf û qeyda ye

(Kîme Ez, rp. 310)

Bi ahê her du biskên xwey di rêş ke

Dilê xemgîn biyek maçê tu xweş ke

Ji jana te cihan mişt bûye îro

*Li **Seyda** jî bibarîne du peşke*

(.....)

Wekî roj î, te ronî daye her kes

*Gelo **Seyda** xwedî par û bi pişk e*

(.....)

Cegerxwîn im nema zanim çi bêjim

Tenê zanim dilê yara me hişk e **(Aştî, rp. 117-**

118)

Di bendên çarînan de:

(.....)

Te maçek da bi şîranî

Me can û dil li ser danî

Û gawir hêj dibê kanî

Te qatek da bi sed qatî

*Bes e **Seyda** çi ne gazin*

Di dil de tîr, rim û bazin

Me xew nayê çilo razin

Di vê cengê de: Şah mat î!

Xerabat im li meyxanê

Me mey da Ehmedê Xanê

Cizîrî firke fincanê

Ji kûp û kûzikên Batî

Cegerxwîn bes bike forta

Tu pîr î lê wekî xorta

Te dil da ber şiv û rota

Bi xwe kohê Erarat î! **(Ronak, rp. 167,68,69)**

Cegerxwîn di serdema xwe de bi helbesta xwe ne tenê li ser erdnigariya Kurdistanê; bi tevahî li Rojhilata Navîn û li derûdorê babeliskeke helbestî rakirîye. Piştî Ehmedê Xanî yek ji navdartirîn helbestkarê kurd e Cegerxwîn. Û wî bi zarê xwe yê şîrîn, fesîh û zelal sebebê hêsan -zimanî û zelal-ristiya helbesta xwe, ji ber ku bi van malikên li jêr pêşkêşî me dike; bivê nevê rêya rexneya hunerî li ber rexnegiran digire:

*Dil vegêraye ji **nezma xweş luxat***

*Hate ser **nezma ku sê car faîlat***

Wextê min di qewmê kurdî pîr delal

Ew di nêv ehlê cîhan de bê heval

Ba sexawet ba diyanet ba hiner

Min li goşê lewhê qelbim kir xeter

Ko beyan kim esl û ewsafên di wan

Milk û hikm û padişah û her zeman

(.....)

Ez dizanim ehlê çend esrên berê

Bê teesib guh nedane ne vê dirê

(.....)

Vê ji yaran hêvî sed carî dikim

Zêde sed şukrî ji heqbarî dikim

Ko hezar û sêsed û hem çil û heşt

*Bu ji Mûsayê **Hesarî** ev nivîst*

(Kîme Ez, rp. 318-319)

Malikên helbesta Seyda yên li jor, kêr zêde sedemên Ehmedê Xanî yên bi kurmancî nivîsina Mem û Zînê tine bîra me. Jixwe min di nivîseke xwe de gotibû: her helbestkar bi qasî xwe tevahiya helbestkarên berî xwe ye. Cegerxwînê ku di rista helbesta xwe de rasterast û eşkere gotibe:

Ne pêximberê me ne Mezdek û Manî

Yek rêberê me heye Seydayê Xanî...

....êdî ew Xanî ye, Cizîrî ye, Bêkes e, Hejar e ...û li dû welêt axîn û keser e, li dû yarê qîr û hawar e; Şêxmûs e, Hesarî ye, Seyda ye, Cegerxwîn e:

Ji dostê re çi rêkim ez diyarî?

Diyar e yar dixwazî min bi yarî

(.....)

*Bi wan lêvên şîrîn go: Rabe **Seyda***

Tu serbest î, ji min çibkî, dikarî

Me talan kir ber û bîstan bi carek

*Kenî û go: bes e rabe **Hesarî!***

*Me go: Gorî **Cegerxwîn** bû, di vê rê*

Bi dest nayê wekî îro tu carî **(Ronak. rp. 145)**

Mîrateya Hevpar a Mirovahiyê: Wêje

Adar JIYAN

Bi kîjan zimanî, ji hêla kê ve, li ku û kengî dibe bila bibe; dîrok, çand û erdnigariya wê çi û çawa dibe bila bibe, wêje, malê tevê mirovahiyê yê kevnar û hevpar e. Ji bo wê, divê takekes an jî civak, ligel wêjeya gelê xwe li wêjeya dinê xwedî derkeve û wê ji nêz ve binase. Heke na, tu wêjevan bi tena serê xwe, ne dikare ji wêjeyê sûd û fêdeyê werbigire û ne jî dikare sûd û fêdeyê bide wêjeyê.

Pirsgirêka wêjenasiya dinê a herî mezin bi tevayî nenasiya wêjeyê ye. Ango kesên ku têkildarî wêjeyê ne, divê hem hay ji wêjeya xwe û hem jî ji wêjeya dinê hebe. Divê hem li deriyê gencîneyên çand û wêjeya dinê bide û hem jî deriyê wêjeya xwe ji wêjevaniya dinê re vekirî bihêle. Tu wêjevan bi naskirina wêjeya xwe tenê tu car nikare xwe ragihîne ber deriyê wêjeya dinê. Wêjevanek, ji bo ku bikaribe çanda wêjeveke hemdem a îroyîn biafirîne, divê pêşî rabirdû û dahatûya wêjeya dinê bigihîne hevdu.

Wêjevan, bi pênûsa xwe ya efsûndar û hunerî dikare hem civaka xwe û hem jî tevê mirovahiyê ji hemû nexweşî û nepakiyên dinê reha bike. Dikare rih û giyanê bide hemû giyaneweran û di nav dil û hinavên wêjehezan de gul û kulilkên rengîn bipijiqîne. Lewre, yên ku diponijin û didin ponijandin, ên ku dixwînin û didin xwendin, ên ku şîrove dikin û didin şîrovekirin, ên ku diaxivin û didin axaftin, ên ku dibihîsin û didin sehkirin... tev ji nav van wêjevanan derdikevin.

Yên ku pêwendîya navbera takekes û civakê şîrove dike, yên ku derbarê rûdan û pêzanînen dinê de mirovan agahdar dike, yên

ku hezkirin, rêz û giramiyê bi mirovan re digihîne, yên ku rewşa civak û mirovahiyê baş rave û şîrove dike û diguherîne, wêjevan bi xwe ne. Wêjevan bi veguherandina xwe re, civaka xwe û hemû civakên dinê yên din jî digihîne û vediguherîne. Ji bo wêjeven tiştê ku qet naguhere guherîn û veguherîn e. Wêjevan hem dibe qasidê hemû civakên borî û hem jî dibe navgihîn û berdevkê civakên îroyîn. Wêjevanên dinê, do, peywira navgîna ahengî û lihevhatina mirovahiyê pêk dianîn, îro pêk tinin û dê sibê jî pêk binin. Ji lewre ew, di ser hemû bîrdoz, raman û ramyariyên heyî re difikirin. Ew, ji hemû bîr û bawerî û ferasetên kevnêşop bêrî ne. Ew, ji hemû cihêxwazî, pêşdarazî û fitnebaziyan dinê bi dûr in.

Wêjevan, hêza xwe ji hizra xwe ya zexm werdigire. Bandora xwe ji hest û dilnîyên xwe yên pak û paqij ên gerdûnî hildide. Ji kîjan nijad û neteweyê dibe bila bibe di kesayetiya her wêjevanî/ê de azweriya cîhaneke lihev û aştîyane xwe dide der. Heke wêjevan ne xwediyê van xislet û taybetiyên pak û paqij be, wê çaxê nikare bibe liyaq û şayesteyê wêjevaniyek gerdûnî. Bi rastî gelek kesên ku xwe wekî wêjevan û heta di ser her wêjevanî/ê re dibînin (dihesibînin) hene. Ligel ku navê wan wêjevan e jî, mixabin bi navê wêjevaniyê li ser koka wêjevaniyê rûdinên û tovê dijminahiyê direşînin ser rûyê dinê. Ji devê wan agir, ji pênûsa wan şehr dibare. Pênûsa xwe wekî şûrekî ko yê kevnedest li ba dîkin. Li dewsa hubrê xwîn û nême rêz dîkin. Di ristina nivîs û sernivîsên xwe de tu carî nêzikî hest û hizrên mirovahiyê nabin. Ku derdikevin qada wêjevaniyê, tu dibêji qey Xwedê wan ji bo şer û pevçûnên bêyom, bêbext xuliqandiye. Di ser pozê xwe re tu kesî nabinin. Bi tinaz û qeşmerî li mirovan dinîhêrin û tu kesî naecibînin...

Heçku hebûna wêjevan, lihemberderketina hemû neqencî û nepakiyên demê ye. Peywira wêjevan terbiyekirina jiyanê ye. Rola wêjevan, jihevhezkirin û pevşabûn e. Armanca wêjevan, lihevhatin û pevrebûna mirovî, civakî û gerdûnî ye. Hedefa wêjevan, pêkanîna yeksanî, aramî û hevtehemulkirina tevê mirovahiyê ye.

Beriya hemû liv û tevgerên ramyarî û konevaniyê, wêjevanî hebû ye. Wêje, beriya ziman derketiye holê. Berî ziman gotin û berî gotinê jî wêje hebû. Beriya ku wêje pêk were

deng û axaftin hebû; ziman tunebû. Ziman bi saya wêjeyê gihîşt wateya xwe. Ji bo wê, hêja ye ku mirov bi hûrbînî û dorfirehî li ser rikn û ripinê wêjeyê raweste û wê ji ziman û axaftinê veqetîne. Îro gelek kesên ku bi navê wêjeyaniyê tevdiagerin û ber û berhemên xwe li ser navê wêjeyê derpêşî civakê dikin, hene. Belê bi rastî hem ji çawanî û xisletên wêjeyê û hem jî ji sinc û qaydeyên wêjeyê gelekî bidûr û bêpar in. Ev yek, di kesayetiya hin wêjevanên kurd de bêtir xwe daye/dide der. Gelo çima bêtir wêjevanên kurd? Teqez gelek sedem û egerên vê yekê hene; belê mirov dikare çend sedemên bingehîn bîne qalê.

Carekê, her tişt û heyîn bi dijberê xwe re diwelide û pê re mezin dibe. An, di bin bandora dijberên xwe de dimîne an jî dişibe wan. Îro ro, wêje û wêjeyaniya kurdî (ya nûjen) wekî bertekeke (reaksiyoneke) dijber ji nedîtî ve rû da û bi lasayîkeriya wêjeya ku di bin bandora wê de mabû/maye (wêjeya tirkî) re derkete holê. Gava ku mirov lê dinihêre, ji çîrok û çîvanokên wê bigirin heta helbest û romanên wê, ji gotarên wê bigirin heta ceribandin û kenaweriyên wê, ji nixandin û rexnegeriyan wê bigirin heta mezinandin û pesinandinên wê...bi tevayî dişibe wêjeya tirkî. Cihêwaziya tekane ya navbera her du wêjeyan, tenê ziman e. Dibe were gotin ku gelê kurd û tirk tevlihev bûye û gelek bandor û hevhişkariyeke xurt di navbera wan de pêk hatibe. Rast e. Belê em ji dixwazin balê bikişînin ser vê şibandin û xweşibandinê û erênî û neyiniyên wê derpêş bikin.

Carekê, her çendî ku van çend salên dawî bi mebesta çareseriyê mayînde, di her warî de hewldan, xebat û têkoşîneke xurt xwe dabe der jî, di rastiya xwe de ji hêla siyasî û bîrdozî ve, zêde xwe ji xweşibandina pergala heyî reha nekiriye. Bo nimûne; pergala heyî tirkî derxistiye pêş, hin têkoşerên nû jî wekî bertek tenê kurdîtiyê diparêzin. Pergala heyî jî bilî tirkîtiyê her tişt bînirx û bêxêr dibîne; hin têkoşerên nû jî, bîyî kurdîtiyê her tiştî bêwac û bînirx dibînin. Wêjevanên heyî, wêje, ziman û çanda kurdî mandele dike; hin wêjevanên kurd jî, xwendin û nivîsandina tirkî qedexe dikin...

Pirsgirêk ne axaftin, xwendin û nivîsandina bi tirkî, erebî û farisî ye;

nexwendin, neaxaftin, nexwendin û nenivîsandina bi kurdî ye. Ji bo wê vebijarka (alternatîfa) şaşiyê ne şaşıyeke din e; bersiv rastî bi xwe ye. Heke li şûna şaşiyê rastî neyê danîn, ne pirsgirêk çareser dibe û ne jî bawerî û ewleyî bi dest dikeve. Îcar, rewşa wêjeya kurdî jî di vê çarçoveyê de hatiye esirandin. Hewce ye ku ev dorbanda ku li ber wêjeya kurdî û tirkî hatiye danîn, were rakirin. Û wêjevanên kurd û tirk (her wiha ereb, faris laz, çerkez, ermenî, asûrî, sûryanî, keldanî û hwd...) jî destên xwe bidin hev li vê mîrateya mirovahiyê ya gerdûnî xwedî derkevin.

Baş tê zanîn li gel ku hejmara nivîskarên kurd -ne wêjevanên kurd- ew çend ne zêde ye jî mixabin yekîti, pêwendî, hevdîtî û ragihandina navbera wan pir kême. Her yek ji wan çend kesan li dora xwe dicivîne û xwe wekî ekoleke serbixwe nîşan dide. Berî ku hevnasiyê bidin hevdu, dibin nêçîrvanên kêmasiyên hevdu. Berî ku hevdu bibînin, nemaze şaşıyên hevdu dibînin. Li şûna ku bi hev re pêwendiyê deynin, li hemberî hevdu dijberiyê datînin. Li şûna ku rêz û hurmetê bidin hevdu, paşê xwe didin hevdu. Mixabin hê bi ser piyan neketine, her kesî û her tiştî didin ber piyên xwe... Bêguman, neyt û mebesta me ne ew e ku em tenê vê rewşa nebaş derpêş bikin an jî ji vê yekê kêf û zewqê bistînin; berevajî wê, hêvî û daxwaza me ew e ku di navbera wêjevanên me de lihevkerin û rêzgirtineke bêdeman pêk were.

Hêvîdar im ku ev çesp û selmandinên me, wekî nebîti (iftîra) û şiltaxiyan neyên dîtin. Wekî gelek kesên dilsoz û pejnkar ku her gav bêzarî û aciziya xwe tînin zimên û bi vê rewşê neqayîl in, em jî dixwazin li vir, nerazibûna xwe ya ji ber vê rewşê bi hemû mirovên dilpak û mirovhez re parve bikin û li çareseriyekê bigerin. Rewşa heyî (rewşa kovar, rojname, sazî û meZRîngeyên çandî û wêjeyî) vê yekê baş diselmîne. Divê ku em xwe nexapînin. Belê divê ku em jidil û can bixebitin û hemû wêjevan, wêjenas û wêjehez ên xwe bigihînin ser hevdu û ji bo pêwendî, yekîti û şêwirdariya hemû têkoşerên wêjeyê tişteki bikin.

adarjiyan@mynet.com

Lottoyê Kurdistan Rizgar Kir

Qado ŞÊRÎN

Ta niha nizamî navê wî çî ye, ez bi navê Bavê Ferhad wî dinasim, dostaniya min û wî bigir heft salan dirêj dike. Bi rastî qet neketiye bîr û bala min jê bipirsim ka navê te çî ye. Ji min re ne girîng û balkêş bû, çimkî mirovekî bi temen mezin e. Wî jî hez dikir mirov bi navê bavê Ferhad wî bi nav bike, belê kêfxweş dibe ko tu bi navê kurê wî bang lê bikî.

Bavê Ferhad ev şeş meh in li Holandayê Kurdistanê serbixwe û azad ava kiriye. Ala Kurdistanê li ber li ba dibe. Serok, serokwezîr, wezîr, serokparlemen, parlemanî, leşker, tu bibêji çî heye, hemû şert û mercên di welatan de di Kurdistanê wî de peyda dibin.

Ko tu biçî serdana wî mîna serokê welatekî biçê serdana welatekî din, gelek astengî têne pêşiya te. Şert û mercên serdanê hene, pasvan çavên mirov û bavê mirov derdixinin

ta tu wî dibînî. Berî şeş meh û heft rojan bavê Ferhad wek me hemûyan bû. Ji wê demê de bûye mirovekî din û tîkiliya bi wî re şor bûye.

Bavê Ferhad ê ko çil salî li ser çîyan ji bo rizgarkirina Kurdistanê şer kir û nikaribû bohostekê ji xaka Kurdistanê rizgar bike, aniha li Holandayê Kurdistanê serbixwe û azad ava kiriye.

Berî sal û nîvekê ew û xanima xwe li çarçihî bajarê Nijmegen dimeşîyan. Ji nişkan ve çavên xanima wî bi armaya Lottoyê dikevin: "Jackpot € 16,3 miljoen", li bavê Ferhad nihêrî û got:

-Çima tu carekê sensê xwe naceribînî?

Gotina diya Ferhad dikeve serê wî û jê re dibêje:

-Tu caran min bi ya te nekiriye, lê bi telaqê bîfîtû hema vê carê ez ê bi ya te bikim, û dihere karteke Lottoyê dikire. Piştî hefteyekê 16 milyon û sêsed hezar Euro jê re derdikeve. Wêneyê wî di hemû kovar û rojnameyan de belav dibe. Televizyon û radyo hevpeyvînan pê re dikin, tenê di hevpeyvîneke xwe de dibêje; dema spîker jê dipirse: tu yê çî bi ew qas pere bikî?

-Ez ê welatekî ava bikim...

Bavê Ferhad radibe bi du milyon nehsed û pêncî û şeş metre erd dikire û bi du milyon sê avahîyan di nav de ava dike. Yekê dike ji bo xwe wek serok-komarê Kurdistanê û yekê jî ji bo kurê xwe Ferhad wek serokê parlemen û parlemenîyan û ya sisiyan jî dike ji bo kurê xwe Şero wek serokwezîr û wezîran. Jixwe ala kurdî li ser her sêyan diçikîne û li ser armayeke mezin, li ber deriyê derve dinivîse; Komara Kurdistan a Demokrat.

Piştî vê yekê guhertineke biçûk dikeve navê wî, dibe; Serok Silo. Û ev yek di medyaya kurdî de dibe ecêbek ji ecêbên dinyayê. Dibe ko ya heştan be.

07/07/2007

www.qadoserin.com

Normal-Spielschein
6 aus 49

Samstag und Mittwoch

LOTTO

www.lotto-hessen.de
Beachten Sie die Hinweise auf der Rückseite.

1234567

Super 6 Spiel 77

Teilnahme
☐ Sa + Mi oder Mi + Sa
☐ Nur Mittwoch
☐ Nur Samstag

1 2 4
Wache(n)
Draußen
Spiel

Laufzeit XLL

Name

Di Lottoyê de 16 milyon û 300 hezar Euro jê re derdikeve; televizyon û radyo hevpeyvînan pê re dikin, tenê di hevpeyvîneke xwe de dibêje; "Ez ê welatekî ava bikim..."

Îşareta bi Xeter

Ehmed TARÎ

Gava diya Hemê hat û li ber serê wî, li ser tutikan rûnişt dinya hîna tarî bû. Wê ji aliyekî ve porê wî bi dilovanî mizda û ji aliyê din ve jî hêdî hêdî lawik hejand û got:

“Hemê, rabe bavê diya xwe, dereng e.”

Dawiya meha Adarê bû û dinya hîna sar bû. Destê gedeyê pênc şeş salî ji nivînên germ nedibû. Hê jî xewar bû, çavên xwe bi zorê vekirin û pirsî:

“Ma çima yadê?”

“Qey te ji bîr kiriye dayê qurban? Wext e, divê tu rabî taştêya xwe bixwî û berxan bibî çêrê, ser mêrga Çevkaniyê”.

Ev cara pêşîn bû ku Hemê dê biçûya ber berxan. Çavên wî cardin bêhemd hatin girtin. Lê dê bi sebat li dora gede çû û hat û dawiyê ew hişyar kir.

Hemê rabû ser xwe, lê wekî ku gêj bûbe nikaribû li ser nigan bisekîniya. Bi alîkariya diya xwe şalwarê xwe kişand lingên xwe û ji malê derket, çû ser kaniyê. Ji ber serma sibê diricifî. Li wir xwe bi ser avê de xwar kir, çavên xwe girtin û av li rûyê xwe wer kir û heta ku sor bû, bi hêz mizda. Dû re bi piyê kurtikê xwe ruyê xwe ziwa kir.

Karê paqîjiyê kutakirî, nîvşil lê hişyar, destên xwe yên sar xist bin çengên xwe û bi meraq li dora xwe; li asoya sor, li rêza darên behîvan ku di nav xumama zîvîn de disobîn û li ezmanê şîn nihêrî. Şivşiva çivîkan bû, difirîn û li dora gund diçerixîn. Wek tîran, bi lez, ji ber newalê difirîn diçûn bin sivêrnekan, ji wir diçûn ser guliyên daran. Hemê bi çavan

ew şopandin û xweziya xwe bi wan anî; ew ê çiqas xweş bûya ku wî jî karibûya wek wan bifirîya!

Zivirî, li gund mêze kir. Dûyên şînboz ku ji kulekan derdiketin û ber bi ezmên ve hildikişîyan taştê anî bîra wî. Ji birçîna û ji destên xwe yên sar terka çavdêriya xwe kir û bazda çû malê, li ber kuçik rûnişt.

Odeya ku ronahiya risasî ya serê sibehê di her du pacikên wê yê piçûk re diket hundir, ji Hemê re germ û xweş hat. Gava ku diya wî ji bo taştê bangî wî kir, ji ber kuçik rabû çû li ber pacê li ser palasê çarmêrkî rûnişt û rûbiken li diya xwe nihêrî.

Taştêya wan dîsa şorba nîskan bû. Diya wî piçek îsota sor pê wer kiri bû û pîvazek qelaştî dabû ber. Ji bo ‘şivanê malê’ îro, ji her rojê zêdetir nivîşk xistibû şorbê. Gava taştêya xwe qedandin, Hemê şiva xwe ya sor, ku bavê wî jê re ji guliyê dara sincê birîbû, kir destê xwe, berxên xwe dan hev û ji malê derket. Li ber derî çend caran şiv hejand, ‘Vinnn vinnn’ a şivê pir pê xweş hat, mizicî.

Heta perê gund kûçikê kalê wî, Qavreş, pê re hevaltî kir, lê li wir, li dora gede çend caran çû û hat, dûvê xwe hejand û li nav çavên wî nihêrî. Dû re berê xwe da malê û vegeriya çû. Hemê têgihîşt ku çima mala xalê wî û maleke li vê taxa gund bi salan bû berberiya hev dikirin. Weha kûçikên wan jî berberî dajotin. Gede bi tenê bi keriyê xwe re ma. Di kolanên xul û xwar re meşa xwe domand. Zeraqa narincî ya ku di paceyan re diavêt derve, miraqa wî livand. Li ber xaniyekî sekinî, berê ku pêş ve bazde vekîşiya, awireke sivik avêt ser berxên xwe, demekê sekinî û dû re pêş ve baz da, pê li kevîrekî li ber diwêr kir û xwe hol kir. Her du enîşkên xwe avetin ser jêrê paceyekê. Bîstekê xwe hilgirt û di pacê re li hundirê malê mêze kir. Malî li ser taştê civiyabûn, ketibûn ser, dixwarin. Wisa miraqa xwe tetmîn kir û bi lotikan ber bi keriyê xwe ve baz da.

Li derveyê gund Hemê berê xwe da kaş û bi ser gund ket, da ku riya xwe ji borxana xirabe dûr bixîne; gedeyên gund digotin li wir pîrebok dijîn.

Wexta pîrpizêkan bû. Li kaşê qeraç di nav giyyayê hêşîn ê teze de, li vir li wir, şîn hatibûn. Hemê berê li ber yekê rûnişt û lê temaşe kir. Belgên wê spî, navika wê zer bû.

Li vacayê her belgî xêzeke mor heta kokê dirêj dibû. Bi kêf belgên şêrîn rûçikand û avêt devê xwe. Gava ku keriyê wî hat bîra wî dev ji pîrpizêkan berda û baz da. Berx li pozê hewrêz zivirîbûn û nedixuyan. Gava ku Hemê xwe gihand wan şiva xwe hejand û li berxên meşgiran çirîn kir. Hela hela wî bu, te digot qey diviya bû niha berx bigihandana ser mêrgê.

Li berwarê berberoj, bi saya avzêyekê, giya her sal zû şîn dihat. Li başûrê mêrgê di şiklê simê hespan de kortaleke kûr a fireh hebû. Kûrahiya wê nêzikî bîst, bîst û pênc mîtroyan hebû û ji jor de ji nişka ve dadiket.

Hemê berxên xwe ajotin ser mêrgê û ji bo lîstikekê li dora xwe nihêrî. Hema li warîpalên (binefşên belek) di nav giya de varqilî. Çû di nav wan da rûnişt û demekê li wan temaşe kir. Paşê li dora wan çû û hat, ew bîn kirin û ji nişka ve sekinî; rengên warîpalan kabên wî anîbûn bîra wî. Destê xwe xist berika xwe û sê heb derxistin. Kulmika xwe vekir û li wan nihêrî: kesk, sor, şîn; kab di destê wî de wek keskesorê diteyisîn. Kêfa wî hat. Bîstekê bi wan leyîst. Paşê, ji nedî ve, ji kaban aciz bû û ew kirin berika xwe. Dû re berxên xwe jimartin û ji bo mijulahîyeke din, ji nû ve, li der û dora xwe temaşe kir. Piştî hîzreke dûr û dirêj, rabû ser pêyan, milên xwe vekirin û bîstekê ew hejandin. Meriv digot qey teyrê baz e, direqise. Paşê dest bi bez ê kir. Paş ve bazda pêş ve beziya, li dora xwe çerixî û wek bombeavêjekê nîzm bû, xwe rast li kortalê girt û çû, xwe tê wer kir. Fena ku xwe li hewa hilavistî his bike ji kêfan dikeniya. Bi qasî heft, heşt mîtroyan di hewa re çû û paşê bedenê wî go 'himh' û li axa sor a nerm ket, şemitî ber bi jêr ve gêr bû çû. Tonek axa hûr bi xwe re kişand, bir jêr. Berî ku hilkişe jor, di kortalê de, qasekê li ser piştê ma û li ezmanê şîn ê bêtixûb nihêrî. Dû re hilkişiya jorê kortalê. Ev serpêhatiya han pir pê xweş hatibû. Çend carên din wî ev yek dubare kir. Paşê ku tu ramanêke din nehat hişê wî bi destên xwe yên piçûk xweliya sor ji cilên xwe dawêşand û vegeriya çû nav berxan. Li wir enîşkên xwe danîn ser çokên xwe, destên xwe dan ber hinarikên xwe û rûnişt. Mêrg 'bi rik' vala ma; wê rojê tu keriyekî din nehat ser mêrgê. Di dilê xwe de got "ez ji vir acis bûme!" û gumurî.

Roj we gavê bi qasî sê çar bejnan bilind bûbû.

Ji nişka ve rûyê wî, wek ku şewl lêxe, geş bû. Keçikeke ciwan bi piştîyekî qirşan li hewrazê hemberê çavkaniyê xuya bû, ber bi gund dimeşiya. Hemê bi çavan da dû wê. Tişteki bala keçikê kişand. Keçik di cih de sekinî, di ser berxan re li dereke li paş Hemê mêze kir. Hemê ji zivirî, dît ku xortekî li ber pozê zinêr xwe telandiye û neynikeke piçûk - wek yen ku etar tînin gundan difiroşin- di destê xwe de çep û rast jor û jêr badide, eksa tava rojê rast davêje nava çavên keçikê. Gede di cihê xwe de nependî ma û bi meraq li wan temaşe kir. Keçikê çarika xwe ya rengîn ji serê xwe kir, girt û carek du car dawşand û ji nû ve avêt serê xwe, tekûz girê da û wek ku tu tişteke nebûbe meşa xwe dom kir. Hemê mêze kir xort ji bi lez li zinêr zivirî û çû wenda bû. Niha, di nav berxan de bi serê xwe bi tenê ma, Hemê ev bûyera xerib mitala kir, lê tişteki jê dernexist. Ji nişka ve wexta fravîne jê re pir dûr hat. Sebîr nedikir, dixwest ku hema vê keliyê here malê û ji diya xwe re vê bûyerê bibêje.

Gava nêzikî li malê kir diya wî bi du, sê pîrekên cîran re dipeyivî. Bi ser berxan de qîriya, ew zûka xistin hewşê, derê hewşê li ser wan girt û bazda, bi lez çû cem pîrekan.

"Dayê, dayê de ka pê derxe îro min çi dît!"

"Te çi dît berxê dadê?"

"Gava ez li mêrga çavkaniyê bûm min hew dît Serbest bi neynikêkê şewqa rojê diavêje nav çavên Senemê. Bi navê Xwedê, min ew bi van çavên serê xwe dît. Ku ez derewan dikim bila ez kor bibim!"

Ji kelecane bîna wî çikiyabû û li nav çavên diya xwe dinihêrî. Bêsebir li benda bersiva wê bû.

"Hey stûşikestiyoy! Hey buxtankaro! Belqitiyo! Ma tu çawa diwêrî li xelqê bêguneh buxtaneke wisa bikî!"

Hemê yê ku heta wê gavê ewqas dixwest wê bûyerê ji diya xwe re bibêje, hew dît ku diya wî ya dilovan ji bin ve guherî. Çavên wê beloq bûbûn û dengê wê ji bûbû wek kêreke tûj û fikir ku laşê mirov bibire. Hişê lêwîk li hev ket. Dê, destê xwe yê rastê bilind kir û êrîşî wî kir. Gede veciniqî, bi şûn de bazda û dê da pey. Pîrekekê bi fistanê dê girt, lê çi feyde, wê xwe hejand û ji destê jinikê filitî û bi çirînan da pey lêwîk. Qidûmşikestî, Hemê da nav çela sergoyekî. Ava sar a bi rêx dihat heta

navika wî. Di nav de sekinî, zivirî û li diya xwe nihêrî, got qey ew ê nede nav ava heram. Lê dê guh neda qirêjiya ava heram û li navê xist. Hemê îcar ji bin ve bizdiya. Ji nava avê derket û bi qîrîn rast berê xwe da Darên Rêzê. Dixwest ku here xwe bavêje paş bavê xwe. Hem digiriya hem ji heta ku jê dihat direviya. Dê bûbû kabûs û dabû pey. Bav ji dûr ve ew dîtî û ber bi wan ve bazda. Gava ku Hemê xwe gihand bawê xwe dê hindik mabû ew bigirta. Wê wek bazekê êriş bir ser her duyan û bi ser gede de qîriya:

“Tûle! Bejinbihostê Belqitî! Sefilê sefilan, ez ê, ez ê te bikujim!”

“Keçê ma tu dîn bûyî, tu ji gede çi dixwazî?”

“Ev lawê te, ew ê bibe sedema xwîna me hemûyan, em ê giş bên kuştin!”

“Çi? Çima keçê? Çawa gedekî dubihost dikare bibe sebebê tiştêkî wisa?”

“Hema jê bipirse! De ka jê bipirse!”

Her ku dê li dora bav diçû û dihat ku destê xwe bigihîne Hemê û lêxe, Hemê xwe dida aliyê dinê, bav dixist nav xwe û diya xwe.

Dawiyê erna dê piçek daket û bav mesele ji gede pirsî.

Çav bi hêsir, Hemê wê rojê çi dîtibû ji bavê xwe re got.

“A ji te re sebeb!” Dê got, wexta gede peyva xwe qedand. “Gava ku kurtapistiyeke weha ket devê gel, tu dizanî wê çi biqewime? Carekê birame! Şikeke wilo dê çi bine serê Senema reben! Birayên wê dê herin Serbest bikujin. Bi navê Xwedê gundî rojekê wê hew bibînin ku laşê wî di Newalê de diçe!”

Bavê Hemê ew hemêz kir û gede hewand. Zivirî ser jina xwe û bi dengekî nizm got:

“Keçê ma tu dîn bûyî çi? Çima tu vî karê bixeter wisa li hev dixî? Ma qey tu nabînin ku gede mena vê bûyerê fêm nake.”

Mesele êdî venekirin û demekê Hemê neşandin ber berxan. Bûyer ji zû ji bîra Hemê ya gedetiye derket.

Demek bihurî. Rojekê dîsa berx teslîmî Hemê kirin. Gava ku cardin gihaşt ser mêrga çavkaniyê ji kêfan nedizani çi bikira. Pir neajot lîstika wî hat bîra wî. Dîsa rabû, milên xwe vekirin û wek baskên teyran bîstekê ew hejandin. Paşê dest bi bez ê kir. Pêş ve, paş ve bazda, li dora xwe çerixî û xwe rast li kortalê girt û çû. Got:

“birreee!” Û xwe avêt kortalê. Ji kêfan dikeniya.



Hemê
berxên xwe
ajotin ser
mêrgê û ji
bo listikekê
li dora xwe
nihêrî;
hema li
warîpalên
(binefşên
belek) di
nav giya de
varqilî û çû
di nav wan
da rûnişt û
demekê li
wan
temaşe kir

Levketin^(*)

Amed Çeko JIYAN

Ji ber ku li bajarên biçûk her kes hev û din nas dike û her tiştekî ku diqewime zû belav dibe, bajarên mezin zêdetir azadiyê pêşkêşî mirovan dikin û destûrê didin ku mirov, heke bixwazin, ji bo xwe jiyanê takekesî û taybet bafirînin û bîyî ku zêde bifikirin ka civak dê bi çî çavî li kirin û tevgerên wan binihêre, dikarin li gorî dilê xwe şeweyekê bidin jiyanê xwe û ji xwe re di nava wî bajarê mezin de gerdûnê takekesî bafirînin. Ji ber vê yekê ye ku bajarên mezin bi hemû kirêtî, xayîntî û qehbiyên xwe, her tim ji bo xwendina zanîngehê ji bajarên biçûk zêdetir xwendekaran ber bi xwe de dikişînin. Ev wekî hemû kesan, ji bo Laser jî derbasdar bû.

Ev sê sal bûn ku Laser li Amedê dikir ku zanîngehê bixwîne. Belê dikir ku zanîngehê bixwîne... her çiqas di azmûna tîketina zanîngehê de encameke baş bi dest xistibû jî, ji ber ku jiyanê wî bi carekê re hatibû guhertin, di ezmûnên zanîngehê de, wekî ezmûna tîketinê, encamên baş bi dest nedixistin û roj bi roj ji zanîngehê bi dûr diket. Û her ku xwendin û tîgihîştina wî û danûstandina wî ya bi mirovan re zêde dibû, dixwest ji tevliheviya jiyanê xwe ya bi carekê hatibû guhertin, derbasî jiyanê dîtir bibe. Mixabin ev xwestek her tim di dilê wî de wekî kulekê dima û her ceribandîna bi tîkçûnekê bi encam dibû.

Pêşî berê xwe dabû gîtarê; bi perê cixare û çayên li Kuçaya Hunerê kuştibû û dabû bi gîtareke kevn. Di demên pêş de li gîtarê baş sor bûbû. Jê re tîlên nû kiribûn, ji hevalên xwe deftereke ku welênên stranên destpêka fêrbûna gîtarê tê de hebûn, standibû. Êdî li malê tiştê ku herî zêde rûmet didayê gîtarê wî bû; ew gîtarê kevn êdî jî pirtûkên Freud û Neitche jî biqîmetir bûn li ber dilê wî. Piştî demeke dirêj a xebatê, dengê ku ji gîtarê derdixist dişibîya dengê stranê. Lê hê jî nikaribû stranekê ji serî heta dawiyê lê bixe. Dema ku dengê ji gîtarê derdixist dişiband dengê stranê, ji kêfa dikir bifirîya, mîna zarokên metropolan ku nûçeya bixêr a derketina derve jî dê an jî bavê xwe dibihîştin, kêfxweş dibû; kulîlkên biharê yên çiyayên bilind û asê di rûyê wî de dibîşkivîn û jê hezeke bêhempa distend. Dixwest ku piştî lîxistina

gîtarê başbaş fêr bibe, gîtarê xwe bifiroşe û hinek pere deyne serê û pê elektrogîtarekê bistîne. Lê beriya ku lîxistina gîtarê başbaş fêr bibe, ji gîtarê jî sar bû; wekî ku ji Freud û Neitche sar bûbû.

Piştî sarbûna ji gîtarê, xwe li nîgarkêşiyê qewimand. Xewna wî ew bû ku rojekê wêneyê jîneke tazî ku destê xwe ber bi bazekî bi firê dikeve dirêj kiriye û bi çavên xemgîn li bazi dinihêre, çêke. Bi qasî ku li kafeyeke Kuçeya Hunerê, li maseyêke li kêleka maseyên nivîskar û hunermedan bi rojan çayê vexwe, pere li boyax û tuwalan dabû da ku wî wêneyê di mejiyê xwe de çêke. Carinan, bi hefteyan jî odeya xwe dernediket. Çavên xwe digirtin û bi saetan difikirî da ku di mejiyê xwe de dimenan bafirîne û dû re wan dimenên di mejiyê xwe de afirandine, bi firçeyên xwe yên curbicur, li ser tuwalê nexş bike. Hemû wêneyên ku çêkiribûn li odeya xwe, li erdê, li ser hev kiribûn du kom. Komek hemû wêneyên curbicur û koma din ceribandîna wêneyê jîna tazî a destê xwe ber bi bazekî bi firê dikeve dirêj kiriye û bi çavên xemgîn li bazi dinihêre' bû. Gelek caran ceriband da ku wêneyê nîşaneyê kamilbûna di nîgarkêşiyê xwe de çêke, lê rûyê jîna tazî tu carî nedîşibîya rûyê jînan... û baz jî her tim wekî kevokekê çilmisî xuya dikir.

Li dû tîkçûna nîgarkêşiyê, meyla wî careke din çûbû ser pirtûkan lê hezkirina pirtûkan tenê demeke kin ajotibû; ne ramanên Neitche ne jî ên Freud wekî ramanên wî pêşketî û hevçax bûn. Ew jî nizanibû sedem çî ye, lê bi carekê, evîna listikvaniya şanoyê di dilê wî de hêşîn hatibû. Komeke xwendekaran hebû ku berê li saziyêke çandê wekî şanoger dixebitîn. Ji ber ku ew kom li dû pevçûnê digel nûnerên saziyê ji wir hatibûn qewirandin, li ber dilê wî şêrîn bûbûn. Di demeke kin de di nava komê de ji xwe re cî girtibû û tevli xebatên wan bûbû. Di koma şanoyê de xwe dilxweş hîs dikir. Ne pirtûkan ne gîtarê ne jî nîgarkêşiyê ew ji gola xeman ew qas dûr kiribû. Hê di tu listikekê de cî negirtibû û derneketibû pêşberî temaşevanan lê di hemû provayan de wekî ku derkeve pêşberî bi hezaran temaşevanên entelektuel, amade bû. Bi perîşaniya sala yekemîn a xwendekariyê, bîyî ku biweste û gazincan bike, di xebatên şanogeriyê de dibezîya hemû karan. Gelek caran hevalên wî yên şanoger jî ber xebitîna wî ya bê westan ew pîroz dikirin û jê re digotin ku hêz û coşa xwe bi carekê re der neke. Lê wî her tim di dilê xwe de heman hêz û coş, wekî ku tu carî wîna nebe, hîs dikir. Heke ev rewş wisa bidomîya, dê karibûya vexwarina alkôlê jî kêr bike.

Şevêkê, digel hevalên xwe yên şanoger, li mala hevalekî xwe bûbû mêvan û heya derengiya şevê li ser leyîstika nû axivibûn û vexwaribûn. Heke wê şevê nûçeya ku ew ê jî di leyîstika nû de rolekê bistîne nestandibûya, dê bi xwe karibûya û ew çend venexwaribûya. Di destê de deqa leyîstikê û di destê din de jî qedeha birayê, geh qurtek li birayê dixist û geh çavekî li beşên deqê yên tîkildarî xwe digeland. Ji niha ve dest bi jiberkirina gotinên xwe kiribû. Bi saya alkôlê, bi dengê bilind gotin dubare dikirin.

Ji bo ku bi vê coşê gotinên xwe ji ber bike diviya here malê û bi tenê bîmîne. Bi peroseke ku gupegup bi dilê wî dixist, rahişt deqê û pakêta cixarê û derket. Di tariya şeva zivistanê de, di bin ronahiya zer a heyvê de dûmana cixareya xwe radestî bayê dikir û di sikakeke teng a Baglarê de li ser peyariya ku hemû kortikên wê di bin berfê de winda bûbûn û ji ber berfa spî wekî rîyeke ji mermerê xuya dibû, geh bi wê de û geh bi vê de dihejiya. Ji ber ku çend carekê li kortikên ku wekî kortikên jîyanê, jê ve xuya nedibûn û ji bo têkbirinê di bin berfa spî de xwe xef kiribûn, qelibîbû û heya nava derpiyê xwe lewitîbû, bi awayekî ji rêveçûna xwe nebawer, bi gavên biçûk ber bi malê de diçû. Nedihat hişê wî ka çend şûşeyên bîrayê di sohbetên têrken de bi ser kezêba xwe ya ku ji ber nexweşiyê jîyana wî ya zaroktiyê herimandibû û gelek caran ew ji listikên zarokan ku li taxê dihatin lîstin bi dûr xistibû de, vala kiribû.

Sira bayê sar ji hêlekê ve hêdî hêdî ew ji bin bandora ava cehî derdixist û ji hêla din ve jî çawa ku nexweşiya wî wekî ku bi devê wî bibêje 'ez li vir im' kuxînî pê dixist. Di dema zaroktiyê de jî, di rojên sar de, carinan wisa kuxînî pê diket û bi her kuxînyekê wekî parçeyek ji kezêba wî hilbe, ew di nava êşê de digevizand û belxemeke tîr û tarî bi ser dilê wî dixist. Ji ber nexweşîna ku gelek caran ew ji meş û çalakîyan jî bi dûr xistibû û dakiribû nav livînan, gelek caran çûbû nexweşxaneyan û derzî û derman standibûn. Beriya ku dest bi zanîngehê bike, nexweşîna wî hema bibêje xwe pê dabû jîbîrkirin. Lê di salên zanîngehê de, ji ber alkol û cixareyê derzî û dermanan tu fêde nedidanê.

Di her gaveke din de kuxika wî zêdetir dibû û êşa wî jî bi zêdebûna kuxikê diwartir dibû. Êdî tê de hal nemabû ku bimeşe, ji bo ku hinekî bîna xwe bide, li derçika xaniyekî ku kevnûbûna wî jî sewaxa hilweşiyayî ya diwarê wî yê qulqulî diyar bû, bi tiliyên xwe yên qerisî ciyekî biçûk ji berfê paqij kir û li wir pal da diwêr. Ji hêlekê ve erda şil û jî hêla din ve jî bayê ku wekî gûzanekê rûyê wî diçirand, heya mêjiyê nava hestiyên wî ew diqerisand. Dilerizî... ji lerizînê nikaribû cixareyê di nav tiliyên xwe de bigire. Wekî ku darniqêlek nikulê xwe li dareke hişk bixe, reqereqa diranên wî bû. Heke demildest xwe nigihanda ciyekî germ, diranên wî dê jî ber levketinê hûr-hûrî bibûna. Der û dora wî giş bûbû berf û berf li ser lingê wî kom bûbû. Ji ber ku tu hêz tê de nemabû, êdî rabûn qet nedihat hişê wî. Di nava berfê de, wisa qerisî û bêhêz ji xwe ve çû û bi kuxekux li ser tenişta çepê ku du bost berf lê hatibû, ket.

Lampeya xaniyê ku li derçika wê ketibû erdê, vebû. Jineke ku ji pişt perdê temenê wê diyar nedibû, hat ber pacê û çavên xwe li sikaka xalî gerandin. Jê ve ciyê ku dengê kuxekuxê jê dihat xuya nedibû. Jinika bizdiyayî lampe vemirand û di ber deriyê derve re li laşê di bin berfê de nihêrt. Çû ber wî, pêşî bi caketê wî girt û ew hejand; tu bersiv jê nehat. Jinikê bi baldariyeke bitirs guh li

bêdengiya şevê bel kir. Ji der û dor tu his û deng nedihat. Bi wê dilrehetiyê çend carên din bi berstûka caketê wî girt û ew hejand lê dîsa tu bersiv ji laşê qerisî nedihat. Nîşaneyên zindîbûna wî tenê hilma ku mîna dûmana cixarê ji devê wî derdiket û lerizîna wî ya ku dişibiya lerizîna seyekî ku xwe ji avê ziwa dike, bû. Nizanibû çî bike, di ciyê xwe de wisa sekinî û fikirî. Ev heft sal bûn ku jiyanêke bi borandibû. Ev heft sal bûn ku bi tena serê xwe di malê de dijiya û jî bilî çend serdanên lawê ciranê wê, di nava livînan de ew xwe bi xwe bû.

"Lawikê di nav berfê de çiqaş bêguneh û jar xuya dikir." Jinik difikirî. Hemî nedibû ku wî li wir, di nava seqema şeva zivistanê de bihêle. Ji ber ku destên wê diqefilîn, bi dawa xwe berfa li ser wî paqij kir, bi her du lingên wî girt û ew heta nava xênî kaş kir. Bi ketina wan a hundir re bû çîkeçîka çûkê di qefesê de. Di bin nêrînên çûkê de, beriya ku êzing dake sobeya tîna wê şikestiyê, cilên wî jê seqitandin û ew li ser livînê dirêj kir. Piştî ku sobe hinek germ bû û tîna xwe da dora xwe, çend carekê pêjgir li sobê lefand û pêjgîra germkirî li laşê wî pêça. Her ku dema pêjgir lê dipêça tiliyên wê li laşê sar dihingivîn, lerizandîneke ecêb dikete laşê wê; bîyî destûra mêjiyê xwe bineke kûr ji pozên xwe heya nava kezêba xwe dikişand. Pêjgir danî erdê û destê xwe li ser laşê bêdeng gerand; laşê direcîfî hê jî seqemî bû. Cilên xwe ji xwe kirin, laşê xwe yê ku germahiya dojhî ya salan diheviye bi laşê sar ve kir û bi wî awayî kete xewê.

Jinik serê sibê zû ji xew rabû. Lawik dilerizî. Destê xwe li ser laşê wî yê ku berevajiyê rewşa bişev, wekî ku di nava agir de be, germ bû gerand û kete xeyalan. Di xeyalên wê de ew û lawikê ji berfê derketibû hebûn. Gelo li dû jîyana wê ya bi ya ew çend salan, ev diyariyeke Xwedê bû? Bi kuxîniya lawikê li kêleka wê, xeyalên wê jî ber çavan bi dûr ketin. Diviya sobe dadabûya, êmê çûkê bidayê û beriya taştêyekê amade bike, wekî; ku her roj dikir azadiyeke biçûk pêşkêşî çûkê bikira; wê di nava odê de azad berdabûya.

Dema ku Laser şiyar bû bi çavên kûs li der û dora xwe nihêrt. Nizanibû ka ev rewşa ew niha tê de ye xeyal e an rastî ye. Nikaribû çavên xwe baş veke; çavên wî dişewitîn. Laşê wî, wekî ku bi rojan di nava livînan kevn ên hirî de razabe, qerimibû. Êşeke ku zorê didayê ketibû masûlkeyên stûyê wî. Xwest ku masûlkeyên stûyê xwe yê qerimî rehet bike... li hemberî xwe jineke tazî dît. Jinikê destê xwe bi jor ve hildabû û li bazê ku bi firê diket, dinihêrt. Çavên xwe yên ku bi zorê vedibûn hêdî hêdî girtin. Aveke sar bi ser çavên wî yên dişewitin de hat û heya ser singa wî, mîna rûbarekî ji xwe re rê vekir û heya ku rehetiyêke nayê gotin bi ser dilê wî bixe, herikî.

***Ev nivîs di pergala xebatê ya bi Kurdî (Ubuntu'ya Kurdî) de bi bernameya nivîsandîne ya Kurdî (OpenOffice.org) hatiye nivîsandin.**


Şeva Hinê

Recep DILDAR

Ez Hebûn im, zavayê miradnediti. Li qata jor, li odeya ku diwana bavê min lê digeriya, li ser doşega zavatiyê dirêjketî me. 22 sal berê, diya min dişa li vê şaneşînê bi xêrhatin û mizgîniyan ez anibûm dinyayê. Aniha derî li ser min girtine, nahêlin kes xwe biavêje hemêza min. Li ser doşega zavatiyê dilopên xwînê hene lê ne yên ji bûkê ne, ji birinên min niqutine. Temeziyên reng bi reng bi hev ve girêdane, şibandine alaya piroz û bi ser min de wer kirine. Li odeya jor ya aliyê malê keçên xama hineya min diecilînin. Lîrelira keç û bûkan digihîje erşêala: “Kî zava!... Kî zava!... Tililililili.....”

Xêrxwaz û xêrnexwazên gundê me tev bi ser min de xuricîne. Pîrek li hewşa şaneşînê bi ser hev de ketine. Bûk li quncikekî hewşê miçiqiye, dengê îskeîska wê nagihîje wê ji. Hevalên wê yên nêzik xwe lê pêçane, xwe kirine şîrîkê şîn û xemgîniya wê. Diya min bi perincûkan serçavê xwe tev haniye xwarê. Çavên wê yên ku wek du kûpên evînê bûn, di nav girî de fetişîne. Du peyv bi ser zimanê wê ketine, diçin û tên: “Berxo lawo!... Delalyo lawo!...” Car bi car ji xwe ve diçe, pîrekên li dora wê civiyane avê diavêjin serçavê wê. Hewar hewara metik û xaltîyan, lîrelîra xwişk û dotmaman e. Lawijên li ser zimanên pîrekan digerin, newayên ku ji ser komên pîrekan bilind dibin dil û gurçikan diperitînin: “Beranê mala bavê min çargurçik e!.. zavayo lawo!... birîndaro lawo!...”

Zilam li aliyê derve li ber deriyê şaneşinê li ber dîwaran kom bûne, bi ser hev de diponijin. Cixare li ser cixareyê vêdixin. Deng ji tu kesî dernakeve. Perdeya bêdengiyê xwe li zimanê wan lefandiye, di nav bêdengiya



tengijî de dikin biteqin. Kaniya di nav dilê wan
de diherikî, miçiqiye. Kerbela ye, Kerbela!

Hêdî hêdî erebeyên polêsan dikişin, dorê li mala me û gund bi temamî digirin û her diçe xelekê teng dikin. Wek Êzîdiyên li dora wan xêzik hatibe kişandin em di navê de dimînin. Ji xwe sê aliyên me eskeriye ye, têlên bi dirîk in; aliyek me vekirî ye, wî aliyê jî polês dadigirin.

Ev der Elipar e. Gundê kevnare yê bav û kalên me, li Rojavayê Diyarbekrê dimîne. Mizgefta wê bi navûdeng e, di hewşa wê de sê heb birk hene û di nav van birkan de wek birkên Mizgefta Brahîmê Xelîl masiyên pîroz tê de çîrvîtkan didin. Berî qirra fileyan di gund de Ermenî û Suryanî jî hebûne, aniha hew bermayiyên dêrên wan tê de mane. Piştî ku Diyarbekir gelek mezin û fireh bû, xwe spart rojhilatê Elîparê. Ji ber ku her sê aliyên din jî, ji aliyên meydana teyeran ve hatibû dorpêçkirin di halê xwe de qîçqîçî û fetisî. Her çiqas di fermiyetê de êdî navê wê bûbe taxeke bajêr jî, jiyana di nav de xwerû bi Kurdî ye.

Li hêwanê, li ber deriyê odeya ku ez li ser
doşega zavatiyê dirêjketî me qerebalixek
çêdibe, derî hêdika vedibe û pismam û
dotmamên min, heval û hogirên min dikevin
hundir. Xort, bi hêrs in, xemgîniyê li ser

rûyên wan kon vegirtiye, di hundirê xwe de diqêçiqîn. Çavên keçikan şil in, wek ewrên li ber baranê bi zorê xwe digirin, axîna wan ji kezebê tê. Li dora min dibin xelek, mûmîkên ku di nav hineya hundirê tebsîkê de hatibûn çik kirin vêdixin û tev bi destên hevdu digirin. Tevan reş girêdane, xemgîniya rûyên wan, axîna dilên wan bi ser libasên wan de rijiyaye. Qora govenda reşgirêdayî hêdî hêdî dilive û li dora zavayê li ser doşegê digere. Pêşiyê bêdengiyek çêdibe, paşê dotmameke min dev li dilê xwe dike û dest bi stranekê dike û keç û xortên din lê vedigerînin:

*“Çi zavakî, çi narîn e
lo lo lo lo zava
Devliken e, gulbarîn e
Mala Xwedê ava...”*

Her carê ji wan yek tebsîkê digire û li ser min digerîne. Qîr û hewarên ji derve dihatin û tilîliyên ji odeya min derdiketin derve bi hev re bilindî ezman dibûn. Şahiya dawetê û şîna mirinê tevlihev bûbû.

Salek berê dîsa di kelekela havînê de li ber deriyê şaneşîna bavê min daweta min bû. Bavê min di Diyarbekir de mirovekî navdar e, nas û dostên wî pirr in, tevî malbat, gundî û heval û hogirên min qerebalixeke pirr mezin çêbûbû. Di wê germa havînê de bi heft qoran govend digeriya. Keç û xort ketibûn destên hev û stran li hev vedigerandin. Ji ber deriyê şaneşînê heta ser benderan bi sê ciyan def û zirne lê diket. Govendên giranî, delîlo, çaçan, esmer, dizo, yekling, duling, şûrûmortal, çepik, pezkoguro li bin guhên hev diketin. Ji bo dawetê xweş bibînin, pîrek û zarok derketibûn ser sivîrnegên xaniyan. Dawet û dîlanek bi hingeding bû, ji kêf û şahiya dawetê re, stêrkên li ezman jî wê şevê bi me re dikenîyan û bi awayekî din diçirîsîn. Her kesî xweziya xwe bi daweta min dianî. Lê ev dawet û şahiya bi Kurdî, li hesabê hinekan nehatibû.

Wextê hinekirina zava hatibû. Xortan kursiyek danîn naverasta meydanê û nazbalifeke rûyê wê binexş danîn serê. Ecilandina hineyê qediyabû, ketin milên min û ez birim li ser wê nazbalîfê dam rûniştandin. Hîna nû xortan li dora min qor girtibûn ku bû xirexira cemseyan, esker kişiyên û dor li me girtin. Wê şevê gelek kes binçav kirin, ji çar aliyan ve li min digeriyan, ez reviyam, ketim nav gund, hilkişiyam ser xaniyekî û min xwe xist bin lihêfa zarokên di xew de. Min nedîtîn, ez filitim û min rasterast

berê xwe da çiya. Daweta min betal kiribûn, divê min ew heyf ji wan re nehişt.

Di nav heval û hogiran de tam saleke min derbas bû. Lê jiyan ne rihet bû. Me bi her awayî bi dijbariyeke gelek mezin re şer dikir. Û ew roj hat, roja ku ez birîndar bûm û paşê ketim. Paşê ew hatin, bi potînên reş kişiyên ser cesedê min ê bêruh û bêcan. Kîna xwe ya bi sedan salan a ku her tim li ser dilê wan wek kiloreke marê reş rûniştiye, bi ser min de vereşandin.

Xortan destê min hine kirin û bi destmaleke kesk û sor û zer girêdan. Di wê navberê de yên di odeyê de xwe dan alî û bûk di milên du keçan de ket hundir. Xwîn jê kişiyabû, reng di rûyê wê yê sorê sosinî de nemabû. Porê wê tevlihev bûbû, te digot qey tu carî şeh nedîtiye. Her du stêrkên ku di bibikên çavên wê de diçirîsîn tefiyabûn. Ji bo cara dawî li min binêre serçavê min vekirin lê wê xwe negirt û xwe avêt hemêza min. Çepilên min tev nagerin ku li dora nava wê bigerînim!.. Têra dilê xwe giriya, hevalên wê mêze kirin ku wê bixewire hatin ew rakirin. Bi çavên xwe yên şil hinekî li min nihêrî û bi dengêkî nermik gazî min kir: “Welatê min rihet razê, ez vê xwînê li erdê nahêlim,” û paşê...

Û paşê pismam û dotmamên min, xwişk û birayên min li ber serê min çok dan erdê, hêsirên xwe bi ser min de barandin, rûyê min maçî kirin û sond xwarin. Min xwest ez jî bi wan re bigirîm lê hêsir ji çavên min nehatin. Hîn ev seremonî didomiya ku pîrekeke navsere ket odeyê û bi lez got: “Wa ye dike polês têkevin malê, zîlam dibêjin bila xort xwe bidin alî.” Wan jî dan dû min bi ser xaniyan ketin û di nav malan de wenda bûn.

Li derdora şaneşînê deng biliyan, zilmê ji nû ve wek axa sar xwe bera ser gund da. Çend deqîqe derbas nebibû ku qefleyek polês, tevli bavê min ketin hundir. Gava çav li temeziyên rengîn ketin aqil avêtin, dîn û har bûn û berê xwe dan bavê min: “Tu dibêji qey em nizanin ev tişt tev ji bin serê te derdikevin?” Û hilkişiyên ser serê wî. Bavê min ê ku heta aniha çipîskeke pê nebibû, ketibû bin lingê bêbavan.

Yek ji wan ber bi min ve hat û dest bi çêran kir: “Ûlan me tu kuştî jî em ji te xelas nebûn, îcar miriyê te bûye belaya serê me” û heta jê hat potîna xwe ya ripîreş dawşand newqa min.

Neêşiya. Xwezî biêşiya.

Zilamê Başûrî

Ronald DAHL

Saet ber bi şeşan ve dihat û min ji xwe re digot ez ê qedehek bîra bistînim û herim li bin roka ber êvarê li ser sezlongeke derve, li ber hewzê rûnê.

Ez çûm, min ji barê bîra stend û min xwe herikand ber bi jêr, nav bexçe ber bi hewzê ve.

Bexçeyekî têr bi heşinahî, bi beybûn, zûrçik û xweş. Bayê xurt xwe li nav pelên palmiyeyên gûzên hindê yên bilind dida û xuşînî ji pelan dianî. Qirçe-qirça ji çiqulan dihat wek dengên qirşikên nav êgir dişewitîn. Min werşiyên mezin ên gûzên qehweyî ku di bin pelan re daleqiyane diditîn.

Li derdora hewzê çend sezlong, maseyên spî û sîwanên bilind dibiriqîn. Çend zilam û jinikan bi cilên xwe yên hewzê xwe dabûn ber tavê li derdora sezlongan rûniştibûn. Li nava hewzê bi dengên bilind sisê an çar keçik û nêzikî duzîneyekî xort bi goga lastîkî dilîstin û av dipekandin derdora xwe.

Min ji xwe re li wan dinihêrî. Keçikên li hotêlê îngilîz bûn. Ez bi xortan nizanîm lê axaftina wan wek amerîkiyan bû û ez dibêjim şagirtên eskeriyê yên deryavaniya U.S.'yê bûn. Vê sibê keştiya wan ji deryayê xwe dabû ber qiraxê.

Ez bi jor ve çûm û li bin sîwaneke ku çend kursîkên vala li der dorê hene rûniştim. Min qurtek li bîraya xwe ya cemidî da û cixareyek vêxist û bi aramî pal da.

Aramiyeke pir xweş bû. Ji aliyekî ve bîraya cemidî û cixare vexwarin û li aliyekî din temaşekirina mirovên li nava hewza şîn ku soberiyê dikin û peşkên avê dipekînin derdora xwe..

Keştivanên amerîkî bi keçikên îngilîz re xweş didomandin. Wan li ciyê ku xwe bi qiraxê digirtin û xwe diavêtin avê û binav



dibûn û pişt re bi çimên xwe li hev didan û hev binav dikirin.

Ji nişka ve min dît ku zilamekî kinik, navsere bi gavên bi lez li ber qiraxa hewzê xwe dikumkumî. Zilam bedlekî xweşik î spî li xwe kiribû û ew bi gavên bi lez bi zindîbûneke ahengiyeke bê hempa dimeşiya. Çi cara ku gavên xwe diavêt piyên wî ji erdê qut dibû. Şewqeyekî rengqremî dabû serê xwe û bi lez ji wî aliyê din ê hewzê ve dihat û li mirov û kursiyên li derdorê dinihêrî.

Ew li peşberî min rawestiya û bişirî. Her du rêzên asîmetrîk ên diranên xwe yên spî û hûrik ku bi çerxkirinê hatine biriqandin, nişanî min dan. Ez jî bişirim.

“Qisûrê efû bike ma gelo ez dikarim li vir rûnê?”

Min got; “Weh çawa! Kerem bike.”

Ew li pişt kursî bi lez dagerî cihê kursî xweş kir da ku nequlibe. Piş tre ew rûnişt û ling avêtin ser hev. Pehniya pêlavên xwe yên ji çermê pezkûviyan şikênandibû da ku piyên wî xweş hewê bistînin.

Wî got; “Çi êvarek xweş e, yaho!” û domand, “Li vira hemû êvarên Jamaicayê xweş in.”

Ez nizamim gelo devoka wî ya îtaliyan an a spaniyan bû lê ez dibêjim bêşik ew ji devereke başûrê Amerika bû. Û gava yekî/ê ji nêzik ve lê dinihêrî têra xwe bi temen xwiya dikir. Dêdora şeşst û heşt an heftê salî bû.

Min got; “Erê, ev der gelek xweş e ne wilo?”

Wî mirovên li nava hewzê nîşan dan û got, “Bi Xwedê kî ev kesên hanê kî ne? Ewêdî ne xelkî hotêlê ne.”

Min ji wî re got; “Ez dibêjim eskerên amerîkî yên deryayê ne.” û min domand, “amerîkî xwe ji bo deryavaniyê fêr dikin.”

“Erê Xwedê bela xwe bide wan ewêdî amerîkan in ku hemû yên wan ên li ser riyê erdê li her derî wek niha qerebalix û heyte holê dikin. Tu ne amerîkî yî ne wilo?”

Min got; “Na. Ez ne amerîkî me.”

Ji nîşka ve yek ji wan şagirtên amerîkî li ber me rawestiya. Ava hewzê ji laşê wî diwerivî û keçeke ji wan keçikên îngilîz bi wî re bû.

Wî pirsî; “Ma gelo xwediyê van kursiyan hene?”

Min bersiv da; “Na.”

Wî got; “Nexwe ez rûnê?”

Min got; “Kerem bike.”

Wî got; “Spas.”

Gava ew rûnişt û merhema destê xwe li ser kursî raxist pişt re pakêta cixareya xwe û heste danî ser masê. Wî cixare dirêjî keçikê kir lê wê ranehişt cixareyê. Pişt re dirêjî min kir û min rahişt pinekî.

Zilamê kinik got; “Spasiya te dikim, na, lê ez dibêjim cixareya min heye.”

Wî qotiya ji çermên sûsmêr kişand û cixareyeke xwe jê deranî. Pişt re bi kêrikeke ku meqeseke biçûk pê ve ye qûnika cixarê çilpand.

Kurikê amerîkî destê xwe rakir got; “Kerem bikin, ka ez êgir bidim we.”

Zilamê kinik got; “Ba ye! Ewêdî dê pênekeve.”

Kurikê amerîkî got; “Na lo! Ji dil, wê pênekeve. Ew her dem pêdikeve.”

Zilamê kinik cixareya ji devê xwe dûr xist, serê xwe wek dîkê qoqo bi aliyekî ve zîç kir û li kurik mêze kir. Bi nermî got; “Her dem?”

Kurikê got; “Erê ez tu carî rûreş nekirime.”

Serê zilamê kinik hê jî ber bi aliyekî ve wek dîkê qoqo zîç bû û li kurik dinihêrî. “Baş e,

baş e. Nexwe tu dibêjî ew hesteyê min e bi nav û deng qet min li nîvê rê nahêle. Tu welê dibêjî, ne?”

Kurikê got, “Erê, rast e.”

Temenê kurik nêzikî nozdeh an bîst salan bû. Rûdêna wî dirêj pitpitokî û bêvileke dirêj li ser bû. Sînga wî ya pitpitokî ku hinek pirça sor lê ye ji rojê hêj gelekî neşewitibû. Hesteyê destê wî yê rastê li ber vexistinê bû.

Kurikê got; “Ez tu carî rûreş nekirime.” Dibişirî, ji ber ku gelekî ji xwe razî û bi hesteyê xwe ewle bû. Wî domand; “Ez ê sond bixwim ku qet tu carî têk naçe.”

Zilamê kinik got; “Hoop! Ji kerema xwe re, ka hêdî bîstekê bisekinin.” Wek ku trafikê rawestîne destê xwe yê ku cixare tê de bû rakir hewayê.

“Ka bisekinin!” Bi dengêkî nerm, dengêkî bê ton ku çavên wî seraqet li ser kurik bûn. “Ma hûn dibêjin em nikarin li ser vê şert bigirin?” Wî li kurik mêze dikir dikeniya.

“Ma em li ser heste şert bigirin pê dikeve an na?”

Kurik got; “Baş e, dibe, bi şertê çi?”

Zilam got; “Ma tu hez dikî bi şert bilizî?”

Kurik got; “Erê, ez sereqat bi şert dileyizim.”

Zilam rawestiya û li cixareya xwe nihêrî û ez rastiyê bibêjim min qet ji livîna wî hez nekir. Xuya dikir ku ji bo wî fedîkar derxîne hema aniha tiştinan bi kurik bike. Min dît ku kêfek, peroşeke taybet û bêhempa lê meselîtî.

Zilam dîsa li kurik mêze kir û hêdika got; “Ez jî gelekî hez dikim ku şert bigirim. Ma çima em li ser tiştêkî spehî bi şert nalizin? Bi şertlistîneke mezin û baş?”

Kurik got; “Ka kêlikê rawestin, ez nikarim vî tiştî bikim. Lê ez dikarim li ser dolarekî an ez dibêjim hema, ha va ye çend şiling jî.”

Zilamê kinik dîsa destê xwe hejand û got; “Li min bihisîna. Niha em ji bo kêfê bi şert dilîzin. Vêca mêze em ê herin odeya min a li otêlê ku piçkîza ba lê nîn e. Were bi şert ku tu yê vî hesteyê xwe yê bi nav û deng li ser hevdu deh caran nikaribî vexî.”

Kurik got; “Bi şert ez dikarim.”

Zilam got; “Ha vêca baş e. Em şert digirin ne welê?”

Kurik got; “Temam, erê em şert digirin.”

Zilam got; “Na, na. Em li ser tişteki gelekî baş şert digirin. Ez zilamekî dewlemend im û sporker û xurt im jî. Guhên xwe bide min. Erebe ya min li derveyî otêlê ye. Erebeke gelekî baş e. Erebeke amerikî, ji welatên te Cadillac e.”

Kurik got; “Çawa, niha, ka bisekine.” Kurik xwe li ser şezlongê pal da û keniya. “Ma xêr e! Heyra wele ez nikarim ji bin vî barî rabim.”

Zilam got; “Erê xêr e. Tu yê hesteya xwe deh caran li ser hevdu vêxî û Cadillac giha te. Tu vê Cadillacê dixwazî ne welê?”

Kurik hê ji dibişirî; “Êrê ez Cadillacê dixwazim.”

Zilam got; “Nexwe baş e. Ez ê bi şertê Cadillacê bilizim.”

Kurik got; “Ma ka ez çi deynim û bi şertê çi bilizim?”

Zilamê kinik hêdika banda sor ji ser cixareya xwe ya hê jî vêneketî rakir.

“Ez tu carî bi şertê tişteki ku tu nikarî bidî nalizim. Te fêm kir?”

Kurik got; “Ê baş e ka ez bi şertê çi bilizim?”

Zilam got; “Bise ez ê gelekî ji te re hêsaniyê çêbikim, temam?”

“Baş e. Hêsan bike.”

Zilam got; “Tişteki kiçik ku tu bikaribî bidî lê tu ji ber neêşeyî. Baş e?”

“Tişteki wek çi?”

Zilam got; “Tişteki wek, bêguman tilika destê çepê ya qiliçankê.”

Kurik hew bişirî. Rûyê wî qulibî; “Çiyê min?”

Zilam got; “Erê. Çima na? Tu qezenc bikî, erebe ya te ye. Zora te here tiliya te ya qiliçankê ya min e.”

“Min fêm nekir. Tu dibêji çi, tu yê tiliya min jêbikî?”

“Ez ê jêbikim.”

“Pek û sed carên din pek! Yaho wele ev bêaqilî ye. Min digot qey tenê ez ê bi şertê dolarekî bilizim.”

Zilam xwe pal da, destên xwe rakirin ber bi jor ve û milên xwe dawêşandin û got; “Baş e, baş e, baş e.” û berdewam kir; “Ez nizanîm êdî. Te got wê pêkevê lê tu nayêyî bişertî. Werhasil dev jê berde, erê?”

Çavên kurik li mirovên nava hewzê zîq mabû sekinî. Pişt re hat bîra wî ku cixareya xwe vênexestiye. Ew xist nav lêvên xwe, bi destên xwe derdora heste pêça û çerxênî jê anî. Wî bi destên xwe remiya zer a biçûk, bê lertzînok vêxistî parast ku venemire.

Min got; “Ji kerema xwe re ma tu dikarî heste bidî min jî?”

Wî got; “Wî jarê! Ji bîra min çûbû ku agirê te tune ye.”

Min destê xwe rakir ku agir ji destê wî bigirim lê ew rabû ser xwe û heste ji min re girt.

Min got; “Spas,” û ew vegeriya ciyê xwe.

Min ji wî pirsî; “Rewşa te çawan e?”

Wî got; “Baş e. Ew der bi min xweş e.”

Bêdengiyek palan bû, pişt re min dît serkeftîbûna zilamê kinik ku ji peşniyarê wergirt kurik nerehet dikir. Li wê derê bedeng rûniştî bû. Bêşik tansiyona nava wî hin bi hin zêdetir dikir. Pişt re li ser kursî xwe bir û anî, ciyê xwe xweş kir, pêsîra xwe xwerand, destê xwe li piştê stûyê xwe da û dawiyê her du destên xwe danîn ser kabokên xwe û bi tilikên xwe tepinî ji wan anî. Kêlikê bi piyekî xwe li erdê dida û tepinî jê diani.

Kurikê dawiyê got, “Niha ka em binihêrin şert girtina me çawa bû. Te got heyran em herin odeya te û heçkû ez bikaribim deh caran li ser hevdu heste vêxim ez ê Cadillacê qezenc bikim. Lê heçku min winda kir jixwe tu yê vê tiliya min a çepê ya qiliçankê jêbikî. Rast e ne wilo?”

“Erê ezbenî. Şertê me ev bû. Lê ez dibêjim tu ditirsî.”

“Ku ez winda bikim em ê çi bikin? Ma dibe ku ez rahêjim tiliya xwe ya jêkirî?”

“Na, ezbenî! Wê ev ne baş be. Û ya rastî divê ez bibêjim rahiştinê tu qebûl nekî. Ez ê çi bikim berî ku em dest pê bikin ez ê destekî te bi masê ve girêbidim û gava te winda kir bi kêrekê li wir amade bim.”

Kurik pirsî; “Cadillac çend model e?”

“Çawa, qisûrê efû bike min fêm nekir.”

“Modela Cadillacê, çend salî ye?”

“Haa! Çend salî? Erê. Par. Hêj erebe nû ye. Lê wek tu ne zilamê ku yek bi te re bi şert bilize. Ewêdî, amerîkan hemû welê tirsonek in.”

Kurik hinekî rawestiya û pêşî awirek avêt keçika îngilîz, pişt re min û bi dengêkî tûj got; “Erê. Ez ê bi te re şert bigirim.” Zilam hêdîka carekê her du destên xwe çepik dan û got; “Baş e.”

“Niha em ê pêk bînin. Û ezbenî tu” wî berê xwe da min, “tu bi temamî bes î, hûn ji bo şahidê me çi dibêjin?” Çavên wî ji helecanê beq û bêreng bûn.

Min got; “Baş e. Ez dibêjim ev bi şert listina we tişteki dînîti û bêaqilî ye. Bawer nakim ku ez gelekî jê hez bikim.”

Keçika Îngilîz ev cara yekem bû ku diaxivî; “Ez jî, bi ya min jî ev bêaqilî û ehmeqî ye.”

Min got; “Ma tu mitalaya vî kurê ku wê zora wî here û tiliya wî jêbibe dikî?”

“Birastî ez li ber dikevim. Û heçku zora wî here ez nêzikî tiliya jêkirî ya vî kurikî me?”

“Birastî ez jî. Ku ez wextê Cadillaca xwe bidimê heçku qezenc bike. Rabin. Em herin odeya min.”

Ew rabû ser xwe û got; “Ma tu pêşî cilên xwe li xwe nakî?”

Kurik bersiv da û got; “Na. Ez ê wilo werim.” Pişt re ew li min zivirî û got; “Ez dixwazim tu bi me re werî û bibî şahidê me.”

Min got; “Temam baş e. Ez ê werim lê ez ji qumarê hez nakim.”

Wî got keçikê; “Ma tu jî têyî?” Domand, “Were ji xwe re biferice.”

Zilamê kinik ji dawiye ber bi hewşa hotêlê ve rê nişanî wan da. Wê wextê ji kêfan tirek bikira, zîtrik didan û kêf kêfa wî bû gava ku ew bi wan re dimeşîya.

Wî got; “Ez gelekî bi helecan im.” “Ma tu pêşî dixwazî erebê bibînî. Ha va ye li vir li devê dêrî ye.”

Wî em birin devera ku me dikarî li kolana pêşîya hotêlê erebeyê bibînin. Ew rawestiya, Cadillaca keskekî rengavêti û dibiriqî park-kirî bû.

“Ha wa ye ew. Ew a kesk e. Spehî ye?”

Kurik got; “Erebeyeke xweşik e.”

“Naxwe de em herin jor mêze bikin ka tu yê wê qezenc dikî”

Me bi mitaleyekê da dû û em çûn qata yekemîn ber devê deriyê odeya wî. Wî deriyê xwe mifte nekiribû û em hemû ketin hundirê odeya xweş û fireh ku du nivîn tê de ne. Cilên jinekê li ser nivînekî ji wan bû.

Wî got; “Pêşî” û berdewam kir “em hinek Martîniyê vexwîn.”

Vexwarin li ser wê maseya li kurçika wî aliyê din ê odê bûn, hemû ji bo tevlihevkirinê amade bûn. Têra xwe qedeh, qeşa û levdanok ji li ser masê bûn. Wî dest bi amedekirina Martîniyê kir, lê li aliyê din zingilê derî lê ket û niha ji hinekan li derî didan û keçika xizmetkar derbasî hundir bû.

Wî got; “Ax! Ew tu bû yî?” Keçikê şûşeya cînê danî. Wî ji xelîtka xwe ya berikê poundek derxist û ji keçikê re got; “Ji kerema xwe re, tu yê tişteki ji min re biki?” Pere da keçika xizmetkar û got; “Tu vî bigire.” Û domand, “Em ê niha li vir listikekê bilizin û ez ji te ne du, sê tiştan dixwazim. Ez hinek bizmar dixwazim; çakûcekî û kêreke qesaban ku tu yê ji midbexê rica biki. Tu dikarî bîni, erê?”

“Peppûk! Kêra qesaban!” Keçik çavên wê beq destên xwe li pêşîya xwe danîn ser hev û metelmayî got; “Tu birastî çêl kêra qesaban dikî?”

“Erê, erê kêr.. De haydê ji kerema xwe re. Van tiştan meyz bi esehî bê tu peyda nakî”

Keçikê got; “Baş e, ez ê xwe biceribînim. Heya ji min were ez ê binim.”

Û keçik çû.

Zilamê kinik martîni levida. Em li wir sekinîn û me qurt li martîniyên xwe didan. Kurikê tazî ku rûyê wî dirêj pitpitokî û bevîla wî wek lambê daleqiyayî ji xeynî derpêkineki qehweyî ku reng qulubiye pê ve lê ne bû. Keçika îngilîz por berdayî bi cilên xwe yên hewzê ku rengêkî şînî qulubî ne seraqet di ser serê qedeha xwe re li kurik dînihêrî. Zilamê kinik bi çavên xwe yên bêreng li wir di nav bedlê xwe yê sipî û paqij de sekinibû martîniya vedixwar û li keçika cilşîn mêze dikir. Min hew dîzanî ka ez çi bikim. Zilam li ser şertgirtinê gelekî cidî xuya dikir, ew ji bo jêkirina tilikê jî cidî bû. Weytî weytî!

Em ê çawa çêbikin ku zora kurik here? Ma ne dibe ku em wî bi Cadillaca qezencnekirî bibin nexweşxaneyê. Ha vêca werin safî bikin! Lawo bi şeref birastî jî wê ne baş çê bibe. Min heyra vî temenê xwe tişteki wilo kambax nedîtibû.

Min got; “Ma ev şertgirtina we ne himekî ye?”

Kurik bersiv da; “Bi ya min şertgirtineke gelekî baş e.” Û qedeha mezin ya martîniyê bi ser xwe de kir.

Keçikê got; “Bi ya min ehmeqiyeke mezin e. Ku zora te here wê çi bibe?”

“Ew ne mişkule ye. Tu were bifikire, nayê bîra min ku min di heyata xwe de tiliya qiliçankê ya çepê bi kar aniye. Ha va ye.” Kurik bi tiliya xwe girt. “Ha va ye ew û wî hêj tiştêk bi min nekiriye. Erê ma çima divê ez bi şert nelizim? Bi ya min şertgirtin listineke baş e.”

Zilamê kinik bişirî û rahişt levdanokê û qedehên me dagirtin. “Beriya em dest pê bikin.” Û domand; “ez dixwazim pêşî mifteya erebeyê bidim şa şah şahid.” Mifte ji berika xwe derxist û da destê min. Wî got; “Ewraq” û domand; “Ewraqên din, ruhset û sîgorte di erebeyê de ne.”

Pişt re keçika xizmetkar ku cilên wê rengu rengu ne vegeriya. Di destê wê de kêreke biçûk ku qesap hestiyên bigoşt hûr dike, çakûç û tûrekî bizmaran hebû.

“Baaş e! Te her tişt anîne. Spas, gelekî spas. Niha tu dikarî biçî.” Ew heya ku keçik çû derî dara sekinî bû. Pişt re wî ew firaq danîn ser nivînekê û got; “Êdî ka em amedekariya xwe bikin, erê?” û gote kurik; “Ji kerema xwe re alikariya min bike em vê maseyê hinekî rast bikin.”

Ew maseyeke çargoşe ku aliyekî wê sê bost û aliyê dinê jî çar bost bû. Li ser vê maseya hotêlê jî bo nivîsandinê hibr, kaxiz û pênivîs hebûn. Wan mase jî ber diwêr dûr xistin û firaqên ser dane alî.

Wî got; “û niha,” “kursiyek.” Wî rahişt kursiyekî danî ber maseyê. Ew gelekî bi helecan û xurt dilivîya û te digot qey ew jî bo zarokan listikekê amede dike. “Û niha bizmar. Divê ez çend bizmaran bikutim.” Wî bi çakûç bizmarên xwe li ser masê kutan.

Kurik, keçik û ez di destên me de Martînî li wir li ser serê mêrikê dixebitê re rawestiyabûn. Me li wî dinihêrî, gava ku du bizmar qederê şeş tiliyan dûrî hev di maseyê de kutan. Wî heya dawiyê bizmar nedikutan, hinekî bizmaran nekutayî li derve dihişt. Pişt re ew bi tiliyên xwe kontrol dikirin gelo saxlem in an na.

Min ji xwe re digot, kî dizane ev kurê dêlikan berî niha jî ev tişt kiriye. Wî xwe qet dudilî û şaş nekir. Mase, bizmar, çakûç, kêra qesaban. Wî temami dizanibû çi ji wî re lazim e û wê çawa çêbike.

Wî got; “û êdî niha benikek ji me re divê.” Wî benik peyde kir. “Ha vêca em amede ne.” Wî got kurik; “Ji kerema xwe re li wir, li ber maseyê rûnê.”

Kurik qedeha xwe danî û ew rûnişt.

“Niha vêca destê xwe ye çepê bixe neqeba wan her du bizmaran. Bizmar tenê ji bo ku ez destê te girêbidim. Baş e. Niha ez ê destê te bi maseyê ve girêbidim.”

Wî benik li bazinda wî pêça, pişt re li derdora ciyê fireh yê destî pêça û qenc jidand bi bizmaran ve. Wî karekî gelekî baş pêk anî. Piştî wî qedand kêşî nikare bibêje ku kurik destê xwe bilebitîne. Lê wî tenê dikaribû tiliyên xwe bilebitîne.

“Niha ji kerema xwe re ji xeynî qiliçankê wan tiliyên din miç bike. Divê tu tiliya xwe li ser maseyê qenc vekî.”

“Ha wilo! Gelekî baş e! Niha em amede ne. Bi destê xwe yê rastê heste vêxî. Lê ka bise ji kerema xwe re.”

Wî bi lez ji ser nivînan rahişte kêrê. Vegerî û li ber maseyê bi kêra di destê xwe de sekinî.

“Ha vêca em bi temami amade ne.” Wî got; “Kekê şahid, divê tu bibêjî dest pê bikin.”

Keçika îngilîz bi cilên xwe yî hewzê yên şîn ku rengê wan qulibiye li pişt kursiyê kurik sekinibû. Keçik bê gotina tiştêkî, tenê li wir bû. Kurik li ser kursiyê xwe rûniştî, di destê wî yê rastê de heste hebû û li kêra goşt mêze dikir. Zilamê kinik jî li min dinihêrî.

Min ji kurik pirsî; “Ma tu amade yî?”

“Ez amade me.”

Ji zilamê kinik pirsî; “Ma tu?”

Wî got; “Erê ez jî amade me.” Û kêr di dest de li hewa nêzikî tiliya kurik qederê du bostan jê dûr amede bû ku dê tiliyê jêbike. Kurik lê dinihêrî lê, qet xwe nedilebitand û devê wî jî qet nedilebitî. Wî tenê birhên xwe ber bi hewa ve rakirin û hew.

Min got; “Baş e, nexwe kerem bikin, fermo, dest pê bikin.”

Kurik got; “Ji kerema xwe re wexta heste pêket ma tu dikarî bi dengêkî bilind bihejmêrî?”

Min got; “Erê, Ez ê wisa bikim.”

Tiliya xwe ya beranekê li ser serê heste rakir û bi tiliya beranekê çerxênî ji tekerok anî. Çikên êgir ji kevirê pekiyan û difnîka gazê bi remiyeke zer pêket.

Min got; “Yek!”

Wî nehişt ku remiya agir vemire; wî serê heste digirt û ew berî ku dîsa pê bixe pênc çirkeyan disekinî.

Wî bi hiça çerxênî ji tekerok dianî û va ye careke din remiya biçûk a êgir zer kir.

“Didol!”

Kesî tu tişt nedigot. Çavên kurik li ser heste bûn. Zilamê kinik kêr di dest de li hewa amade li heste dinihêrî.

“Sisê!”

“Çar!”

“Pênc!”

“Şeş!”

“Heft!”

Heste bi cih û can dixebitî. Kevirk çikên geş didan û dawîya remiya agir. Min li tiliya beranekê dinihêrî, bi lez ji ser tekerok dihate xware. Pişt re rawestanek. Dîsa tiliya beranekê careke din li ser serê heste rabû. Ev hemû karê tiliya beranekê bûn. Tiliyê her tişt dikir. Min nefesa xwe girt ku xwe amade bikim bibêjim heşt. Tiliyê çerxenî jê anî. Çik pekiyan û remiya agir xuya kir.

Min got; “Heşt!” bi gotina min re derî vebû. Em hemû li derî zivirîn û me dît ku jinek li devê derî ye, hûrik, por reş û bi têra xwe bi temen e. Qederê du çirkiyan sekinî û pişt re bû qijeqîja wê; “Carlos! Carlos!” Bi çengê wî girt, kêr ji destê wî derxist û avête ser nivînan, bi bestika çakête wî yê spî girt û ew bi himet hejand, bi dengekî bilind, bi lez û qîjewîj bi zimanekî wek spanî bi ser mêrik de hîlbû. Hingî wê zilam bi himet dihejand yekî ew nedidît. Ew bû wek pisîk, çav melûl û wek tekerekî gindirand û xwe ji nav lepên wê xilas kir.

Pişt re hinekî aramî lê palan bû û zilam bi tirs hinekî nêzik bû dîsa. Wê ew kişkişand aliyê dinê yê odê û ew dehf da pişt nivînekê ji wan. Zilam çavên xwe diniqniqandin û li keviyekê rûnişt û bi mitale lê dinihêrî ku ma gelo dîsa êrişî wî bike.

Jinikê got; “Li qisûrê nemêzînin” bi îngilîziyeke hêrî xweş û herikbar domand; “Birastî bibexşînin ji ber vê bûyerê.”

“Ev gelekî xerab e.” wê domand; “Hemû sûcê min e. Kêlikê min ew tenê hişt ku herim porê xwe bişom û ez wegeriyam, dîsa ya dilê xwe kir.” Ew gelekî bi mitale û xemgîn xuya bû.

Kurik destê xwe ji maseyê vekir. Keçika îngilîz û ez bê gotina tişteki li wir rawestiyabûn.

Jinikê got; “Ew şeytanê bintepik e.” Li xwarê li dera ku em li malê dijîn heya niha çil û heft tilî ji mirovên cûr bicûr jêkirine, û heft erebe jê çûne. Ji ber vê yekê ew tehdît kirin ku wî ji van deran dûr bixînin. Loma min ji ew anî wir, jor.”

Zilamê kinik ji ser nivînan bi himehim got; “em ji xwe re tenê bi şert dilistîn.”

Jinikê got; “Xwedê dizane wî li ser erebeyê şert girtiye.”

Kurik bersiv da; “Erê, Cadillac.”

Jinikê got; “Na bavo! Çi erebeyên wî nîn in. Ew ya min e. Ha vêca ev ne baş bû.”

“Çawa tişteki yekî nebe û li ser tiştan bi şert bilîze. Ez fedî dikim û gelekî xemgîn im.”

Birastî ji jineke gelekî xweşik bû.

Min got; “Baş e, nexwe ha va ye mifteya erebeya we.” Min ew danî ser maseyê.

Zilamê kinik dîsa bi minemin got; “Em tenê ji xwe re bi şert dilîztin.”

Jinikê got; “Tişteki wî nemaye ku li ser bi şert bilîze. Tişteki wî li vê, li ser rûyê erdê nemaye. Şerilehe Rebê alemê. Wek minak ez li ser xwe bibêjim berî niha bi gelekî min her tiştên wî jê birin. Têra xwe wext girt, wextekî pir dûvdirêj û karekî pir dijwar bû, lê dawî min zora wî bir.” Jinikê li kurik nihêrî û bişîrî, bişîrîneke sivik, xerab û ew hat bi ser re li ber maseyê destekî xwe dirêj kir ku rahêje mifteyê.

Min ew dît, ku tiliyên destê wê ji xeynî tiliyeke ya beranekê pê ve nîn bûn.

*Wergera ji Îngilîzî: Aydin Rengin
renginaydin@hotmail.com*

WÊJEYA KURDÎ Û MEDRESE

Amadekar:

Azad ZAL – Omer FÎDAN

Wêjeya Kurdî û Medreseyan Kurdan

Ayhan MERETOWAR

Ji Hundir ve Zanîngehên Qedîm; Medreseyan Kurdistanê

Merdan NEWAYÎ

Medreseya Kurdî

Zeynelabîdîn ZINAR

Medreseyan Kurdistanê

M. Reşîd IRGAT

Fermana bo Meleyên Bêmi'as

DILKANÎ

“Di Medreseyan De Zimanê Kurdî û Wêjeya Kurdî Bi

Xwezayî Hatiye Parastin” (Hevpeyvîn)

Azad zal - Omer Fîdan – Serwet Denîz

Gazina Ji Felekê

Mele Xalit

Li Ser Medreseya Kurdî Lêkolînek

Kerem SOYLU

Çend Serpêhatiyên Medreseyan (Berhevkirin)

1-Gilorbe Dibe 2- Hêstira Pîr 3- De'ful Bela

Omer Fîdan

Di Wêjeya Kurdî de ciyê wargêhên xwendin û perwerdeyê gelek girîng e. Ji lew re ji mêj ve wêjevan, helbestvan û hunermendên gewre yên Wêjeya Kurdî ji van wargêhan derketine û cihê xwe di nava rûpelên dîroka Wêjeya Kurdî de girtine. Wargêhên xwendin û perwerdehiyê cur be cur in. Li Kurdistanê piranî ev wargêh ji aliyê serdestan ve hatine avakirin. Di dema Îslamê de bi navê “MEDRESE”yan ev wargêhên perwerdehî û xwendekariyê hebûne. Ji van medreseyan gelek wêjevan û şair û hozan û zanayên mezin û navdar derketine. Wekî Baba Tahirî Uryan, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj û hwd.

Medrese di bingeha xwe de dibistanên olî ne. Her çiqas ji bo hemû olan ev derbas bibe ji bi taybetî medrese di nava civaka Îslamê de hene. Berî ku dibistanên laîk bîn avakirin, medrese hebûn û li van medreseyan zana û pêşevanên civakê dihatin perwerdekirin. Di bingehê de ev telîm û terbiye li ser telîm û terbiyeya ola Îslamê bû. Lê wek ku di naveroka dosyeyê de ji gelek

kesan diyar kiriye ji ber ku şerha dersan bi kurdî hatiye kirin bivê nevē ji bo pêşketina wêje û zimanê kurdî ji roleke girîng listine. Gava ku qala ziman tê kirin em kurd sê tiştan her tim bilêv dikin: Dengbêjî, dayik û medrese.... Lê mixabin her sêyan ji bi zanebûn ziman ne parastine. Ev parastin wek encameke xwezayî derketiye holê. Lê ji bo ku ev rewş baştir bê fêhm kirin me xwest ku em bi berfirehî bigirin dest û ji van her sê qadan “MEDRESE”yan ji aliyê wêjeyî ve bi nîfşên nû bidin nasandin... Wek gotina dawîn em viya ji bibêjin gava ku em dibêjin ziman û wêje; li van qadan bi awayekî xwezayî derketiye holê. Bi tu awayî em rola wan înkâr nakin. Lê her tişt ji divê li gorî rastiye xwe bê nîrxandin. Jixwe ciyê mixabîniyê ye ku îro êdî ne dengbêjên me; ne dayikên me; û ne jî medreseyan me vê rolê naleyîzin...

Wêjeya Kurdî û Medreseyên Kurdan

Ayhan MERETOWAR

Ji bo ku em bi awayekî rast û tekûz bikaribin vê meseleyê hel bikin, divê em bi tarîxa edebiyata kurdî jî bizanibin. Di tarîxa edebiyatê de jî, serdemên edebiyatê tên pêşiya me. Ha ev serdema edebiyata kurdî ya heyama medreseyan, dikare bi tena serê xwe bibe mijara me.

Demekê bifikirin ku ciwanên gel, bi zimanê xwe tehsîla ilmê dikin. Gava hîni zimanekî din jî dibin, dersa wan bi zimanê wan ê zikmakî tê dayîn. A rast, gava mamosteyên wan, kitêbeke erebî yan jî farisî, bi wan didin hînkirin, hema yekser jî wî zimanî werdigerînin zimanê kurdî. Gelo ne diyar e ka dê ev ciwanên ber tehsilê çiqas xweş hîni zimanê xwe yê maderî bibin? Gelo êdî mirov xweş pê dernaxe ku dê ev ciwan çiqas xweş bikaribin rengê xwe yê eslî bidin edebiyata xwe?

Di Tehsîla Ilmê Olî de Zimanê Kurdî

Li atmosfera ciyê xwendin û tehsilê binihêrin, zimanê maderî yê qutabîyan/xwendekaran, qedexa nîn e. Gava dibe wextê sohbet û yariyan, ev şagirtên ber xwendinê, bi awayekî azad, bi zimanê xwe dipeyivin, henekan dikin û difikirin. Tu mamoste ranabe xwe hêrs nake û ji wan re nabêje “Bi zimanê xwe yê dê û bavan mepeyivin!”

Mamoste bi xwe jî gişt kurd in. Bi ser de jî pispore kurdî ne. Tu kes, ji ber ku telebeyên ber tehsîla ilm, bi zimanê xwe yê eslî dipeyivin, feskê xwe bi wan nake.

Jixwe di nav kitêbên dersê de jî, tevî kitêbên ku bi zimanê din in, kitêbên ku bi zimanê maderî yê telebeyan in jî hene. Hîna jî destpêka xwendinê ve, ji wextê xwendina Elifbêtikê ve, tehma zimanê maderî dikeve nav hiş û bin zimanê feqiyên medreseyan. Gava dersa elif û bê tê dayîn, ders bi

kurmancî tê gotin. Dengê herfan bi xwe jî dengê kurdî ye:

“Elif, bê, tê, sê, cîm, hê, xê, rê, zê..... hê, waw, lamelifla, yê dudu li bin.”

“Elif tune; bê yek li bin. Tê dudu li ser, sê sisê li ser, cîm yek li bin hê tune xê yek li ser.....”

Pey re dor tê ser van dersan:

“Elif du ziber en, du zêr in, du pêş un. Bê du ziber ben, du zêr bîn, du pêş bûn...”

Piştî xwendina Quranê, îca xwendina Mewlûdê tê. Ev kitêb bi temamî kurmancî ye, mewlûda dimilkî jî heye. Pey re dor tê ser pirtûkên mîna Eqîdeya Îmanê ku ji aliyê Ehmedê Xanî ve bi kurmancî hatiye nivîsandin, Nûbihara Biçûkan kurdî-erebî ye û bi helbestkî ye, Nehcûlenama Mele Xelîlê Sêrtî – helbestkî ye û bi kurmancî ye, Tesrîfa Kurmancî, Zurûf, Terkîb... Ev jî bi wî zimanê maderî yê feqiyên kurd e. Ji xeynî vana, kitêba bi navê Îrşad-ul Îbad jî ku behsa Îlmîhalê dike, bi kurmancî ye.

Yek rabe bibêje ku telebe dikevin bin tesîra zimanê erebî, ji binî nabe ku em bibêjin kurdî, di tehsîla ilmên medreseyan de dibe zimanekî lawaz. Mele û telebeyên medreseyan, bivê nevê, bixwazin nexwazin, bê hemdî xwe, baş hîni kurdîyê dibin. Heta tîrê dereceyeke wisan ku hewcedarî bi ponijîna ser fikirîna kelîmeyan nabînin. Êdî hişê wan bi temamî bi kurdî dixebite.

Li Medreseyan Zimanê Dê û Zimanê Neteweyî

Rewşa herî balkêş jî ew e ku her telebeyekî medreseyê, ji hêlake welat hatiye nav heval û hogirên xwe yê medreseyê. Tevî zimanê xwe yê herêmî, roj bi roj, hîni zimanê heval û hogirên xwe yê ku ji ciyên cure cure yê welat in jî dibe. Wekî din feqî, tenê ne li ciyekî

dixwînin; ji xeynî ciyê xwe, li gelek medreseyên ciyên din digerin. Zimanê feqîyan, êdî ne zimanê dê û zimanê herêmi ye; zimanê wan digihîje asta zimanê neteweyî. Ev jî hêz e ji bo wan da ku bikaribin berhemên heja bidin edebiyatê.

Heke em ji bo bakûrê welêt bifikirin, ji ber ku li medreseyan, feqiyên dimilî û kurmanç bi hev re dixwînin, haya wan ji zaravayan jî çêdibe.

Gava ev ciwanên medreseyê dibin talib, êdî kitêbên xwe yên rêzê diqedînin, digel hînbûna îlmê Îslamî, baş hîni şînûrkê kurdî jî dibin. Ew taqet û mecal heye bi wan re, gava ku ji medreseyê îcazeta xwe digirin, êdî di warê ziman û edebiyata kurdî de, dibin xwedî zanîn û feraseteke baş jî.

Hem bi ser de jî, ev awa û wezîyet, ne bi salan, belkî bi sed salan dewam dike. Hêz digire, teşe digire, dibe xwedî pergaleke çê.

Medrese û Huner

Karê feqiyên medreseyan, xwendin bû. Zemanê wan bol bû. Lewre bi rihetî dikaribûn berhem bidana.

Rojên betlaneyan, -êvara inê- dema listik, henek û yariyên telebeyan e. Ehlê medreseyan, çandeke xwe ya pir xerib heye. Bi taybetî jî edebiyata mîzahê ango qerf jî zaf bi pêş de çûye. Heta li ser nan û xwarinê jî helbestên ku rewîsta kurdiya resen nîşan didin, wan feqiyên ku bi tehma zimanê xwe qelew dibûn derdixist:

*“Selamun eleykum eya tirşiyê
Kerem ke tu wer pêşiya sêniyê
Mehîrun mehîrun mehîrun mehîr
Ji erda Selaxê bigre ta bighê Cizîr
Penîrê biharê ji mastê miya
Layiq e meriv deyne ber feqiya
Yê min e yê min e yê min e yê min
Zebeşê ku sor e û nanê genim”*

Heke em bi çavê “huner”ê li edebiyata kurdî binihêrin, divê li gor van beşan be:

1. Edebiyata devkî ya kurdî
2. Edebiyata nivîskî ya kurdî

Edebiyata devkî, di nav xwe de dabeşî edebiyata gel a ser mijarên serbest û edebiyata gel a ser mijarên olî dibe. Dengbêj, dikevin bin banê edebiyata devkî ya ku mijara wê serbest e. Ew derwêşên ku

zemanê berê dihatin li nav gundan digeriyan û beyt û qesîdeyan digel elbaneyê, li ser banekî nava gund digotin, edebiyata kurdî ya olî li ser piyan dihiştin. Ha ev edebiyata kurdî ku li medreseyan hêşîn dibû, bi vî awayî jî nav feqî û meleyan derdiket, digihîşt gel jî. Lewre piraniya beyt û qesîdeyan ku van derwêşan bi awayekî newayî digotin, helbestên meleyan bûn.

Dibe ku pirseke weha jî were hişê me: “Gelo helbest û qesîdeyan ku van derwêşan digot, ne yên wan derwêşan bi xwe bûn?”

Bêguman bersiv “Belê, helbest û qesîdeyan ku derwêşan bi xwe ew li edebiyata kurdî zêde dikirin jî hebûn. Mesela li gundên herêma Batmanê, bi navê Derwêş Qado, derwêşekî navdar hebû. Ez bi xwe gihîştîmê, wî bi xwe jî gelek beyt û qesîde derxistibûn û tevî lêdana elbaneya xwe, li nav gel digot.

Medrese û Werger

Seydayên biîcazet, kitêba herî pîroz ku Quran e, di dersdayinê de, ji bo feqiyên xwe, werdigerînin kurdî. Hedîseyan werdigerînin kurdî. Hiqûqê bi kurdî didin hînkirin. Menqîbeyên Îslamê bi kurdî vedibêjin. Elf û Leylan ku navê wan çîrokên edebiyata ereban e, bi kurdî didin guhdarîkirin. Îlmihala mezhebên xwe, bi kurdî didin hînkirin. Axirkî zimanê kurdî li medreseyan wisan tê bikaranîn ku êdî hemû rê û dirb, hem li ber telebeyan hem jî li ber kurdîyê tên vekirin.

Seydayên Biîcazet û Civak

Gava dawek, dozek an şînek, şahiyek çêbibe li nav gel, seydayên ku bûne meleyê muntehî, li serê civatê tên rûniştandin û her kes li devê wan dinihêre. Ew jî bivê nevê, ji bo çareserîya daw û dozan, ji bo sivik-kirina derd û kulan, heta ku ji wan tê, çî xweşî û henûniya zimanê kurdî hebe, tevî hemû hunera xwe, zorê didin xwe û mîna heba tizbiyê, peyv li ser peyvê dibijêrin, hevok li ser hevokê mîna hosteyên diwarên kevîran, datînin ser hev. Reng û rûyê kurdî xweş dikin. Dikin ku gel jî, hinekî qedr û qîmetê bidin zimanê xwe yê rojane yê axaftinê.

Zimanê Seydayên Biîcazet û Pîr û Edeba Medreseyan

Kelîmeyên mîna “ezbenî”, “lebê” û “ezxulam” ku nazikî û hurmetê nîşan didin, ji nav çand, pîr û edebê ehlê medreseyê derketine hatine

ketine nav civaka me. Tevî van awayan “bipîrkirina” dengê axaftinê jî, li vê derê çêbûye. Ew qubetî û bêedebiya peyivînê jî, li vê derê ciyê xwe dide giranî û hezkirinê. Ev bi xwe, rengê xwe dide zimanê nivîskî, ango edebiyatê.

Mirtibên nava kurmancan, baş bi kurdî dizanin. Ew wê kultura xwe ya argo, di warê axaftinê de, dikin ku bikeve nav pale û gundiyan. Kurmanciyeke nêzî qereçitiyê bi xwe re çêkiribûn. Bi baweriya min, ehlê medreseyê nehişt ku hema bi temamî zimanê axaftina gel, bikeve bin hikmê zimanê wan.

Seydayên Biîcazet û Edebiyata Gel

Bi qasî ku pê dizanim, seydayên mezin, tu carî xwe ji edebiyata gelê xwe, dûr negirtine. Berevajiyê vê, heta ku ji wan hatiye, ciyekî hêja dane dengbêjan. Hiyama ku di nav civakê de hikum di destê meleyan de bûye jî, li ser navê dîn, ranebûne kilam û kelepore miletê xwe di çavê gel de haram nekirine. Bi ser de jî, hema hema her meleyekî, hevaleyê xwe yî dengbêj hebûye. Meleyê gundê me, - Seydayê Mele Resûlê Xweşayî yê rehmetî- li mala xwe, piştî ku waz û nesîhet dida gundiyan, ji Elf û Leylana erebî jî hikaye digot. Peyre jî ji Dengbêj H.Mihemedê Xato kilam guhdarî dikir. Hema hema dostê wî yê herî nêz jî ew bû. Çima gelo qey em hemû nizanin ku Ehmedê Xanî bi xwe jî, berhema xwe ya bi navê “Mem û Zîn” li ser bingeha edebiyata devkî ya kurdî derxistiye.

Heta hinek meleyên dengxweş, bi şexsî bûne dengbêj. Li nav feqiyan jî gotina qesîdeyên bi kurmançî zaf deng daye.

Seydayên Medreseyan û Welatparêzî

Min bawer e piştî ku me dît ev qas medreseyî û zimanê kurdî bi hev re dost û ehbab in, nabe ku em li ser welatparêziya wan jî, nesekinin.

Çawan ku Hesên Hîşyar jî di pirtûka xwe ya ku behsa berxwedana Şêx Seîd dike de, gava pêşmergeyên kurd dikevine Diyarbekirê, meleyekî welatparêz, ji kêfan derdikeve ser minareyê û azan dide û taliyê şehîd dikeve.

Dîsan her kes bi têkoşîna şêrhogîçî ya Seydayê Mele Ebdullahê Tîmoqî yê rehmetî dizane. Jixwe doza rehmetiyê Seydayê Mele Mustefayê Berzanî, ne hewceyî gotinê ye;

mezinî û heybeta wan, derket hember çavê hemû cihanê.

Edebiyata Kurdî û Rista Meleyên Muntehî

Zimanê nivîskî yê kurdî, çi demê dest pê kiriye, hîna jî mijara lêkolînê ye; lê belê kurdîya nivîskî, her kes jî pê dizane ku li medreseyan dest pê kiriye. Berhemên edebî yên ku li nav gelê kurd nav û deng dane, ji hêla mele û seydayên medreseyan ve hatine derxistin.

Ehlê terîqetê jî ku bi kurdî dest bi nivîsandina helbestên kurdî dikin, – nemaze terîqeta Neqşebendiyan – piştî ehlê ilmê ye.

“Zimanê kurdî, pêşî li medreseyan an jî ji hêla mensûbên medreseyan hate nivîsandin. Di edebiyata kurdî de ew kitêbên ku bi sedsalan e hatine nivîsandin û em behsa wan dikin tev, ji medreseyan derketin. Kurdan tenê di medreseyan de dikaribûn bi zimanê xwe bixwînin. Ji bona vê, ew kesên ku bi zimanê kurdî berhemên hêja pêşkêşî xelkê xwe kirin, tev ji medreseyan derketin.

Îro bi kêmbûna medreseyan, hejmara wan nivîskarên jî kêmbû. Ew kesên ku ji zimanê kurdî re xizmet kirin, tev jî fêkiyên medreseyan bûn. Çiqas heyf e ku îro em ji wan fêkiyan mehrûm in, medreseyên feqiyan jî mehzûn û melûl in.”

Girtina Medreseyan û Navberdayina Edebiyatê

Em bi xêra xebata kovara Nûbihar û Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê û çend edîbên me yên ku ji xwe re li Ewropayê stirîne, pê hisiyan ku çiqas berhemên hêja yên edebiyata kurdî, veşartî hene. Gelo ne ji wan bûya, ew dîwanên “nepenî” yên wan edîbên me yên ku heta niha hay û baya kesî ji wan tune bû, dê bi çi awayî derketina ber ronikahiyê?

Neyar û dijminên urt û ocaxa gelê me, tevî hemû heyinên me, medreseyên me jî girtin. Feqî û alimên me jî, bi gotina seydayê rehmetî Mele Seîdê Kurdî, perişan kirin. Gelê me ji roniya çiraya edebiyata me bêpar kirin. Heta çendakî dirêj, qelemên edîbên me, li aziyê man.

Şikir ji Xwedê re û mala têkoşerên kedkarên ku ji nû ve rê li ber edebiyata me vekirin, hezar carî ava be.

Ji Hundir Ve Zanîngehên Qedîm Medreseyên Kurdistanê

Merdan NEWAYÎ

Ez dibêjim hebûm 5-6 salî. Em çûbûn newala Hejîroka Vîyalî beravê. Ji Hejîroka Wîyalî dengê erbane, stran û dîlokan dihat, carina jî borebor û hayhoya dengê mêran li derdorê olan dida...Tu nabêji feqî ne, hatine geştê. Rojeke havînê, nîvroyeke dereng e. Zikê min ji birçîna diêşê, gazin û nûzenûza min her diçe zêde dike. Dayika min ez bi tehn û niçan qayil kirim da ku herim ba feqiyan da gezek xwarin bidin min. Werhasil min qesta xwarinê kir ez ber bi feqiyan ve bi rê ketim. Li şêrgehehê wan sekinim wekî ku ji xwe re dileyizim tevgeriyam. Feqiyeke ban min kir, bi bazdan çûm. Weke xwarinê bide cewrikekî di derxûnê beroşekê de ji min re savar ro kir. Got; “siûda te tune, goşt nemaye.” Nebêje savar, hema bibêje hefterz, li ber ava goşt çekiribûn. Bêhenek ji birçîna bû û an ji zarokatî bû nizamim, min di imrê xwe de hê ji xwarineke welê xweş nexwariye.

Piştî 13-14 saliya min, dema bavê min xwest ji bo feqîtiyê min ji Cimzerqa Misircê bişîne Boşata Farqînê, min bê teredud qebûl kir, tesîra wê savara zer a filfilî ya li ser wî derxûnê bitenî, ne hindik bû. Lê piştî ku ez ketim nava feqiyan dayê rebenê; ê ku nedîtiye nikare qiset bike, min ya bavê xwe bi çavên xwe dît.

Îcar em werin mijara xwe; zanîngehên qedîm, medreseyên Kurdistanê. Heta ji min were ez ê ji hêla hindur ve medreseyan bi we xwînerên hêja bidim naskirinê. Her weha dê tesîra wan a li ser zimanê kurdî jixweber were fêmkirin. Ez dibêjim em beş bi beş pêve herin dê çêtir be. Helbet tiştên di vê gotarê de em ê binin zimên, tiştên kêr zêde ên ku li medreseyên bakurê Kurdistanê pêk dihatin in, nexwe li hinek medreseyan rêbaz û prensîbên xweser jî hebûn.

Rojeke ji Rêzê ya Medrese (hicre) yê

Meleyê ku feqeyên wî hebûn wan ji ber seyda ve bang didan. Piştî banga sibehê bi îqaza Mîrê hicrê feqî radibûn nimêjê. Roj tune bû ku feqiyeke an du feqî ihtîlam (hewceyê

serşûştinê) nebûna. Nexasim zivistana sar û seqemî, pirî caran rebenên Xwedê mecbûr bûn ku bi ava sar cinoba xwe ji şitiwê xwe derxînin. Feqiyan ku hê nû balix dibûn bi rojan dibûn mijara qerf û henekên hevalên xwe. Carinan jî bi guman li wan nûezepan dinihêrtin, digotin belkî ji bo îşqat û zekatê wergirin wisa tevdigerin. Ji ber ku zekat û îşqatê nedidan feqiyan balixnebuyî.

Piştî nimêja sibehê razan qedexa bû, diviyabû feqiyan metnên xwe bixwendana. Ev xwendina metnan tişteki xerib bû. Feqiyan giş di nava mizgeftê de an di hewşa mizgeftê de bi dengekî bilind mîna orkestrayeke pirdengî metin dixwendin, digel vê yekê konsantra kesî xera nedibû. Piştî demkurtkekê ji bilî dengê xwe mirov dengê kesî nedibihîst.

Bi hizir piştî ku roj du saet dişikest îcar feqiyan netalib, ên pirtûkên wan li binê pirtûka bi navê Mele Camî diçûn ratiban. Piştî xwarina taştêyê Seyda rûdinişt pêşî dersa feqiyan talib dida. Feqiyan talib ên ku êdî li ber navê wan jî nasnavê mele hebû dersa feqiyan din didan. Li gorî hejmara feqiyan ev kar heta ber esirkî didomand. Di wê navê de nimêja nîvro dihat kirin û tayinên nîvroyê dihatin anîn. Piraniya van tayinan pêxwarinên hişk bûn. Navbera nîvro û esirê wekî bêhnvedan û pêkanîna kar û barên şexsî dihat bikaranîn. Ji esirê heta ber mexrebê metin dihatin jiberkirin û dubarekirin. Ratibên êvarê. Piştî nimêja mexrebê hema bibêje heta saetek du saet piştî e'şayê cardin metin dihatin xwendin û berî razanê mitale dihat kirin. Mitale, xwendina bédeng a bi serê xwe, bi awayekî hûrbînî û hûrponijîni ya pirtûkan e. Û razan...

Ratib (tayîn):

Ratib, xwarina feqiyan. Feqî rojê sê caran diçûn nav malên gundiyan ji xwe re xwarin dianîn. Ji bo neheqî li hin feqiyan nebe her du sê mehan carekê ji nû ve peşk davêtin ka dê kîjan feqî biçe kîjan malê ratibê bîne. Feqiyan ku mala xwe dewrî hevalê xwe dikir,

agahdariya derbarê kûçik û keçikên malê jî dida hevalê xwe. Berî feqî herin ratiban bi deh pazdeh deqeyan coş û telaşek bi wan diket. Cil û bergên xwe yên xweşik li xwe dikirin, xwe ditiftifandin, por û temberîka xwe şeh û şahîk dikirin hê nû diçûn ratiban. Anîna ratiban hostahiyeke taybet dixwest. Rijandina ratibê di nava feqîyan de wekî bêrûmetî dihat dîtin. Feqîyên ku dibûn pisporê karê xwe dikaribûn du ratiban jî bi hev re bianîna. Meseleyên her feqîyî yên ratiban hemin hene. Ê min jî gelek in, yekê jî we re vebejim:

Salên destpêka feqîtiya min bûn. Ez li Salika, gundekî Farqînê feqî bûm. Maleke dûr a ratib dida hebû. Digel ku mal dûr bû û li ser rîya wê malê seh hebûn jî, ji ber ku wê malê ji dêvla xwarinê ve hema bêje her roj seriyeke penîrê helandî yê bi qasî kulmekê dida, hevalan temahiya wî penîrî dikir, dev ji ratiba wê malê bernedidan. Dema di pêşkê de ew mal ji min re derket, wekî min çitîkê îdama xwe kişandibe li min mêze kirin, min hingê nekîr tiştêk, min got qey pariyek dûr e, ew çend. Birawo gava çûme wê malê nebêje taxa jorî, bêje gundê cîran ê jorî. Wê rojê hete vegeriyam hicrê, min nanê xwe yê sax wekî ruşwet û sedeqe di ber serê xwe de da seh û kûçikan. Na weha çenedibû diviyabû ez ji wî ezabî bifilitiyama. Ji malê vir ve nepenîyeke ku lodeke kayê li wir bû hebû. Roja din ez gihîştîm wê nepenîyê, li pişt lodê şeytanê min di hewara min de hat, ne bi dizî eşkere di guhê min got; “ma nava te û tope çawan e?” wele min seriyeke penîr bi hewa ve avêt û heta Xwedê qewet da min, min pehînekê li topa helandî xist. Man ez û nanê xwe yê kilor. Hê tirs û kêfxweşiya dilê min sar nebûbû îcarê min dît ku seyên me tîn, vîcarê ne ew çend dişwar bûn –te diye bertil kevîran nerm dike-nîv dostaniyek çêbûbû, min jî bertil anî nîvî. Roja din û roja din û roja din... gotin feqe filankes ka penîrê helandî? Min got, qey penîrê camêra xelas bûye heyran. Werhasil, min xwe û hevalên xwe ji wê kefaretê filitand...Heta roja em çûn malekê mewlûdê. Kebaniya malê li ber Seyda û hemû hevalan da riwê min, got; “kuro feqî Xwedê hebîni te çima wî penîrê heyf dida ber pehînan!” Tu nabêji jinîkê rojekê ez dîtîme û wan rojên din hatiye notirvanî li min kiriye. Encam? Encam, wekî ceza hevalan ez sê caran li ser hev li derveyî pişkê hiştîm.

Tê sotin lê nayê gotin. De werin hûn 17-18 salî ne. Teyfîka şorba kartolan a germ li ser destê we ye. Ji bo destê we neşewite, we nanê kilor xistiye binê teyfîkê. Dinya şilî ye. Baran weke ku ji devê cêr birîje dibare. Pêşkên baranê mîna kevîrên ehabîlan li nava teyfîkê

dixin, pejaqên sorbeya şîrgermî jî bi ser ser û çavê we dike. Jin û keçên gundiyan jî di ber şibake û deriyan de li we temaşê dikin, hûn ê bikevin nava derûniyeke çawa? Ez li ser navê xwe dibêjim min tu carî nehezimand, jixwe lewma min tiştêk ji feqîtiya xwe fêm nekîr.

Behs hinek belav bû ne wisa? De biborin heyran! Piştî ku her kesî ratiba xwe dianî îcar dora xwarinê bû. Usûla xwarin xwarinê jî hebû. Feqî bi awayekî siruştî dibûn kilor. Her carê teyfîkek xwarin datanîn navkoyê û heta xilas bibûya dixwarin. Xwarinê bi xwarinên ne gelek xweş dest pê dikir, ên xweş dihiştin dawiyê. Ku xwarin xweş bûya usûleke din diketê dewrê; bi dor xwarin dixwarin, ango heta tevekê feqîyan kevçiyê xwe lê nexista te nikaribû careke din gepa xwe lê bixî. Hejmara feqîyan çiqas zêde bûya bila zêde bûya berî mirov gepa xwe naqurtanda dor digihîşte mirov. Beredayî ev debûmesele nehatiye gotin; “heft feqîyan bi dorê xwarin xwarine, sofîyek di nav wan de fetisiye.” Çiqas dor hatiye di dora xwe de nebihuriye, sofîyê min û we fetisiye. Ha ku roja êvara îne bûya hew ku dît yekî kevçiyê xwe li yê we da bi hewa ve firand, heta mirov kevçiyê xwe dişûşt dianî xwarina xweş diqediya.

Dersdan

Pergala dersdanê ya medreseyên Kurdistanê pergaleke wisa bû ku îro jî ji aliyê zanyar û pisporên perwerdehiyê ve tê ecibandin. Dersdan yekeyek di navbera seyda û şagirtî de rû bi rû bi awayekî aktif pêk dihat. Feqîyên dixwestin guhdariya dersê bikin li kêleka şagirtî wekî wî ew jî li ser çokan rûdiniştin, bêdeng guhdarî dikirin. Tenê yê ku ders werdigirt dikaribû pirsên xwe ji seyda bikira. Feqîyê ku darsa xwe werdigirt diçû bi bi çend feqîyên din re darsa xwe muzakere dikir da ku baş bi serê wî bikeve.

Dersdayîn bi kurdî bû lê tevekê tabîr û têgeh bi erebî bûn. Ji kirdeyê re fai’l, ji bireserê re mefu’l, ji lêkerê re fê’l, ji hokerê re zerf, ji cînavkan re zemîr, ji tîpan re herf, ji rawekê re îzafê, ji gerguhêzî re muteeddî...û hwd dihat gotin. Lêbelê mêji û mentiqê axaftinê îla bi kurdî bû. Bêje û têgeh wekî ku kurdî bûn dihatin kesandin û kişandin. Mînak; ji dêvla bigotina ‘babu’l-fê’lî’ digotin ‘babên fê’lê’, ji dêvla bigotina ‘hurufu’l-cerr’ digotin ‘herfên cerrê’, digotin; ‘fê’la mazi’, ‘elîflama ta’rifê’, ‘halê weslê’...Ev yek ne tenê di tabîrên rêzîmanî de dibûn. Her weha tabîrên mustehcen jî bi erebiya wan dihatin bilêvkirin, wekî; ‘ferc’, ‘zeker’, ‘cîma’, ‘heyz’, ‘dixûl’, û hwd.

Usûl û uslûba xîtabê jî hebû. Tu carî feqîyan bêtî ku nasnavê hev diyar bikirana navên hev hilnedidan. Wekî Feqe Mihemed, Seyda, Mele Elî û hwd. Di xîtabkirina seydayê mezin de tişteki balkêş dicirîya. Dema mirov bi seyda re diaxifi çênedibû mirov navê wî hilde û wekî kesê duyemîn xîtabî wî bikira, diviyabû mirov wekî ku ew kesê sêyemîn e behsa wî bikira. Ez bibêjim tu bi seydayê xwe re mijûl dibî, dixwazî tişteki bîni bira wî dibêji; “seyda weha gotibû” digel ku tu pê re dişexilî jî ji bo rêz û hurmetê nabêji “te weha gotibû”.

Ev termînolojîya hanê rê li ber danûsitandina ehlê medreseyan û ewamê digirt. Jixwe feqîyan bi vî awayê axaftinê dixwestin ku xwe jî gundî û “cahilan” veqetînin.

Roja Betlaneyê

Li medreseyan jî hefteyê rojek betlane bû. Ew roj jî roja îne bû. Ji ber ku li gorî Îslamê roj jî esirê dest pê dike, betlaneyê jî ji esira êvara îne heta esra êvara şemiyê dewam dikir.

Di rojên betlaneyan de feqîyan bêhtir ihtiyaciyan xwe yê şexsî dianîn cih. Ser û cilên xwe dişûştin. Kitêbên xwe cizûbend dikirin. Diçûn serdana malbata xwe û hwd. Her weha li gorî demsalan diçûn geşt û seyrane kêfa xwe dikirin...

Feqî çiqas di nav şert û mercên giran de bûna jî dev jî kêf û sefaya xwe bernedidan. Govend digerandin, bêlîte digirtin, enwa'ê çêşidan lêstik dileyistin. Birastî lêstikên merdreseyan hejari lokolîneke cidî ne. Bi dehan lêstik dihatin lêstin. Hinek lêstik li derve hinek jî li hundir dihatin lêstin. Lêstikên li çolê dihatin lêstin bi piranî ev bûn; birê, kêlê, tefşê, sêgavê, kevirê qewetê û hwd. Lêstikên li hundir dihatin lêstin jî yê derve zêdetir bûn; wezîr û kizîr, şah û xurab, gustîlk, mamê mûs, teyrê bincilik, vînvîn, xefxef, şerê hespan, şerê kîsoyan, tîr û kevan û hwd. Ev lêstikên ku li nava hicreyê dihatin lêstin guhertoyên wan hebûn, dema feqî bi gundiyan re dilêstin fen li wan dikirin.

Êvarên înan pirî caran gundî jî dihatin serdana feqîyan jî wan re pêxwarin dianîn. Gûz, xarûz, bastêq, mewjî...êdî li gorî herêman ev fêkî û xwarînek île bi peşke

dihatin parvekirin... Di pey re radibûn bêlîte digirtin, qesîde û beyt dixwendin....


Encamname:

Hêj li Bakurê Kurdistanê hinek medrese mane. Ji van medreseyan hindik jî wan êdî wekî berê diçin ratiban û cilên xwe bi gundiyan didin şûştin. Jixwe ne qedr û qîmeta feqîyan wekî berê maye, ne jî feqî wekî berê hay jî rêbaz û prensîbên medreseyê dimînin. Ev yek serdema dawî ya rêwîtiya ber bi mirinê ve ya xwendina erebî û medreseyan e. Ev pêvajoya kambax hê bêtî avakirina Komara Tirkîyeyê dest pê kiribû. Di dema Osmanîyan de medreseyên Kurdistanê erka zanîngehan dianîn cih. Di wan de ne tenê serf û nehû (rêzîman û rastnivîs) digel wan tefsîr, hedîs, fiqih, kelam, felsefe, tesewuf, mentik, cebir, hendese, fesahet, belaxet, tib, felekiyat û hwd. Dihatin xwendin. Lewma jî kesên jî medreseyan îcazet wergirtin re digotin meleyê heft/diwazdeh îlmî.

Piştî avakirina Komarê bi derxistina Zagona Têdrîsata Yekgirtî re hê nû piştî medreseyan (dûr jî van deran) şikest. Medrese hatin qedexekirin. Li şûna wan, lîseyên Îmam Xetîbiyê yê ku heta salên heştêyî gel zêde eleqedarî rê wan nedida hatin vekirin. Medrese îlegalîze bûn. Îcazetnameyên feqîyan ên ked û berdêla 15-20 salan hatin ser pênc peran. Meleyên ku nîşaneyê rûmetê bûn ketin ber minet, tehn û niçên axa û gundiyan cahil, mecbûrî zekat û sedeqeyê bûn. Piştî demekê ew jî ji dest çû. Ew seydayên delal ên ku êdî ne jî dîn, ne jî jî dinyayê re dibûn li ereseya meydanê heyirî man. Vêga jî nîfşek jî wan delalan vir de wir de dilewlibin, bi aweyek jî awayan seydatiya wan bûye bela serê wan!

Heyhat, hê sed sal berê Bediuzzaman Seîdê Kurdî ev rewşa sotîner ditibû, xwestibû çareser bike. Çare jî vekirina Medresetu'z-zehrayê û şaxên wê bû. Di vê Medreseyê de kurdî jî di nav de dê bi sê zimanan ders bihata dayîn; erebî, tirkî û kurdî. Mamoste û dersdarên vê medreseyê jî dê ev meleyên medreseyan bûna... Sed heyf û xebînet e ku îroj jî piraniya wan seydayên heja bi hejarî û rebenî debara xwe dikin. Zarokên me jî jî kurdî û oldarî mehrûm mezin dibin.

mnewayî@hotmail.com



Medreseya Kurdî

Zeynelabidîn ZINAR

Ji sedsalan ve ye ku saziyek bi navê Medreseya Kurdî li Kurdistanê, xasma li bakurê wê hebûye û xwe di radeya yekemîn de kiriye devera perwerdekirina kurdan. Lê belê ew sazî di dawiya salên şestî (1960) de winda bû, yan jî daket radeya tunebûnê. Gelo ew sazî çi tişt bû, çi dikirin û tê de awayê xwendinê bi çi awayî dihate domandin?

Ev babet, babeteke pir fireh e û bersiva van pirsina jî, ne hêsan e. Lê em ê hewl bidin ku vê meseleyê, bi awayekî kurt bidin zanîn.

Bêguman encam û serpêhatiya medreseya kurdî ta niha jî bi zelalî pêşkêşî raya giştî nebûye. Niha pir kêr agahdariya zanayên kurd li ser medreseyê heye û bi awayekî vekirî derbareya wê nizanin.

Saziya medreseya kurdî, ji sedsala yazdehan ve ye ku li gelek herêmên Kurdistanê hebûye û di wan de bi sedhezaran, bi milyonan kes xwendine. Ji zarokên kurdan zêdetir gelek tirk, ereb û faris jî hebûne ku di medreseya kurdî de xwendine.

Hin ji wan medreseyan pirî ku menşûr bûbûn, bi hêsanî navên xwe di rûpelên mejûyê de jî bi cih kirine. Wek Medreseya Sitrabasê (Diyarbakir), Medreseya Sor (Cizîra Botan), Medreseya Bazîdê, Medreseya Şemzînanê, Medreseyên Bedlisê wek Îxlasiye, Katîbiye, Şukriye, Şerîfiye û Şemsiyeyê. Medreseya Hîzanê, Medreseya Miksê, Medreseya Bêdarê, Medreseya Findîka Botan, Medreseya Aqtepeyê, Medreseya Norşînê, Medreseya Oxînê, Medreseya Qerekoyê, Medreseya Farqînê, Medreseya Hawêlê, Medreseya Sêrtê, Medreseya Heskîfê, Medreseya Amêdiyê, Medreseya Paloyê û bi sedan medreseyên wisa yên din...

Di wan medreseyan de jî xwendina bi zimanê kurdî û erebî û hinek jî zimanê farisî zêdetir, felsefeya Yûnanî jî tê de dihate xwendin. Her weha ew, devera bicihanîna tore û rêveçûna kurdayetiyê jî bûne. Di wan de wergirtin û edetên kurdewariyê dihatin bikaranîn û şexsiyeta nijadî her tim dihate parastin.

Lê piştî 1925'an, dewletê bi navê "Tevhidî Tedrîsat" medreseyên kurdî girtin. Yekemîn sedema girtina medreseyên kurdî ev bû;

asîmîlekîrîna kurdan û qutkirîna kurdan ji her tiştên wan ên kevn, xasma bêxeberhiştina kurdan ji pêşîya wan. Jixwe armanca yekemîn a Mîstefa Kemêl bi derxistina qanûna "Kîlik-kiyafet"ê jî ev bû, da kurd dest ji wergirtina xwe ya milî berdin û kincên kurdî wernegirin.

Kurdistan cara pêşîn jixwe di 1639'an de hatiye dabeşkirin. Lê ji wê demê hetanî 1923'an tu carê ne farisan, ne jî osmanîyan, kurd û Kurdistan înkâr û mandela nekirine û bi qanûnên taybet asîmîlekîrîna kurdan nekirine armanç. Lê piştî 1923'an ku bakurê Kurdistanê bû para Tirkîyeyê, îcar karbidestên Dewleta Tirk li pêşberî dirokê her cure xirabî kirin û heta niha jî her didomînin.

Ji medreseyên Kurdistanê pir kesên mezin derketine ku di nava gelê xwe de, hem jî li Rojhilata Navîn û li gelek welatên dinyayê, xasma jî li cihana îslamî navûdeng dane û di pişeya xwe de pir menşûr bûne. Ew şexsiyet, çi di warê olî û rêçikan (terîqet) de be, çi di warê siyasî û serokatîya serhildanên kurdî de be û çi jî di warê zanistî, wêje û helbestvanîyê de be karên pir heja kirine. Wek nimûne, ez navên çend ji wan kesan li vir tinim bîra xwendevanan:

a) Hin ji wan kesên menşûr ên di warê olî, rêçik, wêje û helbestvanîyê de ku ji medreseyên Kurdistanê rabûne:

- Mewlana Xalîdê Kurdî (1773-1826), hîmdarê duyemîn ê Rêçîka Nexşebendî bûye. Şêx Elî Herîrî (1010-1078-9). Mele Ehmed Huseyn Bateyî (1417-1491). Şêx Mele Ehmed Cizîrî (1570-1640). Feqîyê (Mihemed) Teyran (1590-1660). Feqe Reşîdê Hekarî. Şerîfxanê Colemanî (1693- 1748). Selîm Silêman (Sedsala 16-17). Mele Xelîlê Sêrtî (1753-1843). Xarîs Bedlisî (1758-?). Elî Teremaxî (Sedsala 4'an, hicrî). Mele Ünîs Erqetênî (1785-?). Pertew Begê Hekarî (?.. -1806). Siyapoş, Macin, Mîna Sadiq, Bekir Begê Erzî, Mensûr Girgaşî, Şêx Evdîrehmanê Aqtepî (1850-1910). Mele Eliyê Findîkî. Xelîfe Üsiv. Şêx Diyaedîn (Navdarê bi Hezretê Norşînî). Mele Mihemed Emîn Heyderî. Mele Mihemedê Liceyî. Mele Ehmedê Xasî. Mele Evdîlmedcîd. Mele Necmedîn Tengezarî. Mele Mûsayê Mizî,

Mele Hiseynê Kiçik ê Farqînî, Mele Ubeydulahê Heyderî û bi hezaran yên wisa...

b) Hin kesên di warê siyasî û serokatiya serhildanên kurdî de ku ji medreseyan rabûne:

- Şêx Ubeydulahê Nehrî (1880). Şêx Ebdulqadirê Nehrî (1908). Seyîd Tahayê Nehrî. Şêx Seidê Piranî. Şêx Şerîf. Şêx Şemsedîn. Mele Hesên. Şêx Selimê Hizanî. Seyîd (şêx) Elî. Şêx Şehabedîn. Şêx Mihemed Îsayê Cibrî. Mele Hesên Hîşyar û bi dehan yên wisa...

c) Hin kesên di warê olî, wêje, helbestvanî û nijadperwerî de ku ji medreseyan rabûne:

- Ehmedê Xanî (1651-1707). Mele Mehmûdê Bazîdî (1797- ?..). Mûrad Xanê Bazîdî (1772-1832). Mele Seidê Kurdî (Norsî) û bi sedan kesên wisa...

Her çiqasî bi rûxandina serhildanên neteweya kurd re, ji 1925'an hetanî 1938'an, medreseyan ji gelek rind para xwe ji hovîtî û xwînxwariya Komara Tirk hildane, lê pişt re dem pir neçûye dewletê dîsa xwestiye ku wan medreseyan veke û têxe binê baskên xwe, bi wan dijîtî li pêşberê kurdê azadixwaz bike. Çendî ku vekirina wan medreseyan li gor qanûna heyî qedexe bûye jî, lê dewleta Tirk hin bi hin fersend daye ku vebin. Piştî 1939-40'an li hin deveran vebûn û dest bi jiyane kirin. Lê belê weke caran dîsa ji her tişt bi tersê daxwaza dewleta Tirk hatiye domandin. Ew medrese di salên şêstî de ji ber dek û dolabên dewletê, hem ji ber tengasiya rewşa demê, hinek jî ji ber rewşa nûjen a mercên dinyayê, hinbihin teqla xwe sist kirine û di salên heftêyî de ketine nava pêlên deryaya dirokê û tê de nixro bûne.


Îro gelek xwendayên kurd ên nû hene ku zêde agahdariya wan bi rewşa wan medreseyan nîn e ka çewa bûne, xwendina

wan bi çi awayî hatîye meşandin û ev nehse, hezar sal in wê saziyê bi çi rengî xwe îdare kiriye. Her weha pir kes hene ku meraqeke zêde ji dîkin û dixwazin ku bizanibin ka ew medrese çi bûne, çi dikirin û çawa lipikîne. Hin kes jî hene ku

dixwazin li ser wan medreseyan lêkolînê bikin, rewşa xwendina di wan de derxînin holê û bi raya giştî bidin zanîn. Lê ji ber nebûn an kêmbûna agahdariyên li ser wê yekê, karê wan hin bêtir dijwar û zehmet bûye.

Ev yek ji êşkere ye, heta niha tu kesî yan sazgeh û rêxistineke kurdî hewl nedaye ku li ser medreseyan lêkolînê bike û rewşa wê xwendina kevnare bi nîfşên nû bide zanîn. Bêguman çi kesê yan çi civata ku serpêhatiya xwe ya bihurî nizanibe û paşeroja xwe neyneye ber çavan, ew nikare pêşeroja xwe ji sererast bike.

Ev yek jî hîn êşkeretir e ku çavkaniya welatparêziya kurdî, her weha piraniya serok û berpirsyarên serhildanên kurdî, çi şêx, çi seyîd û çi jî mele bûne, ji wan medreseyan derketine û vê doza piroz bi dest û dîtînen paqîj her parastine û nîfş bi nîfş anîne, ta ku gihandine dema îro û xistine destên



babeta wê bizanibin. Lê mixabin heta niha ji lêkolîner û kurdologan kesî zêde hewl nedaye xwe û lêkolîn li serê nekiriye. Her çiqasî li ser wê babetê ger hinek tişt hatibin nivîsandin jî, piraniya wan bi kêmasî, bi çewtî û bi awayê sehkirina ji devan çêbûye.

Yan jî der heqên medreseya kurdî de li ser şopa hin baweriyên cuda û bi dîtînine çewt hatiye nivîsandin û ew bi paşverûti nirxandine. Îcar ji ber hindê min pêwistiya nivîsandina pirtûkeke bi navê Xwendina Medresê dîtiye û ew tiştên ku min bi çavên xwe dîtine angoyazdeh sal jiyana min tê de bihuriye, nivîsine û di (.....) de wek pirtûk çap kirine.

Demekurtek piştî derketina Xwendina Medresê, bala pir kesan kete ser medreseya kurdî û lêpirsin ji aliyê pir kesan ve lê hate kirin. Ev pirtûk li Zanîngeha Sorbonê (Paris) û li yeke Londonê jî wek berhema dersê jî bo xwendevanên inglîz û frensî hatiye bikaranîn. Di 1998'an de jî li Parîsê enstîtuyeke navnetewî (.....) kurtiya wê pirtûkê hem bi zimanê inglîzî û hem jî bi zimanê frensî

nivîsiye û xistiye nava pirtûkeke 400 rûpelî, bi navê Îslam des Kurdes weşandiye. Her weha wêneyê bergê pirtûka Xwendina Medresê jî li ser bergê Îslam des Kurdesê xistine. Piştî vê yekê, pirtûka min Xwendina Medresê û medreseya kurdî hej zêdetir bala saziyên çandî yên Ewropî kişandine ser xwe.

Ew medreseyan kevnare ji sed-salan ve ye ku li Kurdistanê hebûne û ji wan pir kesên zana, rewşenbîr derketine ku hejaye pesn û serbilindiya neteweya kurd in. Lewre bi kar û xebata wan Herîriyan, Cizîriyan, Bateyîyan, Teyraniyan, Xaniyan û hwd. bi sed-salan e ku zimanê kurdî xwe bi reşbelekian ve rûqalî meşandin û rewneqa xwe pêşkêşî mirovatiya dinyayê kiriye, heta niha jî her bi wê ye ku dike.

rewşenbîr û siyasetmedarên nûjen ên dewra vê cihana medenî. Erê her çendî ku ez dibêjim şêx, mele û seyîd, lê gelek axe, beg, mîr û maqûlên kurd jî hebûn ku xwe ji wê şerefa giranbiha bêpar nehiştine û berpirsariya xwe ya diroki bi cih anîne.

Bêguman, çawa ku her welatek an her neteweyek li gorî tore, edet û rewşa xwe di demên bihuri de dixwendin û ku niha jî her wisa dixwînin, bi zimanê xwe dinivîsin û dipeyivin, berê li Kurdistanê jî perwerde û xwendin her wisan dihate domandin. Lê ew xwendin ne xwerû bi zimanê kurdî, lê bi kurdî û erebî dibû. Di ber de hindik farisî jî dihate xwendin. Ew xwendin bi sedsalan jî her wisan hatiye domandin...

Lê mixabin niha ew rewş pir guheriye û ne mîna berê dimeşe. Ji ber ku Kurdistan di 1923'yan de li çar, pênc welatan hatiye

dabeşkirin û di çaryeka sisêyan a sed sala bîstî de ji xasma ku serdestan giraniyeke zêde daxistine holê ku rojek berî rojekê zû kurdan asîmîle bikin, wan jî tore, ji zimên û binyata wan a kevn dîr bixînin, her cure xirabî kirine, dikin û niha metodên nûjentir bi serê wan ve tinin. Her çi be jî dîsa kurd, ji ber ku xwediyê çandeke dewlemend in û li pêşberî zimanên biyanî pir bi rik û hişk in tu carî dev ji zimanê xwe bernedane, toreya bav û kalên xwe neterikandine, timî li heyinên xwe yên diroki xwedî derketin û derdikevin.

Belam piştî pejirandina ola îslamê ta bi çaryeka sisêyan a sed sala bîstî jî, kurdan her giraniya xwe dabû ser xwendina olî û di medreseyan xwe de bi piranî zarokên xwe bi nivîs û zimanê erebî didane xwendin. Lê ew xwendina Quranê, ya Serf û Nehwê, ya Şerî'et, Hedîs, Mentiq, Felsefe, Cebir û hwd.

BERNAME Û MUFREDATA MEDRESEYÊN KURDÎ

Ji destpêka xwendina medreseyê heta ku dawî li xwendinê tê, weha ye:

- Destpêka Xwendina Zarokan.
- Destpêka Feqîtiyê.
- Xwendina Medreseyê
- Disiplîna Xwendinê.
- Rojên Bihnevadanê.
- Geştê Feqîyan.
- Welatparêziya Medreseyê.
- Wergirtina Îcazeyê Xwendinê.
- Kirina Meletiyê û Dersdan.
- Meleyên Heftilmî.
- Meleyên Duwazdehilmî.

Pirtûkên ku di medreseyan de dihatin xwendin:

Xwedina ku li medreseyan dihate kirin, bi tîpên erebî dibû. Ji sed pirtûkî zêdetir dihatin xwendin. Her weha piraniya wan pirtûkên ku dihatin xwendin jî, yên bi zimanê erebî bûn. Weke yên Serf û Nehwa erebî, yên şerîet, Mentiq, Îstî'are, Mûnazeret, Usûl, Eqîde, Hedîs û Tefsîrên Qurana pîroz... Îcar em ê li vir ji destpêka Elîfbêtika erebî û navên pirtûkên di Xwendina Rêzê de heta dawiyê, li gorî rêza li dû hev 89 pirtûk ev in:

1- ELİFBÊTIK

2- **QURAN**: Ji misilmanan re pirtûka asîmanî ya herî pîroz e û xwerû bi zimanê erebî (bi devoka Qureysî) ye. Di vê pirtûka pîroz de 114 sûret û 6233 ayet hene û li 30 pişkî hatiye parvekirin. Ji her pişkekê re 'cuz' tê gotin. Di her cûzekê de jî çar beş (hîzb) hene.

3- MEWLÛDA KURMANCÎ:

Piştî kutakirina Quranê, Mewlûda Kurmancî tê xwendin.

Mewlûda Kurmancî bi naveroka xwe mîna romanekê ye ku Melayê Bateyî tê de hin bûyerên diroki li gorî felsefeya îslamê anîne zimên. (Binihêr li çapa latîni: www.pencinar.se)

4- NÛBIHAR (NÛBAR):

Ferhengoka mamosteyê nemir a Ehmedê Xanî ye (1651-1707) ku bi helbestî, hem ji bi kîte û qafiye, bêjeyên erebî û kurdî bi xeysetê ferhengokê nivîsîne. Xanî çawa ku wî bi xwe di paşîya Nûbarê de gotiye, di 11'ê adara 1094'an (1683) de nivîsiye. (Binihêr li çapa latîni: www.pencinar.se)

5- NEHC-UL ENAM: Bi

naveroka xwe baweriya (Eqîde) ola îslamê ye. (Binihêr li çapa latîni: www.pencinar.se)

6- EQÎDEYA EHMEDE XANÎ:

Çawa ku ji navê wê jî tê zanîn ev berhem, baweriya ola îslamê ye ku mamosteyê nemir Ehmedê Xanî ew bi helbestî û bi zaravayê kurmançî nivîsiye. Tê de 73 malik hene, hemû bi kêş û qafiye û bi yazdeh kîteyan dikişin. (Binihêr li çapa latîni: www.pencinar.se)

7- XAYET-UL ÎQTISSAR.

8- **İBNÛ QASIM**: Nivîskarê wê İbnû Qasim kurd bûye.

9- **BACÛRÎ**: Nivîskarê wê İbrahîm Bacûrî kurd bûye.

10- **TESRİFA KURMANCÎ**: Ev pirtûka li ser serfa (kişandina lêkeran) erebî ji aliyê Mele Elî ve hatiye nivîsandin. Kesê ku vê pirtûkê dixwîne, hemûyî jiber dike.

11- **EMSİLE**: Pirtûk bi zimanê erebî ye û li ser serfa erebî hatiye nivîsandin.

12- **İZZÎ**: Pirtûk bi zimanê erebî û li ser serfa erebî hatiye nivîsandin.

13- **EWAMILA CURCANÎ**: Ev pirtûk bi naveroka xwe nehwa (gramatik) e û bi zimanê erebî hatiye nivîsandin. Navê nivîskarê wê, Ebdulqadirê kurê Ebdurehmanê Curcanî (13) ye.

14- **ZURÛF (AMAN)**: Ev pirtûka bi zaravayê kurmançî, li ser nehwa erebî ji aliyê Mele Ünîsê Erqetênî ve hatiye nivîsandin.

15- **TERKÎB**: Ev pirtûka bi zaravayê kurmançî, li ser nehwa erebî ji aliyê Mele Ünîsê Erqetênî ve hatiye nivîsandin.

16- **SE'DULLAHA SEXÎR**: Ev pirtûka xwerû bi zimanê erebî, şerha E'wamila Curcanî ye, ku nehwa erebî bi awayekî firetir dide nasandin. Çawa ku ji navê wê jî tê zanîn, nivîskarê wê Se'dullah Sexîr (Piçûk) e.

17- **ŞERH-IL MUXNÎ**: Ev pirtûka nehwa erebî xwerû bi zimanê erebî hatiye nivîsandin.

18- **S'EDİNÎ**: Ev pirtûka serfa erebî xwerû bi zimanê erebî hatiye nivîsandin. Her weha ew şerha pirtûka İzzî ye. Nivîskarê wê Se'dê Tevdezanî ye. Tê gotin ku ew kurd bûye.

19- **HELL**: Pirtûk bi naveroka xwe nehwa erebî ye û bi erebiyeke pir hişk hatiye nivîsandin.

20- S'EDULLAHA GEWRA:

Pirtûk bi naveroka xwe nehwa erebî ye û bi zimanê erebî, ji aliyê S'edullah Gewre (kurd) ve hatiye nivîsandin.

21- **NETAIC-UL EFKAR**: Felsefeya Grekî ye.

22- SIYÛTÎ.

Her çiqasî ku bi zimanê erebî dihatin kirin, lê dersdaran ew tev wergerandine zimanê kurdî û dersa şagirdên xwe didan. Her weha çend pirtûkên ku xwerû bi zimanê kurdî -zaravayê kurmancî- ne ji bi dersîti didane xwendin.

Tiştêkî din ku zêdetir bala mirov dikişîne ji ev e ku nivîskarên piraniya wan pirtûkên bi zimanê erebî yên ku di medreseyan kurdî de dihatin xwendin, kurd bûne. Ev rastî ji êşkere ye ku hewesa mele û feqiyên kurd, zêde ji pirtûkên ku nivîskarên wan ereb in re çênedibû.

Yek ji sedem û mercên yekemîn ku zimanê kurdî di rewşên hew qas zehmet de bi serbilindî heta niha ji ku xwe li pêşberî asimilasyona biyaniyan parastîye, bêguman ew medreseya kurdî bûye. Lewre di her dem û çaxan de zimanê kurdî her hebûna xwe bi

serfirazî daye nîşandan û ji nijadiyê zêdetir xwe kiriye zimanê ola neteweya kurd.

Ez bi vê nivîsa xwe, her çiqas bi kurtî û kêmasî ye jî, rewşa xwendina medreseya kurdî bi xwendevanên nûjen bidim zanîn û wan hinekî ji wê sazîyê agahdar dikim. Ez ê li vir, ji destpêka xwendinê çî meletî, feqetî û rewşa xwendinê, her weha navên pirtûkên ku di medreseyan Kurdistanê de dihatin xwendin, bi rêzê binivîsim. Ez bi hêvî me ku ev xebata min a bi kêm û kas her weha bê zanîna navên hinek nivîskarên pirtûkan û tarîxa jidayikbûn û mirina wan, dê hinek tîrêjen bi ronî bide pêşîya rawêşên, siyasetmedar, lêkolîner, kurdolog û zanîngehên ku dê li ser babeta medreseyê lêkolînê bikin. (Stockholm 12 Êlûn 2007)

pencinar@bredband.com

www.pencinar.se

23- CAMÎ.

24- **MUXNÎT`TULAB:** Mentiq e.

25- **ÎSAXÛCÎ:** Mentiq e, nivîskarê wê Mele Xelîlê Sêrtî ye.

26- **QEWLEHMED:** Mentiq e.

27- **U`SSAMA WEDD`Ê:**

Pirtûk, xwerû bi zimanê erebî ye; rewş û tertîba çekirina tiştan dide zanîn.

28- **U`SSAMA ÎSTÎ`ARÊ:**

Pirtûk xwerû bi zimanê erebî ye, rewş û tertîba çekirina tiştên ne heqîqî (mecaz) dide zanîn.

29- **ŞERHA WELÎD:** Pirtûk xwerû bi zimanê erebî ye, bi naveroka xwe munaqêşe û munazzere ye.

30- **HAŞIYA EBDULWEHAB.**

31- **HAŞIYA USSAM.**

32- **HAŞIYA EBDULHEKÎM.**

33- **ŞERHŞEMSÎ:** Mentiq e. Nivîskarê wê, Sedê Tevdezanî kurd bûye.

34- **MUXTESSER:** Felsefe ye, nivîskarê wê, Sedê Tevdezanî kurd bûye.

35- **ŞERH-UL EQAÎD:** Pirtûk xwerû bi zimanê erebî ye, rewş û rêveçûna hemû bawerîyan beyan dike û li dinyayê çiqas cure bawerî hene tev nivîsîne. Nivîskarê wê, S`edê Tevdezanî kurd bûye.

36- **CEM`IL CEWAMÎ:**

Pirtûk xwerû bi zimanê erebî ye, bi naveroka xwe l`ilmê Usûlê ye; ji destpêka xwendinê hetanî vir, pirtûkên ku bihurîn kurtîneka wan tevan aniye zimên. Tê gotin ku nivîskarê wê kurd e.

37- **SAFÎ** (lûxet).

38- **ÎMTÎHAN** (nehw).

39- **EBÛTALIB** (nehw).

40- **ÎBNÛ U`QEYL** (nehw).

41- **TESSRÎFA EREBÎ** (serf), nivîskar: Mele Elî kurd bûye.

42- **QIZILCÎ** (serf): Nivîskarê wê kurd bûye.

43- **QEREDAXÎ** (serf): Nivîskarê wê kurd bûye.

44- **DÎWANA MELEYÊ CIZÎRÎ.**

45- **MEM Û ZÎN.**

46- **RÎSALA HEMÎDIYE.**

47- **ŞERHA LUBABÊ** (nehw).

48- **SÎTÛR:** Çêbûna tiştan beyan dike. Navê wê pirtûka bi erebî, bi kurdî ye.

49- **RÎSALA WED`Ê:** Rewşa çêbûna tiştan beyan dike.

50- **RÎSALA ÎSTÎ`ARÊ:**

Mecaz û teşbihan beyan dike.

51- **SÎLEMANÊ KURDÎ:**

Şerî`et.

52- **TENWÎR-UL QULÛB:**

Tesewuf, Şêx Mihemed Emînê Hewlêrî.

53- **ÎRŞAD-UL Î`BAD:** Şerî`et, Şêx Zeynedînê kurê Ebdulezîz ê Milêbarî.

54- **FETAWA ÎBNÛ HECER:**

Şerî`et, Îbnû Hecer, heşt cild.

55- **MÎNHACUTTALIBÎN.**

56- **MUXNÎ-L MUHTAC:**

Şerî`et, çar cild, şerha Minhacê.

57- **FETH-UL MÛ`ÎN:** Şerî`et.

58- **Î`ANETUT`TALIBÎN:**

Şerî`et, çar cild.

59- **BÛCEYREMÎ:** Şerî`et, çar cild.

60- **EL TEQRÎR.**

61- **EHYA-UL U`LÛM.**

62- **ÎRŞAD-UL Î`BAD:** Şerî`et, bi zaravayê kurmancî, Xelîfe Usiv.

63- **TEFSÎRA CELALEYN.**

64- **TEFSÎRA SAWÎ:** Çar cild.

65- **TEFSÎRA CEMEL:** Pênc cild.

66- **TEFSÎRA QAZÎ**

BEYDDAWÎ: Çar cild.

67- **TEFSÎRA ÎBNÛ KESÎR:**

Çar cild.

68- **TEFSÎRA KEŞAF:**

Duwaazdeh cild.

69- TEFSÎRA MENAR:

Yazdeh cild.

70- **TEFSÎRA FEXRÊ RAZÎ.**

71- **TEFSÎRA XAZÎ.**

72- **TEFSÎRA REMEL.**

73- **TEFSÎRA MUHMELE.**

74- **DURRET-UL WAI`ZZÎN.**

75- **RIYADDÛS SALÎHÎN.**

76- **DELÎL-UL FALÎHÎN:** Heşt cild.

77- **MUSLIM.**

78- **BUXARÎ.**

79- **ÎBN-UL MUXTESSER.**

80- **TACUR RESÛL:** Pênc cild.

81- **NÎHAYET-UL BÎDAYE.**

82- **TEZKÎR-UL QURTEBÎ.**

83- **FETAWA HEDÎSIYE.**

84- **NÛR-UL EBSAR.**

85- **XERPÛTÎ:** Ev pirtûka bi zimanê erebî, bi navê kevn ê Elezîzê ye.

86- **EL QERSÎ:** Ev pirtûka bi zimanê erebî, bi navê bajarê Qersê ye.

87- **SIYERUN NEBÎ.**

88- **QISSES-UL ENBIYA.**

89- **MUHEMMED RESÛL.**

Berî ku ez bigihîjim dawiyê, ji sedî zêdetir, 89 pirtûkên ku bi rêzê nav û babeta wan hatine nivîsandin, careke din li gor dabeşkirina şaxên xwendinê weha ye: Ji Elîfbêtîka erebî hetanî dawîya Xwendina Rêzê ku piranî serf û nehwa erebî ne, jimara wan 36 e. 14 ji wan ên alîkarên dersê ne, 12 ji wan pirtûkên şerî`etê ne, 11 ên Tefsîra Quranê ne, 13 Hedîs in, 3 yên Siyerê ne û 24 ji wan klasîkên kurmancî ne. Îcar kesê ku van pirtûkan tev bixwendina, keysetê meletiyê distend û li nav xelkê jê re Meleyê Heftîlm dihatê gotin. Lê eger pir zîrek û zana bûya, jê re Meleyê Dozdeilm dihatê gotin.

Zeynelabidîn ZINAR



Medreseyên Kurdistanê

M. Reşîd IRGAT

Medrese di asoya asûmanê wêjeya kurdî de û di pêlên deryaya çand û hunerê de, cîgeheke bala û bîngeheke berz û girîng didêrin. Dîsa ev medrese di warê domandin û neberzebûna ziman, çand û wêjeya kurdî de, xwedî roleke hêja, deskeftîyeke dîrokî û peywireke neteweyî yên bêhempa ne. Lewre di hemû çerxên dîrokê de û serdemên politîqaya bişaftin û helandina ziman û wêjeya kurdî de, medreseyên Kurdistanê erk û berpirsiyariya xwe ya dîrokî bicîh anîne. Li hember van şape û lehiyên konevanî, ji bo newendabûna ziman û wêjeya kurdî, bûne çeper, asteng û bi vî awayî ziman û wêje parastine. Ji vê sedemê ye ku bi giştî girîngiya medreseyan hatiye hêjandin û pejirandin. Li çî dever û herêmên ku medrese lê hebin ziman, çand û wêje li wan deveran bicîhbûyî û geş xuya dîkin. Medrese di rasteqîniya xwe de peywira zanîngehan pêk tîne ango her medreseyek zankoyek e netewî ye. Medrese ji serdema Osmaniyan ta damezirandina komara Tirkîyeyê bi rewşeke fermî xwedî cîgeheke girîng bûn. Lê ji ber hin sedemên nijadperestî medrese êdî îro nema xwedî rol û peywir in.

Li Kurdistanê gelek medreseyên navdar hebûne û gelek kesên navdar jî ji wan medreseyan derketine û rajebeşên xwe yên olî, zanistî û netewî bicîh anîne. Beşek ji wan medreseyan medreseya Silêmaniyê, Mehabad, Sine, Cizîr, Amed, Bedlîs, Xarpêt, Wan, Çolemêrg, Mikis, Bazîd û hwd. in.

Di van medreseyan de rêzik û rêznameyên taybet ji bo jiyan û perwerdehiyê hebûn. Ev fêrgehên zanistî sed mixabin di roja me ya îroyin de êdî bes li hin herêm û deveran xuya dîkin. Dîsa di van zanîngehan de, li gorî rêznameya taybet hin rêzepirtûkên xwendin û dersdanê hebûn. Ev rêzepirtûk piştî xwendina Quranê di warê Bawremenî, Ferheng, Fiqhaolî, Serf, Nehwu, Tefsîr, Hedîs, zanista Kelamê, Mentiq, Beyan, İstia're û hwd. Dihatin xwendin û dersdan. Beşek ji van pirtûkan bi kurdî bûn mîna Mewlûda

Bateyî, Nûbihar û Namilkeya Baweriyê yên Ehmedê Xanî, Zurof û Terkîb ên Mele Yûnis û hwd. Dîsa hinek ji nivîskarên wan rêzepirtûkên erebî bi nijada xwe ya bîngehîn kurd bûn Mîna İbnuhacib, Mulla Camî, Teftezani û hewd.

Hînkari û Hîndekari di Medreseyan de

Perwerdehi di medreseyan de ango dersbêji û dersxwendin bi zimanê kurdî dihat pêkanîn û hîn ji li deverên ku medrese lê hene dersdayîn û dersgirtin bi kurdî pêk tên. Ew pirtûkên ku bi erebî bûn dihatin xwendin û bi kurdî dihatin wergerandin. Ew pirtûkên kurdî jî, ji ber ku nexwerû bûn li gorî wê demê peyvên biyanî tê de hebûn û bi tekstên wêjeyî û giran hatibûn nivîsîn, ew jî hewceyê şirovekirin û hêskirina bi kurdî bûn.

Di medreseyan de, sê radeyên xwendekariyê hene; 1) Feqî 2) Mele 3) Seyda. Feqî ango suxte an ji şagird ew bûn ku ji rêk ve dest diavêtin xwendina sereta ta cîgeheke ku êdî ji wê şûn de navê wan dibû mele. Ev cîgeh jî li gorî kevneşopiya medreseyan despêka xwendina pirtûka Mele Camî bû ta pêkanîna xwendina medreseyê ku êdî ji wan re mele dihat gotin. Radeya sêyemîn navnîşana Seydatiyê bû ku ev rade asta herî bilind bû di xwendina medreseyan de. Ew kesên ku ew rêzepirtûkên rêzkirî di rêznameya medreseyan de bi tevahî bi dawî bianîna û ji seydayên xwe bi rewşeke vekirî û bi azîneya fermî ya medreseyê destûrname (îcaze) bigirtina, ew dibûn seyda (dersbêj).

Peyva "Feqî" an tê wateya feqîh ango pispor û şareza di fiqha Îslamê de, an jî bi wateya "fîkî" ye, ango ku ew şagird fikiyên medreseyan in. Peyva mele jî, bi wateya sobarî û avjeniyê ye ango kesên mele di nava medreseyên mîna derya de bi sedem zanîn û feraseta xwe sobarî û avjeniyê dîkin. An jî mele navê perendeyekê ye ango ew kesên ku ji şagirtiye derbaz dibin ku navên wan dibin mele, weke perendeyan di asûmanê zanista medreseyan de difirin. Navnîşana seyda tê wateya dersbêji,

mamostehî û perwerdakariyê. Hin zanyarên kurd dibêjin ku “sey” di kurdî de wateya ders e, ku wisan e seyda ango seybêj (dersbêj).

Ji medreseyan gelek kesayetên navdar derketine, mîna mirovên oldar, pîrên terîqetê, nivîskar, helbestvan, dadwer û diroknas. Hinek ji van kesan di warê pîşeya xwe de xebatên olî, zanistî û wêjeyî pêk anîne û berhemên hêja, yadîgar li pey xwe hiştine. Beşek ji wan jî xwedî raman û rewanên netewî bûne. Rewşa jiyana û hevpariya medreseyan bi awayekî hemdem û wekhevî bû. Debara şagirdên medreseyan ji aliyê gel ve dihat pêkanîn. Bi azîneyên

hevpar, wekhevî û “qomîni” dihat pêkanîn. Jiyan “qomîni” di medreseyan de, azîneyek e bîngeh bû.

Medrese û gel bi hev re têkildar û peywendîdar bûn. Hemû kevneşopiyên netewî bi hevbeşî dihatin şopandin. Medrese û gel bi hev re dijiyan, di hin rojên taybet û di rojên dawîya hefteyan de dihatin nik hev, bi hev re helbest, stran, çîrok, lîstik, şano û govendên kurdî pêk dianîn. Ji van sedeman e ku merdreseyan bandoreke erênî li ser newindabûna çand, ziman û wêjeya kurdî hiştiye.

FERMANA BO MELÊ BÊMI'ÂŞ

DILKANÎ

Di adara heştêw pênc fermanek hat bo mele
Heçî melên bêmi'âş bîn Diyarbekir bila

Di bîst û şeşê wê da kes nemîne bila bê
Muftiyê Diyarbekir ka ji wan ra çi dibê

Di roja bîst û şeşa evan melên bêmi'âş
Kar û bara xwe kirin li pey hev bûn kaşekas

Hewşa Mizgefta Mezin çiyê wan tê nema bû
Bûbû pistepista wan çav li wan beloq bûbû

Demhejmêra dehan da'l-fermangehê em kom bûn
Bi rêk û pêk em civîn, rûniştin, sertazî bûn

Navê gundên me xwendin ne bi navên dayikî
Lew ra pêş da guhartibûn tevaki kiribûn tirkî

Hin ji me rabûn peya gotin; “em tê nagîjin!
Bi wan navên kevnare gundên me bo me bêjin”

Rabûn û çûn û anîn navên gundan yên kevnar
Lew ra hêja natibû ewî muftiyê xedar

Demhejmêra deh û niv kete hundur ew muftî
Çavê xwe bir û hanî Erzincanî Necatî

Lêva xwe kir wek zirne ya jêrê b'ser jorê xist
Tev bi hev ra bizdiyan me bi dizî kir pistepist

“Hela hela viya ye muftiyê Diyarbekir?
Çi ra wiha gunê xwe reş û tarî li me kir?”

Axeftinê dest pê kir me tevan gunehbar kir;
“Ev çend sal e li vir im we kî mi(n) ziyaret kir!”

Gelek xwe biz û bada bi quretî pir digot
Hefsar li ser lefandî bê rawestî gem dikot

Digo; “divê em yek bin dora me tev neyar in
Yunan, Sûrî, Iraq û Îran, Sovyet, Bilxar in

Milyonek Tirkê me ne di nav Bilxar nabîzin
Wan misilmanê hêja navê wan diguhêzin

Piştî halê me ev e divê em tev bira bin
Wanê me ji hev dixînin di rû wan da em rabin

Hinek xort ket'ne çiya wan ra dibên qomînist
Gava hatin gundê we bêheska wek nebihîst

Werin ji me ra bêjin lew ra em metel mane
Em kesî ra nabêjin bo we sond û peyman e

Gazî dikin “em Kurd in, dewleta Kurd saz dikin”
Vî welatê me yê rind ji hev du perçe dikin

Destê xwe'b destê me din em rakin kurdîtiyê
Peş ve bibin bilind kin alaya tirkîtiyê

Warê me yê didoyan bo we dibêm bi kurtî
Wun şîret û xutbê xwe naxweyînin bi kurdî

Gava ketin mizgeftê axeftin bi tirkî ye
Lew ra bindestê tirk e fermangehek resmî ye

Ez ji we ra dibêjim pêşnimêjên bêmi'âş
Haya we her li we be nebi nebi bibin şaş

Di mizgeftê me tirka hûn bi kurdî bibêjin
Çavê serê xwe vekin hûn ne ker in ne gēj in

Kesê me nehebîne bi daxwaza me neke
Jin û xweşî bo nîn e bila çavê xwe veke

Ji îro pê ve wun ê tişteke bê me nebêjin
Em dê we agahdar kin me çi go dê wî bêjin

Gava derên mînbera bi tirkî qebeqeb kin
Wan guhdarên we yên kurd bila qe jê fam nekin

Pir biyan û xerîb e di nava dewleta me
Bi kurdî xutbe xwendin! Wisa xeber giha me”

Lê birê hêja yê kurd mêrê ku wiha digo
Axeftina xwe qedand me dabûnê her du go

Hinek melên bêzirav çewa gihîştine gund
Guherîn û bûne tirk bi yek kukînekî kund

Di mîhrabê de rûnişt tirkî ji hev perçe kir
Bû tirk li ser mînberê j'gelê xwe fedî nekir!...

Avrêl 1985

“Di Medreseyan de Zimanê Kurdî û Wêjeya Kurdî bi Xwezayî Hatiye Parastin”

Hevpeyvîn:

Azad ZAL -Omer FÎDAN- Serwet DENÎZ

Di çarçoveya amadekirina dosyeyê de me xwest em bi çend kesên ku di medreseyê de xwendine û jiyana medreseyê jiyane re jî biaxivin. Bi vê mebestê me bi riya înternetê pirsên xwe ji Celalettîn YOYLER û Kerem SOYLU re şand û bi Mele XALIT re em rû bi rû peyvîn. Bi baweriya me wê rengê xweş dabe dosyeya me...

W - Ji kerema xwe re hûn dikarin xwe bi me bidin naskirin? Hûn çawa bûn Seyda? (Bi taybetî li ser dema feqîti û pêvajoya xwendina medreseyê.)

Mele XALIT - Navê min Mele XALIT e. Di sala 1935'an de ji dayik bûme. Min di destpêkê de li bal diya xwe elîfbêtk xwend, dû re li bal diya Mele Ahmed ku navê wê Esma ye min Quran xwend. Di sala 1945'an de ez çûm Elibardaxa, gundekî li navbera Diyarbekir û Licê ye. Wê çaxê li Elibardaxa du heb xan hebûn. Karwan dihatin bi şev li wê derê diman bi roj diçûn. 10-15 feqî hebûn li wê Medreseya Mele Kamilê Elibardaxa. Bi qasî 6-7 mehan min li bal Mele Kamil xwend di Medreseya Elibardaxa de. Hîn nû ez ketibûm nav jiyana medreseyê. Hîn nû min didît ku medrese çi ye. Tişteki pir balkêş bû ku sebiyekî wek min 10 salî ji mala xwe biqete û bi serê xwe here cihekî û di nav 10-15 kesên ji xwe mezintir de bijî. Ku emrê wan 15-18-20-25 sal bûn ez jî 10 salî bûm. Di nava wan de ez wek sebiyekî bûm. Wek sebiyekî xwe ji min hez dikirin. Tu zilm û heqaret û xirabîkî nedihat ne ber çavên min ne jî wan. 6-7 mehan jiyana xwe me di medreseyê de domand. Tişteki pir baş bû wê terbiye û me'rifeta medreseyê ku ez hîn bûm di deh saliya xwe de. Ez hîn jî di bin hunermendiya

wê terbiye û me'rifetê de me. Gelekî qenciya wan însanên wî gundî li feqiyan dibû. Heta gorê wan dibirin diraxandin, cilên wan dişûştin, nanê wan didan, seydayê ku dersa wan dida ihtiyacên wan pêk dianîn. Viya tişteki pir balkêş bû ji ber ku bêtî feyda madî bû.

Celalettîn YOYLER - Ez di sala 1940'an de, li gundê Xanikê yê bi navçeya Melezkurdê ve girêdayî ji dayik bûme. Di temenê min ê 8, 9 salî de li wî gundî bavê min li bal meleyê gund ez dam ber xwendina Quranê. Li bal wî meleyî min Quran, Nehculenam, Nûbihar û Mewlûda Bateyî qedand. Ji ber ku Mele ji bo dersdayîna pirtûkên li jor ne amade bû ez derketim Medreseyên dervayê gundê xwe.

Min li Medreseyên cur ber cur ên li hawîrdorên Mûşê û Melezkurdê li bal gelek seydayan xwendina xwe bi jor ve bir û di sala 1961'an de ez feqiyekî talib bûm. Ango xwendina min gihîştibû pirtûka bi navê Camî. Kesinê ku xwendina wan bigihîştê vê pirtûkê, li gor çanda Medreseyê jê re digotin 'talib' û ew di medreseyê da, yek ji feqiyên taybet dihat hejmartin û nediçû nav gund ratiban. Di wê salê de, ji ber ku temenê min gihîştibû bistan û hatibû heyama çûyîna leşkeriyê. Ez çûm leşkeriyê û min du salan li ser hev leşkeriya xwe qedan û zivirîm welêt.


Lê min wê demê hêj pirtûkên xwe yên xwendina medreseyê neqedandibûn. Ji ber wê cardin min dest bi xwendina medreseyê kir û çûme Medreseya Mamosteyê pir zana yê bi ilmê medreseyê; bal Mele Muhemed Yagmûr. Min li bal vî seydayê hêja di qada xwendina bilind a medreseyê de xwendina xwe domand û qedand. Paşê ez zivirîm gundê xwe yê bi navê Xanikê û bûme meleyê gund. Ji ber ku di gundê min de, ji destpêka cenga yekemîn a cihanê ya 1914'an heta wê demê mizgeft û medrese tune bûn, min medrese da avakirin û dursa feqîyan da. Dû re ez bûm xwedî qadroya fermî û meaş. Lê mixabin ew jî pir li min negivirî û ketime ber dazandî û lêpîrsînên Diyaneta Tirkîyeyê û hatime sirgûnkirin. Ez dame bajarê Aşqeleya Erzeromê. Li wir neçar mam ku derfetekê bo zivirandina welatê xwe bibînim û çareseriyekî peyda bikim. Bi vî mebestê min jî bo Saziya Teqawidiya Tirkîyeyê pereyên heft salan razand, ji karmendiya diyanetê derketim û malnişîn bûm. Malnişîniya min a ji karmendiyê jî bû malnişîyeke nebihemdî, bîzorakî.

Kerem SOYLU - Ez di sala 1945'ê zayînî de li gundê Nûredîn ê Navçeya Melezgîra Mûşê hatime dinê. Dibistana sereke li gundê Nûredînê, ya navîn jî li Melezgîrê jî derve ve min qedand. Beri destpêka mekteba tirkî min Qurana pîroz xwendibû. Dema ku mekteba tirkî kete gund mamosteyê mektebê kurd bû, wî bi hinek devxweşîyan dilê min bi mektebê ve girêda û ez bi dizî qeydî mektebê kirim. Lê bav û dayika min li hember derketin. Dû re ew hate cem bavê min got ku ez ê te ji qereqolê re gilî bikim, te bidim destê cendirmeyan.

Ji neçarî ew razî bûn, lê bavê min jî min re got ku di roja şemî û yekşemê de tu yê herî medreseyê. Heta ku mekteb biqede paşê tu yê li medreseyê bidomîni. Him mektebê û him jî xwendina min a medreseyê dom kir. Gelek bûyerên nelirê ku di mektebê de diqewimîn ez pê nerazî bûm. Her wekî kutana zarokan; ji ber ku bi tirkî nizanibûn dihatin cezakirin. Ji wê sedemê gelek zarokan firar dikirin nedihatîn mektebê.

Min xwendina medreseyê û ya mektebê bi hev û din re domand û min gelek îbret ji mektebê hilanî.

Ez dikarim bibêjim ku ew dijberiya li hember zimanê kurdî ku li mektebê hebû ew bû sedema bingeha welatparêziya min. Çimkî




axaftina bi zimanê kurdî bi tundî qedexê bû. Ji wê bonê zarok bi kutan û şidetê re rû bi rû diman. Şert bû ku li mala xwe jî zarok bi tirkî biaxîfîyana.

Pîştî ku mekteb qediya min şîkur kir ku ez li medreseyê vegeriyam. Di ber mektebê de min gelek kitêb xwendibûn. Medreseya gundê me gelek baş bû ji ber başiya gundiyan meleyên gelek baş û feqîyên jêhatî xwe li gund digirtin. Gundiyan jî meleyên bijare û zanyar dianîn gund.

Min xwendina xwe ya medreseyê li gund domand. Havînan ez jî bo debara malê dixebitîm. Payîz, zivistan û beşek ji biharê jî min li medreseyê dixwend. Bi gelemperî min li medreseya gundê me ya Nûredînê xwend. Ji bo demên kin ez derdiketim derveyê gund. Di dema xwendina xwe de min jî gelek Seyda û feqîyên bi rûmet feyde dît, fikir û ramanên wan jî min re bûn ronahî. Min Kitêba xwe ya herî dawîn; Şerhul E'qayîd demeke hindik li cem seydayê bi rêz û rûmet Seyda Mihemed Sadiq xwend. Ew di herêma me de (Serhedê) bi nav û nîşan bû. Wî gelek meleyên zîrek dan xwendin. Min li tu cihî îcazet nestand, ez xwe wek feqîyekî seydayê birêz Seyda Mihemed Sadiq dibînim. Heke ew bipejirîne ez destûrdayiyê wî me.

W- Bi gelemperî medrese û feqîti çi ne, tu dikarî ji me re vebêji?

Celalettin YOYLER: - Medrese peyveke erebî ye û bi wateya hînkirina mirovan a bi mijarên ol û aletên Nehw, Serf, Îstî'are, Mentiq, Fiqh, Tefsîr, Hedîs û hinek beşên ji zanînen olî, civakî û dîrokî ye. Medrese çawa me got wargeh û xwendegeha feqîyan e. Yanê kesinê ku feqîtiyê dikin di wê xwendegehê de



hînî gelek zanînan dibin. Ji wan zanînan bi taybetî û beriya her zanînen ku me li jor dane rêzê divê feqe hînê giramera erebî bibe. Jixwe di beriya her xwendinî de seydayê medreseyê feqîyan hînî wê giramerê dike. Lewra ku feqî hînî giramera erebî nebe, nikare peyvên erebî ji cur be cur pirtûkên ku têne xwendinê bizanibe û fêr bibe.

Feqî jî: kesinê ku dixwazin di medreseyê de, li bal mamosteyekî olî fêrî gelekî zanînan bibin diçine medreseyê û fêr dibin in. Xwendekarên ku di medreseyê de, ji destpêka xwendinê heta dawîlêanîna xwendinê fêrbûna xwe didominin û pişt re li gor fêrbûn û zanîna her feqîyekî nîrxandinek wek azmûn ji hêla seydayê wan ve her çiqas di pratîkê de nayê kirin jî lê di nîrxandina zanîna wî feqîyî de seyda biryar dide. Eger biryar erênî be seydayê wî destûrnameya wî ya zanîne amade dike û pêşkêşî wî dike. Armanca vê destûrnameyê ew e ku ew feqî êdî ji feqîtiyê rizgar bûye û bûye seyda û dikare dersên feqîyan bide. Bi kurtayî rewşa feqîtiyê ev e. Tiştê ku em lê zêde bikin, pîrî caran, ne her tim feqî ji malbatên xizan an jî ji yên oldar dertên. Sedem ew e ku bi qedandina xwendina xwe hem bibe meleyê gundekî û karê xwe yê olî bide meşandin û dersan bide û hem jî ji bo di rewşa xwe ya aborî de bi ser bikeve. Bi rastî ev reng bi dîtina min, di ramana piraniya meleyên Kurdistanê de heye.

Kerem SOYLU - Medreseya kurdî ji îslamiyetê vir ve, ev nav ji erebî girtiye û di rastiya xwe de ew zankoyeke kurdî ye. Di demên herî berê de peywira zanîngeheke bi rêkûpêk girtiye ser xwe û perwerdeya şagirdên neteweya kurd bi cih anîye. Feqî wek şagirdên zanîngehan girêdayî rêzika medreseyê û rûmetdayîna seydayê xwe bûn, her wisa girêdayî hevalên xwe û karbeşîya di nav medresê de bûn. Çawa di nav gel de dihat gotin ew bi telîm, terbiye û tore ne, destşûştî, pêşûştî û teyrikê cenetê ne. Yên bi vî teherî nebûna cihên wan dihat xerakirin û ew diçûn.

W - Armanca avakirina medreseyan a bîngehîn çi ye? Û kargêriya medreseyan çawa bû?

Kerem SOYLU - Di pey navê camiyê re navê medreseyê di nav kurdan de tê xwendin û gelek pîroz e. Armanca wê ya yekemîn çawa ku di jor de jî hat gotin, perwerdeya ziman, çand û wêjeya kurdan e, her wisa hebûn û tunebûna gelê kurd e. Duyem; ew sembola kurdewariya gelê kurd e. Medrese di jiyana gelê kurd de saziya wan a sîvîl e. Muderîsê medreseyê him medrese bi rê ve dibir, him jî di gelek qadê jiyana de pêşevaniya gel dikir. Di şîn û şahîyan, her wisa di şer û nakokiyên di navbera gel de pêşevanî dikirin. Pêdiviyên civakî bi rê ve dibirin. Di nava gel de aşti pêk dihanîn. Gundên ku medreseya wan nebûya, tim mihtacî gundên ku medreseyên wan hebûn dibûn.

Kargêriya medreseyê ji ewil ve li ser milên meleyan bû. Ew pêşevanê giştî bûn. Dû re di medreseyê de talibê herî mezin cigirê seyda bû, navê wî 'mîrê medreseyê' bû. Mîr li gor sistema medreseyan hevbeşî di medreseyê de dida rûniştandin.

Mele XALIT - Di welat de mekteb tune bûn; hew umîda mîletê ew bû ku herin di medreseyan de bibin xwediya zanîne. Îcar wan kesên ku di medreseyan de ders didan wan jî di medreseyan de xwendibûn ji ber vê yekê ev fedakarî dikirin. Dihatin serê sibê rûdiniştin, heta êvarê darsa feqîyan didan. Feqî di medreseya kîjan seydayî de bixwenda piraniya zehmetiyên wî li mala seydayê wî dihatin bersivandin. Ku pêdiviya wan bi tiştêkî hebûya bi piranî diçûn mala seydayê xwe. Seyda jî ji serê sibê hetanî êvarê di nava feqîyan de bûn, bi wan re heşirneşîr dibûn, bi wan re hevalmendî dikirin, darsa wan didan, çi îhtiyacên wan hebûna pêk dianîn.

Celalettîn YOYLER - Bi taybetî fêrbûna rewşa olî ye. Gava em dibêjin medrese; bi hezaran mizgeftên ku ji bo îbadetê têne avakirin, ew bixwe hem wargehê perestiyê, hem ji yên dersdana feqîyan in. Ji ber vê rewşê ji van mizgeftan re ji medrese tê gotin.

Ji bo xatirê paqijkirin û nihêrandina medreseyê, kesek ji hêla gundiyan ve dihatê girtin û mehaneya wî ji, ji hêla gundiyan ve dihatê dayîn. Ew kes ji ji hêla gel ve bi navê 'mîrcewî' dihatê naskirin. Kargêriya medreseyê ev bû.

W - Yekî ku dest bi feqîtiyê bikira, parî ku pêş ve biçûya, baweriya ku ew ê sibê ro karekî bibîne û xwe pê xwedî bike, çêdibû gelo?

Mele XALIT - Eviya diguherî. Mesela mirovekî ku malbata wî maldar bûya; ew mirov sirf ji bo ku here ber xwendevaniyê, bibe mele, tiştêkî hîn bibe, bibe zana, diçû dixwend. Lê yên ku feqîr bûna, bavê wan belengaz bûna; ew ji diçûn, digotin ku em bixwînin, belkî nanekî rihet bi destê me bikeve. 'Nanê mele pehtî ye/li ser çokê ye'. Yanê em neçin êdî rêncberiyê nekin û xulamiya xelqê nekin. Em ji xwe re bibin mele û li cihekî nanekî rihet bixwin. Armanca kurên feqîran ji ew bû.

Kerem SOYLU - Meleyê medreseyê ji aliyê gundiyan ve bi fitir, zekat û sedeqeyan dihat îdarekirin. Di hinek rojên geştê û şevên îne de ji aliyê gundiyan ve malzeme dihat dayîn. Feqîyan nan û goşt amade dikirin. Feqî, seyda û gundiyan tevi hev û din him dixwarin him ji dilistin bi hev û din re kêf û şahî dikirin.

W - Medreseyan çawa debara xwe dikirin?

Celalettîn YOYLER - Medrese her bi tenê ji hêla seydayê medreseyê ve tê birêvebirin. Ger mebesta we rewşa wî ya aborî be, tu derfetên medreseyên Kurdistanê, yên li gundên cur be cur, tune ne ku xwe bigihînin rewşeke aborî. Bi tenê ji hêla gundiyan ve xwarin û vexwarina feqîyên medreseyê tê dayîn û dibine alîkar ji bo pîrsgirêkên wan ên bi vî rengî. Carinan ji bo feqîyên ji deverên dûr têne medreseyan gundiyan nivîn ji didane wan. Ji bilî van gotinên me yên li jor ji hêla tu kesî ve rewşeke taybet ji bo medreseyê tune ye.

W - Barê medreseyan tev li ser milê gundiyan bû an jî weqfên ku debara medreseyan dikirin hebûn?

Mele XALIT - Li ciyên ku şêx lê hakim bûn, medrese yên şêxan bûn. Bi navên şêxan dihatin nasîn; wek medreseya Oxînê, wek medreseya Norşînê, wek medreseya Şêx Ahmedê Xiznayê. Yanê cihên ku Şêx lê hakim bûn ew medreseyên wan deran ji di bin îdareya, qontrola wan şêxan de bûn. Feqî di medreseyên wan de dihatin naskirin. Ji sedî heştêyî ji ji terefê mala şêx ve dihatin îdarekirin. Tabî xelqê dihanî ji wan re, wan ji didan feqîyan.

W - Cihên ku te lê xwend tu dikarî bi kinasî bibêjî? Di nav wan de cihên wek navend kîjan bûn?

Mele XALIT - Cihê herî mezin Medreseya Norşînê bû. Medreseya Norşînê ku jê re dibêjin medreseya Mala Hezret. Medreseyeke mezin bû, feqî tê de gelek bûn. Mirovên, xwendevanên pir baş ji jê derketin. Li wê derê, gundiyan xwarin nedişandin. Li tekyaya mala şêx nan ji feqîyan re derdiket. Firûna wan hebû. Nanê wê firûnê dihat ji feqîyan re. Xwarina ku ew qasî ku pê îdare dibû feqîya ji tekyaya mala şêx dixwarin.

W - Mesela yên Mala Xizna?

Mele XALIT - Ez neçûme wir. Lê ew ji wisa bû. Wek ku min ji we re got; cihên wisa mezin ên ku şêxên navdar tê de hebûn medrese di bin însiyatîfa wan de bûn. Lê wekî din, hema ji du sê gundan yekî de medrese hebû.

W - Di medreseyên berê de; armanca medreseyan tenê hînkirina dîn nebûye; feqî hînî zimanê farisî û erebî kirine, astronomî, matematîk, hwd. hebûne, li ser gelek ilmên din jî sekinîne. Di nav van medreseyan û yên piştî komarê de çi fêr qe hene an jî bi çi awayî ji hevdu diqetin?

Mele XALIT - Di medreseyên berê de îmtihan hebûn. Feqî diçûn diketin îmtihanên resmî. Gava ku di van îmtihanên resmî de bi ser biketina nediçûn eskeriyê ji. Avantajeke wan a bi vî rengî ji hebû; îmam, muezîn û hinek karmendên dewletê yên dinjî ji wan dihatin hîlbijartin. Çimkî nivîsa Osmanî dihat xebitandin û nivîsa Osmanî ji ji farisî, erebî û tirkî pêk dihat. Ji wan re pir hêsa bû. Meleyan dikaribûn karmendî ji bikirina. Piştî komarê medrese qedexa bûn. Medrese qedexa kirin lê meleyên welat bi dizî ders didan. Li hinek ciyan midûrê nehyê, qeymeqam pê dihesiyan ji çavên xwe digirtin, digotin mirovên dîn ji lazim in, bila bixwînin, piştî ku zirara wan ji dewletê re tune be. Lê li hinik cihan. Gava ku îxbar bihatina kirin bihata gotin ku erebî tê

xwendin; midûrê nehyê, qeymeqam an jî qumandanê herêmê dihatin mudaxele dikirin. Lê li pîrî cihan nediçûn mudaxele nedikirin, çavên xwe digirtin. Me jî di wê atmosferê de xwend.

W - Em werin ser mufredata medreseyan. Mufredata medreseyan çawa dihate çêkirin? Bi awayekî navendî bû ya her kesî li her derê cihê cihê çêdikirin?

Mele XALIT - Seyda medrese îdare dikir. Ew mele mensûbê şêxan bûn, yanê di binê darê şêxekî de bûn. Her li mentîqekî şêxek hebû, ew gund an jî seyda mirîdê kîjan şêxî bûya; mele ji terefî wî şêxî ve dihat tayînkirin û diçûn wî gundî. Gund jî bi serê xwe dikaribû mele bigire. Ez ku gihîştimê îdî şêxan nikaribûn wek berê li ser mele û gundiyan bandorker bin. Yanê merivekî ji vir, ji xelqê Silîva dikaribû here Serhedê li gundekî bibe mele.

Kerem SOYLU - Medreseya kurdî û zanîngehên dewletan di dersdayînê de di bingeha zanistan de, di gelek qadan de dişibin hev û din. Ji ber ku zanîngeh saziyên dewletê ne bernamêyên wan ê mehane, heta yên salane hene. Lê di mufredata medreseyan de xwar û jor tune bû, wekhevî di nav medreseyan de hebû. Pirtûkên dersdayînê hebûn. Medreseyan ji bo wan pirtûkan rêzîkek çêkiribûn. Li gor wê rêzîkê bernamêya dersdayînê hatibû amedekirin. Piştî Qurana pîroz, Mewlûda Bateyî, Nûbihara Ehmedê Xanî, Nehculenama Mele Xelîlê Sêrtî û kitêbên ku wek 'hûr' dihatin binavkirin. Zirûf û terkîb bi kurdî bûn. Ji ewil ve dihatin xwendin û ev ji bo xwendina zarokên kurd ronahî û bingeheke zor girîng bûn. Pêşî kurdiya xwe bi pêş ve dibirin. Dû re dest bi giramera erebî dihat kirin û pirtûkên rêzê dihatin xwendin.

Celalettîn YOYLER - Mufredata medreseyan ji dema pêncî û pêncan heta ku ez ji medreseyê derketim, bi rengekî nenûjen dihate meşandinê. Ango di derbarê zanîna aletê giramera erebî de, ji bîstan zêdetir pirtûk didane xwendin. Naveroka van pirtûkan di derbarê zanîna giramerê de yek bûn. Her mamosteyekî ji hêla xwe ve, ji bo fêrbûna zimanê erebî û giramera wî pirtûkek amade kiribû. Lê gava te ev pirtûk bidana ber hev; yek armancek jê derdiket ew jî: Fiil, fail, mef'ûl, mubteda, xeber, zerf, demme, fethe, kesre, refe, nesbe û cerre ne. Ji bo hînbûna van aletan, yek pirtûkek bi tenê jî bi kêrî



fêrbûna xwendekarên medreseyê dihat. Lê mixabin serî li feqiyan dikirin dew û gêj dikirin. Ji bo hînbûna van aletên giramerî salek jî besî wan bû. Bi birek salan feqî didane bendewarkirinê. Çewtiya mufredata medresê ya ku me got nenûjen bû ev e.

W - Cihêtiyên çawa di navbera wan de hebûn?

Mele XALIT - Edebiyata erebî hakim bû. Yanê her kesê ku biçûya medreseyê bi edebiyata erebî re mijûl dibû. Serf, nehew, hedîs, tefsîr, mentîq, îstî'are, hwd. tev di medreseyê de bi erebî dihatin dersdayîn; bi tercûmeya zimanê kurmancî. Îcar talib; kesên ku li ber mezûnbûnê bûn, li jor bûn, wan jî dersên xwe bi kurmancî dixwendin û kesên ku nû jî diçûn wan jî dersê xwe bi kurmancî dixwendin.

Celalettîn YOYLER - Li medreseyên Kurdistanê, di heyam û demên Mîrnişînê welêt de, di dema mamostayê mezin Ehmedê Xanî de, di ya Meleyê Cizîrî û birekî zanayên birûmet ên wek wan de, medrese serbixwe bûye û ne di bin bandora dagirkeran de bûye. Di medreseyên wan deman de, ilmên cur be cur dihat xwendin û di radeya herî bilind de, seydayên wek Xanî û Cizîrî jê derdiketin. Em dibînin ku di berhemên Xanî û Cizîrî de, ji zanistên cur be cur agahî hene. Ango van Mamosteyan ji zanista astronomiyê,

erdnîgariyê, xwezayê û yên cur be cur diaxivin. Dibe nîşana wê qasê ku ew medreseyên wê demê û yên vê demê ne wek hev in. Dibe ku mufredatên dema van zanayên mezin, ji yên dema me cudatir û nûjentir be jî. Lewra gava em li rewşa berhemên wan ên edebî, dîrokî û zanistî dinihêrin; em dizanin ku di her warî de ew ji dema medreseyên me nûjentir bûne.

Di Medreseyan de Rewşa Zimanê Kurdî

W – Em werin ser Zimanê Kurdî û Medreseyan. Têkiliya navbera perwerdeya medreseyan û zimanê kurdî çawa ye? Hûn çawa dinirxînin? Di nava armanca medreseyan de parastina zimanê kurdî bi taybetî hebû an jî ev tiştekî xwezayî bû?

Celalettîn YOYLER: Têkiliya medreseya dema me, bi taybetî bi zimanê kurdî re pir tune ye. Ev jî rastiyeke bûyerê ye. Zimanê kurdî ji medreseya kurdî gelek sûd ditiye. Lê mebest û armanca bi hezaran meleyên kurd fêrbûna gel a zimanê kurdî nebûye. Bi tenê zimanê kurdî di xwendina medreseyê de navgîneke di navbera seyda û feqî de bû. Ango Seyda dema bi pirtûkên erebî dersa feqiyên xwe dide, ji bo ku hevokên erebî bi kurdî fêrî feqiyên xwe bike, diqulibîne kurdî. Armanca di vê derê de, bi tenê fêrbûna erebî ye. Ne ku zimanê kurdî pêş ve biçe û bigihîje mistewakî bilind. Lê mirov dikare bibêje: her çiqas seyda bi mebesta pêşvebirina zimanê kurdî dersa feqiyên nade jî dîsa ji bo zimanê kurdî pêşveçûne û fêrbûnek çêdibe. Belê me got: armanca seyda ne fêrkirin û pêşvebirina zimanê kurdî ye û bi tenê ravekirina peyvên erebî ye. Lê bi rastî xebata dengbêjên kurd çawa bûye alîkarê hebûna çanda kurd û dîroka wî, wisa jî medrese bi dersdayîna erebî bûye alîkarê zimanê kurdî. Em dikarin bibêjin: Bi hezaran seydayên qenc ên xwenas ên Xwedanas bi zimanê kurdî berhemên xwe nivîsîne. Nivîsandina van berhemên kurdî ji hêla seydayan ve xurtkirineke gelekî mezin e ji bo hebûna zimanê kurdî.

Mele XALIT - Bi bawerîya min; di nava meleyên ku ders didan de ji sedî notê wan xwediyê şîûreke netewî nîn bûn. Nedigotin bila ziman wînda nebe. Tev sofî bûn, miswakên wan hebûn, mirîdên şêxan bûn û hew zikir didane gundiyan, xelqê. Nimêj, rojî, hec, fitir, zikat, e'qîq, mewlûd xwendin, yasîn xwendin û xitim xwendin... Vana didan xelqê.

Yanê Şêx û mele û derwêş û hecî û sofîyên ku min dît tevekan di nesîhetên xwe de hew zikir didan xelqê. Yanê ji xelqê re tewsiyeyê wan dînî bûn, van tiştan digotin. Îcar tiştekî balkêş e wan mektûbên xwe bi erebî dinivîsandin. Mektûbên ku ji hev re dişandin. Wexta ku xoceyekî ji melekî an ji şêxekî re mektûb binivîsanda an jî şêxekî ji meleyekî re mektûb binivîsanda bi erebî dinivîsand. Lê wexta ku bihatina cem hev bi kurdî dipeyivîn.

Kerem SOYLU - Bi dîtina min têkiliya di navbera medreseya kurdî û zimanê kurdî de wek find û ronahiyê ye. Ji hev û din naqetin. Dema ku find bê gotin ronahi jê mebest e. Her wisa medreseya kurdî bête gotin mebest jê ziman, çand û wêjeya kurdî ye. Çiqas liv û helwestên medreseya kurdî hene, zimanê kurdî pê re ye. Çawa ku di dereceya yekem de ji heyîn û domandina zimanê kurdî re dayikên me dayik in, her wisa di dereceya duyem de jî medreseya kurdî dayika ziman, çand û wêjeya kurdî ye, bi me daye hînkirin, qezenckirin û parastin.

Celalettîn YOYLER - Lê em dikarin bibêjin: xebata afirandina berhemên seydayan jî berhemên medreseya kurdî ne û bûne alîkarê pêşvebirina zimên.

Kerem SOYLU - Ev yek di berhemên ku li ser çand û wêja kilasîk a kurdî yên ku hatine weşandin, xwe bi awayekî zelal dide xuyakirin.

Mele XALIT - Ez dibêjim ku vana ne xwediyê şîûra milî bûn. Hema ji wan re bûbû urf û edet. Wiha hatibû û wiha diçû. Îcar Meleyê Xanî (R.E.) Nûbiharek çekiribû. Piştî ku Mewlûd diqediya mirov Nûbihar dixwend. Ew Nûbihar ferhenga Kurdî û Erebi bû. Hinek peyvên erebî mirov ji wê hîn dibû. Di wê de dibêje ku min Nûbihar çekiriye 'ne ji bo sahib rewacan belkî ji bo biçûkên kurmancan.' Ji bo ku xelqê kurmanc pê hîn bibe.

Celalettîn YOYLER - Me gotibû mebesta piraniya seydayan fêrbûna giramera erebî û dû re fêrbûna Fiqha îslamî bûye. Zimanê kurdî di medreseyê de ji ber ku seyda kurd e bivê nevê pê axiviye û hevokên erebî rave kiriye. Ev rewş rengêkî xwezayî ye û ne armancî ye. Ramana me ya ji bo ku di medreseyê de fêrbûna zimanê kurdî ji bilî mamosteyên wek Xanî ne armanc bûye ew e ku armanca wan ji xebitandina zimanê kurdî bi tenê navgîniya fêrbûna zimanê erebî û farisî bûye.



Di Medreseyê de Ciyê Wêjeya Kurdî

W- Berhemên ku bi kurdî hatine nivisandin di mufredata medreseyan de çawa bi cî bûne? Tiştên ku wan heta niha anîne çî ne? Di medreseyan de perwerdehiyeke taybet a wêjeya kurdî hebû an na? Tesîra medreseyan di vê mijarê de çawan e?

Celalettîn YOYLER - Mufredata medreseyên dema me, pirtir li ser giramera erebî fiqih, tevsîr, hedîs, mentiq, îstî'are û eqîdeyê bû. Bi rengê fermî; ji bilî Nehculenama Mele Xelîlê Sêrtî û Mewlûda Hesenê Ertûşî û Nûbihara Xanî tu berhemên wêjeyî cih negirtibûn. Bi tenê ev pirtûk wek ders hatine xwendin. Lê wêjeya klasîk a bi wezna erûsê wek diwana Melayê Cizîrî û Mem û Zîna Xanî, ji derveyê mufredata medreseyê bi xwestina hin feqîyan dihatin xwendin.

Çawa ku me got: berhemên wêjeyê yên ku ji hêla wêjenasan ve hatine nivisandin ji derveyê mufredata medreseyê ji hêla xwendekarên medreseyê ve dihatine xwendin. Mixabin di medreseya dema min de, seydayan tu girîngî nedidan wêjeya kurdî ya klasîk û nedixistin rêza mufredatê. Yanî wek nehwe serfê, mentiqê ji hêla fermî ve rû nedane wêjeya kurdî. Eger feqiyekî bixwesta ku seydayê wî jê re diwana Cizîrî an Mem û Zîna Xanî bi dersî bibêje, dihat gotinê.

Kerem SOYLU - Berhemên ku li ser wêjeya kurdî hatine weşandin ew di rêza pirtûkên medreseya kurdî de, ango di mufredatan de tune bûn. Ji ber ku qedexeyeke gelek diwar li ser pirtûkên kurdî hebû. Dewletê tim lêgerin

li ser van berheman dikir. Ji ber wê, berhemên kurdî wek derseke talî bi dizi dihatin xwendin. Bi taybet rexbeta dersxwendina feqîyan li ser diwana Melayê Cizîrî û Mem û Zîna Ehmedê Xanî her wisa pirtûkên Seydayê Cegerxwîn bû. Di warê kurdewariyê de bandora jêhezkirin û xwendinê him li ser gelê kurd him jî li ser feqîyan hiştibû.

Xwendina van berheman bi meqamên

folklorîk, êvaran heyanî demeke şevê li odeyan, di nav gel de, her wisa bi dizî dersxwendin û dersdayîn di bi nobet ji hev û din girtine û esasê çand û wêjeya kurd parastine heyanî gihandine destê me.

Celalettîn YOYLER - Ez dikarim bibêjim: medreseyên di demên Mîrnişînên Kurdistanê de û hêj di beriya wan de zanîngehên pir bilind û bala bûne. Her wisa çawa perwerdeya matematîk, astronomî, tenduristî û bijîjkî hebûye wisa jî perwerdeya wêjeyê jî hebûye. Lê pîrên caran perwerdeya wêjeyê li gor xwestina wê demê, bi zanista ilmê arûzê û rêbaza wezna bi wî awayî perwerde hebûye. Ew jî diyariya medreseyên me yên wan deman e ku zanista perwerdeya wêjeyê pêşkêşî me kirine.

W - Ji dervayî yên wek ders hatine xwendin çî hebûn? An jî berhemên kê bûn? Kitêb, helbest û şîret. Ji kê dihat xeberdan di aliyê wêjeyê de?

Mele XALIT - Di edebiyatê de Melayê Batê ku xwediyê Mewlûdê ye, edîbekî pir mezin e. Li bal min di zimanê kurdî de edîbê herî mezin ew e. Dû re Seydayê Xanî, ew jî edîbekî pir mezin e. Îcar ka wan eserê ku çekirine çi qas qeder man, çi qas qeder winda bûn? Gelekî însanan kitêb çekirin, diwan çekirin temam ya şewitandin an jî kirin binê erdê, di binê erdê de bûn xwelî û çûn. Ji ber ku qedexa bûn. Hem çapa wan qedexa bû û hem jî firotina wan. Ji ber vê yekê man di destê xelqê de. Yên ku xwe avêtin arsiziyê hiştin, yê din jî tev çûn. Wek mînak min jî gelek beyt û qesîde nivîsî. Di derdora du hezar hebî de, lê mixabin piştî ku min ên Seydayê Cizîrî û Xanî xwend û da ber hev min dît ku yên

min li ber ên wan ne tiştên baş bûn, min avêt sobeyê û şewitand. Ez paşê poşman bûm lê ji dest çûbû.

Kerem SOYLU - Perwerdeyeke taybet li ser çand û wêjeya kurdî tune bû. Ji ber ku pirtûkên çand û wêjeya kurdî qedexe bûn gelek mele û feqîyan ev pirtûk hin caran di bin erdê de vedişartin û ew diriziyan. Gelek meleyên wêrek bi taybetî diwana Meleyê Cizîrî û Mem û Zîna Ehmedê Xanî darsa feqîyên ku darsa wan li jor bû didan. Heta hinek meleyan ev ders wek derseke taybet didan. Gelek diketin bin kûrahiya wate û îcaza wan pirtûkan ku mirov ji wê ders û sehneyê re heyran dima. Her wisa dema ku feqî derdiketin geşt û seyranê Diwana Cegerxwîn wek merş dixwendin û bi rê ve diçûn.

W - Ji derveyî van kesên ku me behsa wan kir, ji derveyî pirtûkên wan ên darsê, yên serbest jî hebûn an na?

Mele XALIT - Na. Beytên Seydayê Xanî, beytên din jî di nav feqîyan de hebûn. Diwanên Seydayê Cizîrî hebûn; yên ku destnivîs bûn û yên ku li Stenbolê li çapê ketibûn. Tenê ne li Stenbolê; li Berlîn, Moskova, Bexda û Şamê jî li çapê ketibûn.



Mem û Zîn jî wisa li çapê ketibû. Mem û Zîn a ku min dît destnivîs bû. Diwana Cizîrî wexta ku min nû dît destnivîs bû. Ji ber ku yên metbeyê bi dest neketibûn, bi destan nivîsibûn.

W - Gelo tê bîra te ew destnivîsa kê bû?

Mele XALIT - Nizanim. Ne ez bi wê dizanim ne jî bi ya Seydayê Xanî. Ez wê çaxê biçûk bûm; 10-12 salî bûm.

W - Berhemên ku ji medreseyan derketine çiqas bûne malê gel? Çiqasî bala gel kişandine? An di nav diwarên medreseyê û wê komê de mane?

Mele XALIT - Gelek seyda heta ku mirin ji serê wan ji medreseyan derneket. Çi ji kitêban hîn bûbe ew ji xelqê re gotiye. Behsa nimêj, rojî, hec, zekat, hwd. kirine. Yanê min nediye ku tu meleyek derketiye ser kursiyekî û waz daye qala pirtûka Kitabutteharetî (kitêba paqîjiyê dike) kiriye. Çimkî paqîjî tune be tu tiştê nabe. Însanekî ku di nav qirêj û gemarê de bijî nabe tiştêkî jî. Min nedît ku rojekî van însanan di gundekî de behsa paqîjiyê kirin ka çawa paqîjî pêk tê. Di pirtûkê de di darsa ewil de bi her awayî tê gotin ku kîjan av paqîj e, kîjan mekrûh e, kîjan heram e, hwd. Lê ev yek ji gundiyan re nayê gotin. Pîreka gund bi destê xwe rêx diavêt binê kuçik, destê xwe dikir nav avê ka gelo germ bûye an na, bi wî destî firaq dişûşt. Îdî diman ew û şansê xwe, çi mîqrob bigirtina digirtin. Yanê ez vê yekê dibêjim ku ew mîrikê ku serê wî di hundirê medreseyê de bû, heta ku mir jî di hundirê medreseyê de bû. Derediket derve.

W - Yanê tu dibêjî ku yê qala paqîjiyê ji xelqê re neke wê qala wêjeyê qet neke!

Mele XALIT - Jixwe edebiyata medreseyê tev erebî ye. Ji ber vê yekê nediçû behsa edebiyata erebî ji gundiyan nezan re nedikir.

Celalettîn YOYLER - Cihê edebiyata kurdî di medreseyan de di bin fêrbûna zanîna erebî û berhemên wî de ye. Pir caran feqîyên medreseyan ji klasîkên kurdî bêtir dixwestin ji mamosteyên xwe fêrî edebiyata farisî bibin. Lê tu kesekî ji wan nedigot; berhemên Cizîrî û Xanî wêjeya kurdî ne em wan bixwînin û bizanibin. Lê mixabin çawa ku min got ez jî yek ji wan bûm. Wê demê me berhemên Xanî û Cizîrî wek gotineke muzîkî bilêv dikir û dengê xwe xweş dikir. Ji wê bêtir em pêş ve nediçûn. Em dikarin bi şanazî ji wêjekarên medreseya kurdî biaxivin, lewra gava em li dimenên wêjekarên kurd ên li deverên Kurdistanê dinihêrin em yên wek Nalî, Herîrî,



Hejar, Cegerxwîn, Cizîrî û Xanî dibînin û nikarin bibêjin medreseya kurdî di warê wêjeyê de qels e. Lewra berhemên van wêjekarên ku me gotin û bi sedan ên wek wan berhemên medreseyê ne. Lewra van zanayan yek bi yekên wan ji medreseyê derketine.

Mele XALIT - Feqîya ew maceraya di nav Mem û Zînê de wek filimekî dixwendin. Yên hinekan hêstirên wan diketin xwarê, hinek pê aciz dibûn, hinek dilê wan dişewitî. Lê wek ders nedixwendin. Gava ku bigihîştina kitêbên jor ji berî xwe vana dixwendin.

Tevî ku Seydayê Xanî însanekî feylozof bû, di beytên wî de tiştên muhîm hebûn dîsa xelq bi wî şiyar nedibû. Çimkî bi sofîwarî hatibû çêkirin û li gora serê, şîûra xelqê 400-500 sal berê hatibû çêkirin. Ka dema wan de çiqas dikaribûn xeber bidin, tiştan bibêjin. Lê van ên ku paşê derketine ên wek Seydayê Cegerxwîn pir xelq şiyar kirin, bi taybetî ji ciwanan. Lê vana bi tenê jî nebûn. Îdî dinya teng û biçûk bû, kete televizyon û teyban û hwd. Mêrik bandê teybê tije dike beytê Meleyê Cizîrî û difiroşe. Her kes dikare ji xwe re di mala xwe de lê guhdarî bike. Lê ne ji ber ku edebiyata kurdî ye. Ji ber ku xweş in. Yên dengxweş dixwendin, ên ku dengê wan nexweş bû nedixwendin.

W - Gelo qet li ser mijarên wan, li ser awayê nivîsandina wan, li ser naveroka wan nîqaş dihatin kirin? Kesî ew rexne dîkirin?

Mele XALIT - Ew meleyên ku ji medreseyan mezûn bûn, bûn alim û nivîskar, berhemên bi erebî çêkirin. Gelek berhemên erebî alimên kurdan çêkirine feqet bi erebî.

Wek mînak; Camî kitêbeke edebiyatê ye, xwediyê wê; yekî ji Erziromê ye. Yanê di şûna wê zehmeta ku didîtin de van pirtûkên xwe bi zimanê kurmancî nivîsandibûna kes wê neçûya 15 salan edebiyata erebî nexwenda. Wê di nav 2-3 salan de bi zimanê kurdî her tişt hîn bikirina. Wê dîne xwe jî baştir hîn bibûna. Lê nizanîm çima wiha kirine ka gelo ji ber ku kurdî qedexê bûye an jî ji ber ku xwestine ku bi erebî binivîsin?

W - Tevî van rastiyan sebebê ku kurdî wînda nebûye çi ye?

Mele XALIT - Belkî ji hunera wan bûye, belkî jî jixwe, xelqekî ku zimanekî wî hebûye û gotiye bila zimanê me wînda nebe. Viya tiştêkî ecêb nîn e ku yek tiştêkî bi zimanê xwe bixwîne û bibêje bila zimanê min wînda nebe. Yanê ku bi zimanê kurdî gelek berhemên wiha xweş hatine amadekirin û feqîyan di hîcreyan de, di camiyan de, di medreseyan de xwendine û bawerîya wan bi kurdî çêbûye zêdetir fêhm kirine ku kurdî çiqas zimanekî heja ye.

Kerem SOYLU - Pir balkêş e ku gelek medreseyên navdar ên Kurdistanê di demên qedim de bi temamî malê gel bûne, gel ji her aliyê ve lê xwedî derketiye. Hunermendên kurd ên navdar li vir xwendine, di wê ronahiyê de berhemên xwe ava kirine. Medreseya kurd a qedim û çand û wêjeya gelê kurd heman tişt in, ji hevûdin naqetin. Berhemên van kesên navdar bi derfetên medreseya kurdî gihîştine gelê kurd, piştî Komara tirk rastî gelek zor, zext û arîşeyan hatibûn. Wek mînak mirov dikare Medreseya Gundê Aqtepeya ku girêdayî Çinara navçeya Amedê ye bide. Medreseya Aqtepî gelek pêş de ye. Dema Şêx Hesenê Nûranî Xelîfe bûye kurê wî Şêx Ebdurehman di 1270'yî koçî de hatiye dinê, piştî mirina bavê xwe ew Xelîfetiye nake. Tenê bi zanistê re mijûl dibe û li ser edebiyata kurdî du dîwanên wî û diwana birayê wî Şêx Mihemedcan û ya kurê wî Mihemed Kerbelayî bi zimanê kurdî û bi tîpên erebî hatine çapkirin û ji aliyê Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê ve tipguhêziya wan bi latîni hatiye kirin. Gelek balkêş e ku van egîdên wêjeya kurdî di dîwanên xwe de gelek bi kurdewarî

hest û ramanên xwe bi edebiyateke şanaz pêk anîne. Şêx Mihemed Kerbelayî yê herî dawîn ji malbatê ye ew hemdemê bizava Şêx Seîdê Paloyî ye, koçberî Mugla û Ceyhanê bûye, piştî vegera xwe li ser kurdewariyê gelek nivîs nivîsine lê ji tirsê şewitandine.

W-Berhem çawa dihatin parastin?

Celalettîn YOYLER - Yên xwendina dersê di medreseyê de bûn. Ji bilî van berhemên piştî ku feqîyan destûrnameya xwe digirtin; berhemên di çarçoveya zanîna wî ya medreseyê de, li bal wî dihate tomarkirin û parastin. Nemaze berhemên wêjeya kurdî li bal her meleyê kurd bi rêz û rûmet in. Di pirtûkxaneyê her meleyê de jî cur be cur berhemên wêjeyî hene. Demên ku êrişên sistema dagirker hatine ser medrese û seydayan jî pir berhemên birûmet hatine şewitandin û windakirin.

Kerem SOYLU - Hin kesan ew berhem him ji tirsê xwe him jî ji ber girîngiya wan, bi tirs diparastin.

W - Gelek berhem di medreseyan de belav bûne. Yên ku bi dest hatine nivîsîn, yên ku van salên paşîn hatine çapkirin ... Lê di navbera yên ku niha bi dest dikevin de cihêti hene? Çawa dihatin nivîsandin, belavkirin û parastin? Û li gora kîjan pîvanan ev tişt dihatin kirin?

Mele XALIT - Ji bo ku mektebên zimanê kurdî tune bûn û kurdî ne zimanekî fermî bû her kesî bi awayê xwe dinivîsand. Wek minak; ez ji Liceyê me, eger ku ez niha binivîsim kî ku bixwîne wê bibêje ku nivîskar Liceyî ye. Yê Silivî binivîse wê bibêjin ku Silivî ye. Çimkî mêrik li bal xwe xwendiyê, li gora zimanê xwe dinivîsine. Yê Dêrikî li gora zimanê xwe dinivîsine ne wilo? Wek minak ku ez tişteki binivîsim, tercume bikim ez ê bibêjim 'qetandin' wê yekî din bibêje 'dirandin'. Yanê ku zimanê kurdî di medreseyan de bibûya zimanê fermî an jî di mekteban de bi kurdî ders bihata dayîn wê kitêb çêbibûna û her mirov li gora wê kitêbê hîn bibûya. Lê her kesî li gora gundê xwe dixwend û dinivîsî. Pir kêr mirovan dikaribûn ku ji bin vî tiştî derketina. Ez ew qas geriyam min memleket li hev xist; dîsa jî ku ez dinivîsim ez di bin bandora zimanê (devok) xwe yê Liceyê de dimînim. Piranî jî wextê ku ez diaxivim hûn nizanin ku ez Liceyî me lê ku ez binivîsim ez xwe didim dest.

Wek minak; Seydayekî li Silivî kitêbek nivîsibû. Kitêbeke helbestên dinî. Gelekî mezin e jî. 60 sal berê daye meleyekî. Wexta ku mele li wir xwendî zarok bûye û seydayê wî jî wek diyarî dayêkê. Sê çar sal berê ev mele hate dikana min. E'qîdeyek anîbû, bi erebî bû. Anî nişanî min da ka gelo ez dipejirînim an na? Min got; 'ez xulam! Te viya bi kurmancî çêkiribûya dibû. Lê hezar e'qîdeyên ku bi erebî hatine çêkirin hene û ya te nake bi du xetên wan. Te çima ev qas zehmetî dîtiye?' Îcar min jê re behs kir ku te ev qas nanê vî gelî xwariye, wan cilên te şuştine, xizmeta te kirine, cî dane te, cil dane te. Heqê te ew bû ku te ji bo van tiştan ji vî gelî re tişteki binivîsanda, tişteki ji wan re bihişt. Got wele seydayê min kitêbeke kurmancî daye min. Min jî got ka her û werîne. Çû anî ku di binê kitêban de veşartiyê, kam kişandiyê, hindik maye ku ji hev de bikeve. Min çû fotoqopiya wê derxist û anî helanî ji bo ku nemire. Mêzeke ji 60 sal berê de ew tişt li cem wî bûye û bi nivîsek wisa xweş hatiye nivîsandin û wêjeyeke xurt tê de heye lê mixabin ne rojekê xwendiyê û ne jî lê nihêrtiyê ne jî hatiye ji yekî pirsîye ka gelo ew çî ye û dibêje çî?

W- Bi baweriya we berhemên windabûyî wê çawa bîn bidestxistin an jî li ku ne, kê birine?

Celalettîn YOYLER - Bi dîtina min berhemên pir hêja û birûmet ku ji hêla seydayên me yên wêjenas û dîrokzan ve

GAZINA JI FELEKÊ

Wan şevên tarî nebûn ronî li me qet yek demek
Ma qet rojek bişirî bo me ev çerxa felek

Me nekir mêhvan ji bo xwe ne bi roj û ne şevêk
Tev ji bo wî em dikêşin gav û dem derdan gelek

Me nekir peyda ji bo xwe dost û ehbab li dinê
Mane jar û bêkes û bê ilm û çand û xwendinê

Dê ji ku hêzê werînin bona maf û sendinê
Dergehê daxwaziyê qet me nedî da biçinê

Em bi kê re bûne heval wana li me bûne siwar
Dane destê me silah û xencer û gopal û dar

Pesn û fortan wan ji bo me her fikir daîm diyar
Me dirêt xwîna xwe her dem ew dibûne xwediyê war
(.....)

Mele Xalit



“Îro jî medreseyên ku hene bi kurmancî dersê dibînin û dixwînin, bi zimanê kurdî diaxivin, ahenga wan wek berê didome”

hetine amadekirin. Piraniya wan destxet in û li gelek muzeyên wek yên Sovyet, Elmanya, Îngiltere, Firansa û Tirkiyeyê de hene. Çawa ku gelek nivîskarên me xebatên xwe ji arşîvên Osmaniyan bi dest dixin. Li hinek deverên welêt rewşenbîrên me dikarin kevneberhemên çand û wêjeya gelê me bi dest bixin. Di nav Kurdistanê bi xwe de jî li bal gelek kesên xwenda û meleyan berhemên ku tîkiliya wan bi wêje û dîroka me re hene mirov dikare lê bipirse û bi dest bixe.

Kerem SOYLU - Bersiva vê pirsê bi komisyoneke navendi tê dayîn. Di warê lêkolîn û lêgerînê de di navber temamên saziyên kurd de navendeke ji bo ziman, çand û wêjeya kurd bê avakirin ew navend li der û li hundir, li temamê arşîv û pirtûkxaneyên dewlet û kesa de bide destpêkirin. Demek berê hatibû gotin ku ‘divê li kêleka çemê Dicleyê zeviyeke bi qasî 20 doliman bête stendin, ji bo Navenda Çanda Ehmedê Xanî.’ Ev yek gelek balkêş e. Divê ku mirov kûrahiya vê peyvê bibîne. Ev peywireke neteweyî ye divê ku tevahiya saziyên me lê xwedî derkevin. Her wisa hemû karsaz û esnafên kurd jî ji xwe re wek peywîr bibînin.

W - Gelek pîrsgirêkên ziman û wêjeya me hene. Asîmîlasyon li ser me tê meşandin. Zimanê me ro bi ro dimehe. Di vir de mirov dikare rola medreseyan çawa binirxîne. Yanê ku îro jî medrese hebûna gelo wê ji pêşketinê îro re jî bibûna bersiv?

Mele XALIT - Îro jî medreseyên ku hene bi kurmancî dersê dibînin û dixwînin, bi zimanê kurdî diaxivin. Ahenga wan wek berê didome. Di hinek gundan de hicrikên biçûk

hene û di her yekê de pênc, şeş, heft, hene. Ew jî zivistanan dixwînin, havînan diçin ji xwe re dixebitin.

Kerem SOYLU - Ku di navbera wêjeya kurdî ya berê û ya nûjen de qiyasek bê çêkirin û pîsporek her du aliyan ji xebatên wêjeyî bikin da ku ahengeke wêjeyî di wêjeya kurdî de bête holê.

Civaka îroyîn ji ber ku ji peyvên erebî û farisî re nenas in, ji edebiyata kevn re biyanî ne.

Nexwe civaka kevn û nû ne pîrsgirêk in heke civaka îroyîn zorê bide xwe wê rind jê fêm bikin.

Celalettîn YOYLER - Dema em bi însaf û dilekî pak li

berhemên klasîk ên wêjeyî binihêrin; em ê bibînin ku di wan berhemên de ji bo pêşveçûn û serkeftina civaka kurd bangeke wek ya pêxemberekî ye. Bi sedan sal e wêjenasên kurd berhemên xwe yên wêjeyî bi klasîkî nivîsîne û pêşkêşî me kirine. Wêjeya ku em jê re dibêjin nûjen ji bo gelemperiya civakê sûd nade. Bi tenê ji bo kesên rewşenbîr û xwendekar realiteyeke wêjeyî ye.

W - Te bixwe tiştêk nivîsand? Mele XALIT - Min nivîsandî lê tiştê ku mirov nikaribe çap bike, weke yên berê ku di bin refan de bimîne ez ê jê çî bikim! Sibê ez bimirim, wê sebiyên min bidin dikandar ew ê ji tiştîk miştikan tîkê û bide xelqê.

W - Hûn dikarin ên ku bi wezn dinivîsin û yên ku serbest dinivîsin bidin ber hev, derfetên kîjanî zêdetir in?

Celalettîn YOYLER - Kesên ku nivîskariyê dikin; ji bo piraniya wan nivîsa serbest hêsan e. Her mirov bi rengekî wêjeyî û bi weznên cur be cur ne amade ye û nikare binivîsîne. Dema ku em li rewşa nivîskarên civakê dinihêrin; em dikarin bibêjin: nivîskarek dikare di warê dîrokê de berhemekê biafirîne û lêkolînê bike. Her wisa di warê nivîsa romanê de jî wek nivîsa serbest û çawa jî ku beşek ji nivîsa serbest e dîsa jî wek weznê giran e. Bi kurtasî nivîsa serbest ji ya bi wezin rihet-tir û hêsantr e.

Mele XALIT - Yên serbest rihettir in. Mirov dinivîse diçe. Yên bi wezn gere zêdetir mirov li ser bisekine, bifikire. Her kes nikare şûran çêbike. Hinek caran mirov qet nikare şûran çêbike. Mirov rûdinê, qelemê digire dest, dike nake tiştêk nayê bîra mirov lê ku serbest be tu yê binivîsinî wê here.



Hinek Medreseyên Dîrokî

Kerem SOYLU

Gelek balkêş e ku Şerefhanê Bedlîsî dema ji mîr, xan û serokên welatê kurdan û eşîrên gundan dem dide, dibêje ku xwenda, ronakbîr, zanyar, helbestvan, hinek ji wan ji pêşketî bûn, di welatê xwe de mizgeft, medrese û mekteb ava kiribûn. Her wisa ew behsa Mîr Dawîdê kurê Mîr Melîkê Hîzanê dike ku wî medrese çêkiriye û navê 'Dawîdiyê' lê kiriye. Dibêje niha (di dema Şerfhan de) di wê medreseyê de şagirt hin dibin mîrên zana tê de dersê didin (an ku mîr zanyar in).

Ewliya Çelebî gelek daxwuyaniyên baş li ser mizgeft, medrese, mekteb, hozan û zanyarên Bajarê Diyarbekir, Wan û Bedlîsê û çend bajarên din yên Kurdistanê jî kiriye û di Gernameya (seyahatnameya) xwe de nivîsiye. Ew dibêje, di Bedlîsê de 15 mizgeft hene, du jê gelek mezin in û her wisa hucre û medrese jî pir in. Di medreseyên Siltan Şerîf de, Kotek Meydan, Warsing Hacı Begê û Medreseya Xetîbê de zanistên hedîs, tefsîr û zanîsta civakî (sosyoloji) dihatin dersdayîn. Tê de mele û muderîsên gelek zanyar peywardar bûn.

Li Wanê gelek mizgeft, hucre û medrese hene; Mizgefta Dawîd Pêxember, Mizgefta Silêman Xan, Medreseya Olî, Medreseya Xorxor, Medreseya Xusrev Paşa, Mizgefta Tewrêzê, Mizgefta Dervazî, Mizgefta Eşklêp. Di van mizgeft û medreseyan de zanistên civakî û olî dihatin xwendin. Derbarê Diyarbekirê de jî ew navê gelek mizgeft û medreseyan di Gernameya xwe de destnîşan dike. Bi van daxwuyaniyên Ewliya Çelebî û Şerefhanê Bedlîsî tê zanîn ku di pêvajoya salên 1500, 1600 û 1700'ê zayînî de li Kurdistanê li bajarên mezin, bi taybetî; Diyarbekir, Bedlîs, Mêrdîn, Wan û li gelek cihên din, jiyana civakî; adet, dem û dezge, sazûmanî, rewşa tenduristî û rêveberiyê di gund û bajarên de gelek pêşketî bûye. Her wisa şaristanî û çanda kurd pir pêş de diçû. Di bajarên xan û mîran de, xasma di Bedlîs, Diyarbekir, Wan, Exlat û yên din de mizgeft, medrese, mekteb, fêrgeh û dersxane hebûne.

Ji tespîtên Ewliya Çelebî û Şerfhanê Bedlîsî tê zanîn ku di wan medrese, hucre û mizgeftên nav derbasbûyî de bi gelemperî mele û muderîsên wan kurd bûne. Her wisa pîsporên vê yekê ku ders didan gelek ji wan, xan, mîr û mezinên eşîran bûne. Bi erebî, farisî û kurdî ders dane. Tevahiya zanîstan tê de hatine dersdayîn û di nav wan de kurdên ku diwan û helbestên edebî, wêjeyî û zimanzanîne bi kurdî nivîsîne gelek bûne. Jêderk; Qanatê Kurdo*** Medreseya kurdî gelek dîrokî ye;

zanyarên wêjeyê ku hunermendên dema xwe ne, ew jî pir in lê ji sedî heştê hin di pişt perdê de ne. Jê re xebatek bi sazûmanî, bi qomîte û qomîsyon pêwîst e. Divê ku bi neteweyî lêxwedibûn çêbibe.

Hinek medreseyên navdar ku li Kurdistanê bakur, di nav gel de bi piranî jê tên xebardan ev in:

1- Medreseya Sor a Cizîrê. Melayê Cizîrî tê de xwendîye û paşê jî tê de muderîstî kiriye.

2- Medreseya Miksê

3- Medreseya Mîr Hesenê Weli

4- Medreseya Bazîdê

5- Medreseya Cosqê Şêrwan

6- Medreseya Zeynel Begê Mezin Şêrwan.

Hinek ji van medreseyan bi xwarin, vexwarin û razandin bûne. Her wekî Medreseya Zeynel Begê Mezin li Şêrwan. Zeynel Beg ev Medrese di bin rêzîka weqfê de di sala 1000'î ya koçî de ava kiribû. Gelek milkên bi qîmet, aş, bax, baxçe û birên xwe weqfî ser medreseyê kiribû. Salihê kurê Xan Bûdak Mîrê Şêrwanî yê herî dawîn e nebiçîrçîrkê Zeynel Begê mezin e, dibêje ku ew medrese li ser çar beşan hatiye avakirin: Meclîsa dersê, mescîda mêhvanan, xaniyê mitbex û êzingan, xaniyê zexîreyê (kîler). Feqî bi tevahî xwarin, vexwarin, razan, serşûştin û cilşûştin, xerckirinên wan ê rojane li ser weqfa medreseyê bûn. Mehaneyên muderîsan jî, xwedîkirina zar û zêçên wan jî girêdayîbê bi weqfa medreseyê ve bûn. Jêderk; destxeta Salihê kurê Xan Budax bi erebî ku Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê rêveber Kerem Soylu wergerandiye rûpel; 37

Hêjayî gotinê ye ku mirov ji Medreseya Aqtepi û ji edîbên wê yên navdar hinekî biaxeve.

Medreseya Aqtepi, digel xwedî û rêveberên xwe di dawîya pêvajoya sedsala 18'an de û di sedsala 19'an de, di çaryeka wê ya ewil de gelek bi rêkûpêk xebitiye û pêş ve çûye. Bi taybetî piştî mezinê malbatê Şêx Hesenê Nûranî ku wefat dike rewşa xelîfetiye hêdî hêdî ji rêzîkê radibe.

Mezinê malbatê Şêx Ebdurehmanê Aqtepi xelîfetiye nake, bi lêkolînên zanistî û çand û wêjeya ya kurdî re serê xwe diêşîne. Şêx Ebdurehman, Mihemed Canê birayê wî Mihemed Kerbelayî yê kurê wî her yek di warê helbest, çand û wêjeya kurdî de lehengek e. Hersêyan jî diwanên wan ên helbestkî hene ku di warê fesahet, belaxet, çand û wêjeyê de gelek hêja ne. Bi rastî gelek pêwîstî bi lêkolîneke dorfireh heye ku mirov li ser vê medreseyê bişopîne. Ev yek divê ku ji alî Enstîtuya Stenbol û Amedê ve bête lêkolinkirin.

Çend Serpêhatiyên Medreseyan

Berhevkar: Omer FÎDAN

1- Gilor Be Dibe

Gundiyeke dewlemend rojekê tevahiya feqiyên hicrika gund vedixwîne mala xwe da ku ziyafeteke xurt bide wan ka ku belkî jê re diayan bikin û bibin sebeb ji çûyina wî ya bihiştê re. Malbat bi rastî jî xwarineke heja dide feqîyan; feqiyên ku zik têr be ji çav îla birçî ye. Feqî dixwin û jî ser sifreyê dikişin ciyê xwe. Yek dimîne. Dixwe, dixwe, dixwe...

Xwediyê malê ecêb dimînin, çavên xwe jî ser feqî nadin alî. Mêrikê xwediyê malê diheyire, devê wî jî hevdu diçe û ihtimaleke mezin e ku di dil xwe de dibêje; 'Malmîrato ka ne ya te ye, qey kadin jî ne ya te ye?' Jixwe halê jinikê ne hûn bipirsîn û ne jî ez bibêjim. Jinika ku reş bûye wek qîr; ya ku mirov dibêje qîna jî quncikê cenimê derxistine, kirine zikê tendûrê, jî wir derxistine kirine zikê sobeyeke qereçî, jî wir derxistine dane ber beroşkê, jî wir hilanîne rûyê wê di binê beroşkê dane bi derbekê spî dibe, ew dimîne ku ziravê wê di devê wê de bavêje.

Feqiyê min û te yê ziktêr ê çavbirçî bi tu awayekî têr naxwe û jî ser sifrê ranabe. Hevalê wî şerm dîkin û ku piştî xwediyê malê dikeve wan, awirên tûj didin hevalê xwe da ku jî ser sifreyê rabe. Her çiqas çavê wî li xwarinê be jî mecbûr dimîne û niyet dike ku jî ser sifreyê rabe lê dinihêre ku nikare jî ciyê xwe rabe. Wisa xwarî ku marê kor were binî nikare xwe tev bide. Hevalê wî dibînin ku nabe, tawikekê peyda dîkin, hevalê xwe lê siwar dîkin û ber bi mizgeftê ve diçin û dibêjin; 'Bila li hicrikê rakeve ew xwarina ku xwarî wê bimahîne û bê ser hişê xwe.'

Li ber mizgeftê malek hebûye; maleke ku zêde dewlemend nebûye. Jinikê pêşî li feqîyan girtiye û gotiye:

-Kerem bikin werin li me bibin mêvan, bibin hevparê şîva me û jî me re diayan bikin da ku em biçin bihiştê.

Talibê feqîyan gotiye:

-Xaltîka delal, em spasdar in. Em nikarin tu tiştêkî bixwin. Xwezî te zûtir bigota em qet nedichûn mala jorin. Mala te nêzîktir bû em ê bihatina mala te.

-Bi navê Xwedê wiha nabe. Min ji bo we xwarin çêkiriye gere hûn werin bibin mêhvanê min.

-Xwedê xêra te qebûl bike lê em nikarin bixwin. Înnemel e'malû binniyetî*. Înşaela Xwedê wê xêra te qebûl bike.

-Feqîno, ehlê dinino! Ji kerema xwe re xaltîka xwe neşikênin kerem bikin werin gilore bixwin. Min bi vê extiyariya xwe çêkiriye, min neşikênin.

Feqî tev difikirin da ku wê çi jî jinika extiyar re bibêjin. Bi çi awayî xwe jî ber jinikê çep bikin û hevalê xwe bigihînin hicrikê. Tev li hevdu dinihêrin, şerm dîkin ku bersiva 'na' bidin jinikê lê mecbûr in ku li hevalê xwe jî bifikirin. Berî ku wê talib dest bi gotina xwe bike feqiyê ser tawikê bi zor û heft belayan serê xwe bilind dike, dinale û dibêje:

-Gilor be dibe. Gilor xwarinek sivik e. Ez dikarim tasekê du tasan bidim ser medê xwe. Hevalno! Divê ku em xaltîka xwe neşikênin. Ji bo çi hûn ev qas di ber xwe didin.

Herêma Amedê

2- Hêstira Pîr

Li gundekî rojekî serê sibê ku gundî jî xew radibin dibînin ku hêstireke spî, bêhevsar û bêxwedî li ber derê mizgeftê diçêre. Gundi bi telaş jî hevdu dipirsîn ka kesî qet tiştêk wiha ditiye? Ka ev çi ye? Gelo hêstirên spî jî hene? Naxêr. Kesî ku tiştêk wiha dîtibe an bihistibe, dernakeve di nav gundiyan de. Gundi li hev dicivin û biryara pirsîna jî seyda derdikeve. Lê mixabin seyda ew roj ne li gund bûye.

Feqî geremol û teşqeleya li ber mizgeftê dibînin û dertên derve ka gelo jî bo çi gundi li ber derê mizgeftê civiyane. Di dil xwe de dibêjin; 'Îro ne in e, xutbe tune ye, heke ku hebe jî hîna zû ye û gundi jî ji xeyrî roja inê wiha bi tevahî nayên mizgeftê. Gelo xêr e? Çi bûye?

Ji hewşa mizgeftê derdikevin silavê li gundiyan dîkin. Gundi ku feqîyan dibînin kêfa wan tê û bi hev re dipirsîn. Ka gelo ev çi ye? Dibe ku elameta qiyametê be? Çi dibe ew dizane lê divê ku feqî xwedî bersivêkê bin. Bi şev û roj di hicrikê de ne û dixwînin. Divê ku di derbarê vê mexlûqatê de xwedî fikrikê bin. Her çiqas bi qasî seyda nizanibin jî; wan jî li reş û spî nihêriye û ihtimaleke mezin wê bikaribin pirsên gundiyan bibersivînin.

-Ev çi ye talib?

-Tu dikarî me agahdar bikî?

-Gelo qiyamet nêz bûye?



-Di wan pirtûkên qalind de behsa tiştêkî wiha dike?

-Gelo em ber bi karê xwe ve herin ya bikevin mizgeftê tobe bikin?

Talibê reben ji teze tiştêkî wiha dibîne û her çiqas wek gundiyan nebe jî; ew jî ditirse lê nizane wê çi bibêje. Bi xwe dimîne heyirî. Feqiyekî ku hîna negihîştîye 'pirtûkên qalind' lê zîrek e xwe davêje pêşîya talib û ji bo ku wî jî wê ezabî derxe dibêje:

-Maşela. Maşela ji rehma Xwedê re. Vê hêstira hanê tu emir ji kesekî re nehiştîye. Qet tune be 100 sal emir kiriye. Ka lê binihêrin yek tayek mûyê reş di canê wê de nemaye. Extiyar e lê li ser xwe ye. Maşela, maşela... maşela ji rehma Xwedê re.

Herêma Serhedê

3- Deful Bela Ye

Piştî ku Osmanî hildiweşe û li Anatolyayê komara nû tê avakirin, zagonek bi navê 'Tevhîdî Tedrîsat' tê derxistin û medrese tên girtin. Di şûna medreseyan de dibistan vedibin û ji gel tê xwestin ku zarokên xwe bişînin van dibistanan. Li cihên ku kurd lê dijîn komara nû bi medreseyan re nikare serî hilde ku bi tevahî wan bigire.

Ji ber ku dibistanên nû li wargehên kurdan zêde tune bûne û hişmendiya kurdan wek ya berê bûye; wek 'nanê mele pehti ye'; zarokên xwe şandine medreseyan, xwe jî dibistanên nû; mala cîna dûr xistine û gotine 'lekum dînûkum weliye dîn'.*

Li gundekî Farqîna navçeya Amedê jî axayekî mezin(!) hebûye. Kurê xwe yê mezin zivistanan şandiye navçeyê dibistanê û havinan jî şandiye hicrika feqîyan ku ji aliyê olî ve jî bi pêş bikeve(!).

Ji ber ku axa ye, ji aliyê qûnê ve doza şêxîtiyê jî dike û gelek dewlemend e hikmê wî li ser ehlên dibistanê jî derbas dibe û bi awayekî kurê xwe dide pêş. Dawiya her salê diçe û rewşa qarneyê kurê

xwe jî mamosteyan dipirse. Wek ku me got hikmê wî di mamosteyan de derbas dibe û mamoste jî an dibêjin 'âlâ' an jî 'pekâlâ' jî bo rewşa kurê wî ya di dibistanê de.

Ku pîrsa rastî bê kirin; kurê wî nikare tu rêxekê jî belav bike. Beradayekî li dera hanê ye. Ker ku ker e çend caran di rêxekê de here wê rêyê dike rêçol jî xwe re û bêyî hevsa an jî rêber dikare di rêçola xwe de here û bigihîje armanca xwe. Lê kurê şêxê me kerekî ku ji keran jî xirabtir e. Ancax ji keran re lûlika hîlbike. Rewşa wî hem di dersên dibistana fermî de û hem jî di yên medreseyê de bi heman awayî ye.

Şêx her sal piştî ku diçe dibistanê li rewşa kurê xwe dipirse; di heman demê de diçe hicrikê û li wir jî ji seyda rewşa kurê xwe dipirse. Şêx ew şêx e ku sawa wî li navçeyê jî heye û gotina wî li wê derê jî derbas dibe, qey ew ê sawa wî li ser gundiyan wî tune be? Wê gotina wî li gundê wî derbas nebe? Çiqas car jî seyda rewşa kurê xwe dipirse gelo 'ala'ye an 'pekâlâ' ye seyda jî wek mamosteyan dibêje; 'pekâlâ'. Mebest ew e ku şêx jê dûr bikeve û wî nede hember xwe.

Sala 5'an ku kurê wî dibistana xwe ya seretayî diqedîne; şêx diçe ku diplomeya kurê xwe bigire û binihêre ka gelo 'âlâ' ye an 'pekâlâ' ye. Mamosteyên kurê wî wek ku her tim gotine dişa dibêjin 'pekâlâ' û şêx berê xwe dide hicrikê cem seydayê kurê xwe. Şêx tê hicreyê û gazî seyda dike ku bipirse ka gelo kurê wî li wir jî dîrsa xwe qedandiye, bi serketiye an na?

Sihûda reş spî nabe! Seyda ji canê xwe aciz bûye, dişa kurê şêx kezêba wî reş kiriye, bi saetan dîrsa kurê şêx daye, lê tu tiştêk bi serê wî ve nezeliqiye. Bi ser van tiştan de ku şêx jî bi awayekî nexweş gazî wî dike; mêjiyê wî di kasika serê wî de dikele, bi hêrs diçe li hember şêx rûdinê, bi dengê bilind hal û ehwalê, sebebê ziyaretiya axayê xwe dipirse. Şêx wek her sal bi awayekî nexweş dişa dibîşire û dipirse:

- Seyda rewşa kurê min çawa ye? Xwendina xwe qedand? Âlâ ye an pekâlâ ye?

Lê mixabin, sebra Eyub Pêxember bi tu kesî re tune ye. Seyda bêhtir hêrs dibe û dibêje:

- Wele axayê min çi ji te veşêrim, çi ji Xwedê. Rewşa kurê te ne âlâ ye ne jî pekâlâ ye, rewşa wî deful bela ye. Ez ê bibêjim qedand û ez û te û wî em ê ji hevdu bifilitin.

Herêma Farqîne

Em Dikin û Nakin Tiştêkî Jê Fêm Nakin

Evdile KOÇER

Keneka bêmane û nenaskirî li ser rûyê feqîro ye. Ji wan mij û dûxana qermiçekan kifş e ku ne ji dil e!

Kena wî hêj ku li dar e ji ber xwe de diçilmise û wekî pêtekê zûka ditemire. Emrê kena wî ya nebalixbûyî wekî taviya biharê xwe bi ser rûyê wî de dide der.

Tu dibêjî qey ji marketê du bacanên sor ên kerik kirîne û danîne ser her du lamên xwe.

Jixwe mêrê diya me kena xwe ya pîroz jî wekî wan bacanan li ser serê me bi kar tîne.

Kenê guran pê tê; dilê me gelekî pê dişewite.

Destê bişirîna xwe bi bejna kena xwe ve ji nişka ve wekî bêaran hildide û bi hirehira tiqetîqa xwe ve dixwe dareke stûr û dixwaze li gorî kêfa dilê xwe di serê me de bişkêne.

Dixwaze bi çend kêlikên kena xwe ya kerik ve me dil bigire û vekişîne nav şkefta desthilatdariya xwe.

Diranê gerîneka desthilatdariya xwe bi wê kena xwe ve tûj dike û dimîne li benda me.

Gava ku bêhemdî jî dest bi merasîma kena xwe kir, dilê wî heye ku em dilê xwe jê re vekin û bibin xulam û qerwaşên siya kena wî ya sexte.

Ez bi xwe jî bi gotina kurdi ya herî popûler li xwe mikur werim ku gelek caran ketime xefikên kenên wisa. Min jî dixwest ku wekî zarokan kena xwe bidim destê kenên din û hin tiqetîqan lê zêde bikim, lê min çend caran xwe di gerîneka desthilatdariya kenên wisa de didît.

Kena wî ne ji orgazma xweşî û kêfxweşiyekê tê; lê guhê xwe dide rihê marê desthilatdar ê ku xwe di nava wî de dilivîne û bangî kena wî dike. Bişirîneka xwe nake qurbana espiyêke gulgulî; lê ji bo ku kirasê wî marî nû bike sed miqam û awayan dide çiqilên kena xwe.

Me heta niha nedîtiye ku doxîna kena wî qetiyye û bi têra dilê xwe kiriye tiqetîq. Serban û berbanên dilê xwe bi ava tiqetîqan neşûştiye. Hinavên xwe bi bayê kenê yê misk û emberî ve venemaltiye. Çi heyf e ku peqpeqokên kena wî li ber çavê tu ciranî neketiye.

Ji ber ku ken û tiqetîqê wekî şimika ber devê deriyê xwe biçûk dibîne.

Loma me dîtiye ku di civatên qerase de heta ku bê mil îşkên cîdiyetê dide qûna xwe û bi vî awayî dixwaze ku em jê re hurmet bigirin û bibêjinê, "Lawê xalê bavê xwe..!"

Tê zanîn ku desthilatdar serê pêşîn di civateke biçûk de xwe balix dike û dû re jî civatên wisa dadiqurtîne gewriya xwe.

Em naxwazin bînin bira camêrê me ku li gorî baweriyêke Misirîyan Xwedê jî vî dinyaya biçûk ne bi gotinekê lê bi kenînekê afirandiye. (Çavkanî: Sanders, Barry, Kahkahanin Zaferi, Ayrinti Yay., Istanbul, 2001)

Dizane ku di vî garana dinyayê ya bê ser û ber de, çiqas ku diwarên cîdî li xwe bike çiqas ku bikaribe hemû xewn û xeyalên xwe bike qurbana jiyanêke kifşkirî, dê ewqas bikaribe di nava aferîm û çepikan de sobeberî bike.

Kenîn di hemû gulvedan û tiqetîqa xwe de bera psikolojiya desthilatdariyê dide, lê ew kena xwe dixwe textê desthilatdar.

Heke em xwe şaş bikin û bibêjin, "ken û girîn cewiyên hev ên her du dinyayan in!" belkî ne bi dilê camêrê me be.

Hema em rasterast xwe bigihînin pêlekên helbestrêsinê: Heta niha payîzeka girînê jî bi ser dilê wî de nehatiye. Heke hatibe jî ji deriyên dilê wî derbas nebûye.

Heke xwe şaş bike jî dixwaze hêsirên xwe di wê kona desthilatdariyê de birijîne. Bi van hêsirên nelê ve pêlî derencikên desthilatdariyê dike. Bi niçeniç û mizmiziya xwe ve xemlekê dide girîna xwe.

Ji vî yekê dûr e ku ken û girînen jidil hemû sinc û berên desthilatdariyê dirûxîne.

Rebeno hêj bawer nake ku, "Dermanê rih û dil û bedenê, ken û girîn e!"

Ji ber ku dilê xwe jî ken û girînê re venekiriye, her dem bayê 'nexweşiyekê' li bedena camêrê me dide.

Zordestan bi xêra îdeolojiyên xwe yên dinî, polîtîk û civatî ve gelek caran pê li kena wî kirine û nehiştine ku rebeno bi têra dilê xwe bigirî.

Lê niha dor dora wî ye: Bi isûl û fesaleke nû ve, bi metod û rengekî nû ve, bi ken û girînê xwe ve çavên xwe li textê desthilatdariyê xweş dike.

Demarekî desthilatdariyê li benda bişirîn û hêsirên camêrê me ne.

evdilekocer@yahoo.com

Sar

Ronî WAR

Ev çendak e ku ez tim dibêjim a îro ez ê porê xwe biqusînim a îro ez ê biqusînim lê li hev dernakeve û tim dimîne. Îro me li hev anî. Va ye hê nû dor hat ser min û ez di qoltixa berber de rûdinê û di mirêkê de li xwe dinêrim. Mala salan xera bibe çi kiriye ji min! Hela ji xwe re li porê min î sipî, li qermîçokên ku êdî dixwazin cih ji xwe re di rûyê min de vekin û lê paldin binihêre, çawa li fersendê digerin û xwe dane benda wextê ku derbas be û ew jî bigihîjin miradên xwe!

Ez di mirêkê re dibînim ku wa ye Şerîf tê. Di mirêkê de çavên me li hevrast tî. Gava ku ew dibêje; “sihet be” ez bi çavan pê re dibişirim. Lê ecêb e îro hew vêya tenê dibêje û derbas dibe dihere. Çawa ez ji dest berdarm îcar nizamim. Qey gur li derekê miriye. Şerîf û min wilo bihêle û here. Wê tiştekê tê de hebe, lê çi? Nayê bîra min ku min dilê wî jî hiştibe. Xem nake, wê niha derkeve ortê.

Piştî ku ew ji ber çavên min wenda dibe berber hêdika dibêje:

“Yaw viya dîn û îman ji me stend û êdî em of kirin. Her roj tê û wek teyba ku heman stranê bibêje serpehatiya xwe ji nû ve dibêje. Êdî ez ji wî bêtir bi heyata wî dizanim. Kes nema dixwaze ew nêzikî wan bibe. Çawa digihîje hinda wan, dibêje a ji te re û dest pê dike.

Nizanim gava ku ew di rê de hatiye qala şêxekî kirine, ew çûye cem şêx û bi nexweşiya wî derxistiye û gotiye divê tu rast berê xwe bidî nexweşxaneyê!

Nizanim çawa wî daye rê û çûye Enqereyê emeliyat bûye!

Ev çend car e qapaxa serê wî vedikin!

Texsiya ku firotiyê mêrik nayê dewra wê nabe ser xwe û tiştê di navbera wan de bihurî ye. Çawa di dawiyê de li Enqereyê erebeyaya xwe ya ku mêrik nayê dewra wê nabe ser xwe dibîne û tê de rûdinê û gava mêrik tê dibêje; “Xêr e tu çima di erebeyaya min de rûniştîyî?” ew dibêje; “erebeyaya te ya çi ye? Ka ewraqên te” û ewraqan digire û dibêje; “de bimeşe em herin hinda noterê û ez ewraqê wê binim ser navê te, yan na ez ê li te gilî bikim û bibêjim vî zilamî texsiya min diziye.” Çawa mêrik dibe û xwe ji dewra wê erebeyê xelas dike û hê çi û ne çi.

De ka bibêje bavê min, ma xêr e tu vana tevekan ji min re dibêjî? Çima tu min jî dikî şirikê emr û heyata xwe, derd û kulên xwe?...”

Ez keniyam û min got; “Ka hela bes, malnexerabo te ji wî xerabtir kir! Hela hiş! Qene ez wî fêr dikim, le hûn çima lê wer dikin û dilê wî dihêlin?”

Va
ye hê nû
dor hat ser min
û ez di qoltixa
berber de rûdinê û
di mirêkê de li xwe
dinêrim; mala salan xera
bibe çi kiriye ji min! hela
ji xwe re li porê min î sipî,
li qermîçokên ku êdî
dixwazin cih ji xwe re di
rûyê min de vekin û lê
paldin binihêre, çawa li
fersendê digerin û xwe
dane benda wextê ku
derbas be û ew jî
bigihîjin miradên
xwe!

Berber got; “Karê min tune ye îcar ez rabim derdê wî bikişînim. Ne carek ne dudo ne sisê ma xêr e? Derdê me ne bes, îcar karê me ma guhdarkirina Şerîf beg lo! Bîska din hat xwest rahêje mûçinkê, min nehişt û min got; “Karê min pê heyel!” Wî fêr kir ku ez naxwazim ew bê cem min, meşiya û çû.

Min got; “Hayloor mesele hat fêmkirin. Loma niha hew silav da û got; “Sihet be” û çû.

Piştî ku min porê xwe qusand ez ji cem berber rabûm û min rast berê xwe da hinda wî û ez hatim li kêleka wî rûniştim.

Çiqas kêfa wî dihat ku ez çûbûm hinda wî. Xuya ye ji wextê ku emeliyat bûye û vir de kes nema bi xweşi tê hinda wî û li wî guhdarî dike. Tim ew xwe li hinekan digire û dihere cem wan.

Wî got çi, min guhdar kir. Bêyî ku ez rûyê xwe tîrş bikim û bala xwe bidim ser tiştekî din, ez li cem sekinim û bi sebir tiştê ku min deh caran jê guhdar kiribû dîsa guhdar kir.

Lê Lê Nelorîne; Heyranbêjên Gundê Me jî Nemanê

Omer DILSOZ

Lo!...Li gundê me heyran hebûn; ji kaniya çavên keçik û lawên gundê me dihatine pê, dibûn awazên kizirî, dibûn ah û axînkên evînên dilbijok, yên berêvaran, dibûn wext û danên vedizî di navbera du dil û çar çavan li ber dîwaran, dibûn kezî û biskên şekirî, simbêlên nûristî li nav hev digevizîn li kuçetariyên kadîn û bêlayan, û, erê û ev heyran bûn yên ku dibûn zimanê dilgeztî û dildaran, dost û yaran, aşiq û evîndaran...

Êvarî şor in

Li rexên rûbaran werdek û por in

Heçî navbera du dil û çar çavan fesadiyê bike

Bila ji dest û piyan seqet, bi her du çavan kor bin

Lê!...

Li gundê me lawje hebûn; bi dengêkî zîz newal û dol û şikêr ker dikirin, zinar û lat ji ber nalîna wan diheliyan, gelî li ber gelî deng vedida; ew ji çirûska çavên keçik û kurên gundê me diherikîn bi kesereke kûr. Lê çendîn bi tam bûn, bi tam dixistin ew jivanên di nav gêra strî û dasiyan de, bêlome, bo dilê dîn, dilê heyranbêj yê ku li ber bêhna sîng û ber û bedenên zirav sewdaserbûyî...

Gelî li ber gelî

Bayekî sar tê û dilê jar li ber keli

Heçî navbera min û şengedosta min fesadiyê bike

Bila bi her du dinyayan biçîte agirî û bibîte xwelî

Duhî çû, ew roja ronak xwe berda pişt çiyayên berz û bilind... Dengê heyranbêjan ker û mit bû, evîndarên gundên min evînên xwe perjan kirin, biyavekî nû peyda bû li civakê; niha, di dûr û nêzîkiyan de çavreşî çirûskeke me, lê ewan heyranbêjên ku zaroktiya min kirine kesereke kûr, di çend xêzikan de bo te diporînim, dikim gazin û lome, kesereke kûr dikêşim û dibêjim belkî rojekê ji rojan çavên xwe deynin ser hev û xwe li zemanê berê li zarokatiya xwe bibînim.

Niha jî rûkariyê bi 'xwe-dika' dilê xwe re dikim:

Di nêzik û dûriyên dilê min de tu çirûskeke nîv-vemirî -yî- ; di tebaxa bi keml û gihîştî de, payîzeke berwext, umrekî têrnedîtî, wekî çolekê birçiyê xweziya diloqeke avê, xunaveke ji dili maliştî -me-.

Li çola dilê min avzêleke sîber -î-; di vê sebata têrêş û kesertijî de, wekî pelekî berba, ha li vê dolê, ha li wê newalê hilawîstî -me-.

Ji 'bê'yekê dawêşandî,

Bêlayeke berbê -me-

Tu....

Di rabûn û rûniştina min de henaseyeke vejêr -î-; di nîsana umrekî de, kanûneke qerimî, çirayeke zûvemirî, kuçikekî zûtefiyayî, di zistaniya hezkirinê de tayeke sarogerm -im-

Serê min wekî xilêfa mêşan e, dike guve guv...

Mejiyê min wek kewara mêşan e, dike vize viz...

Anektodekê ji duhî di ber çavên xwe re diborînim; hilmeke sar, kesereke bédûmahîk li ser kovanên min dinişe.

Li gundê dilê min de, na na, li gundê xewn û xeyalên min de, na na, li gundê zihn û herzêla hişê min de; erê erê, li çala jêrhiş û kûrhişê min de heyranbêjek dilorîne; heyran jarooo ez dimirim....

Heyran jaro ez dimirim

Çavên reş reş in, kilê subhanî nagirin

Keçik û lawên wî zemanî

Serve serve dost in, ji dilê kûr da gawir in

Lehengê Numareya 8'an

Kamran Simo HEDILÎ

Ci dema ku ez çavbirçitî û xwestina xapandin û kuştina kurdan ji rêveberên tirk dibihîzim an di televîzyonan de dibînim, tiliya "lehengê" numareya 8'an tê ber çavên min û kenê min tê.

"Lehengê" numareya 8'an ew qasî çavbirçî ye û ji bo xapandinê ji xwe bawer e, fêr nake ku hinên din jî hene û dibe ku neyêne xapandin. Hesabê perên ku ji xapandinê dê qezanc bike dike û berê xwe dide doktor. Lê ew tê xepandin û zerarê dibîne. Ez zêde dirêj nekim xwendevanên heja, fermo hûn û çiroka "lehengê" numareya 8'an bi hev re ne.

Doktorêk, di rojnameyan de reklama şeweyê dermankirina xwe dide. Di reklamê de dibêje: "Ez hemû curên nexweşiyê derman dikim ku ez derman nekim ez ê 10 qatî pereyên ku hûn ji bo lênêrîna nexweşiyê didin ez ê bi paş ve bidime we". Yekî çavbirçî û ku karê wî xapandina mirovan e vê reklamê dibîne û hema ji xwe re dibêje: "Ez herim ji doktor re nexweşiyê ku ew qet nizane bibêjim û ji xwe re 10 qatî pereyên xwe, pereyan ji doktor bistînim. Ez ê ji doktor re bibêjim çêja devê min nemaye. Ew çî bide min, ez ê bibêjim ez nizanim bê çî çêjê dide". Yekser berê xwe dide cihê doktor, li derî dixwe û diçe odeya doktor. Silavê li doktor dike û derdê xwe dibêje: "Doktor ez çî dixwim ez bi çêja devê xwe nizanim. Ez çûme ba gelek doktoran lê kesî ji derdê min re derman nedît. Ez hevî dikim ku tu ji min re dermanekî peyde biki." Doktor têdigihîje ku mêrik hatiye wî bixapîne û 10 qatên pereyên lênêrîne ji doktor bi paş ve bistîne. Doktor dibêje baş e tu pereyên lênêrîne bide, paşê em binihêrin bê derdê te çî ye? Tu dizanî eger ez ji derdê te re derman nebînim ez ê 10 qatê pereyên te pere bidime te.

Mêrik pereyê lênêrîne dide û tê ba doktor û dibêje ez amade me doktor.

Doktor careke din ji mêrik dipirse: "Te got ku te çêja devê xwe winda kiriye ne wisa?" Mêrik dibêje: "Belê ez benî, ez hingiv an jî tiştêkî wek jahrê tahl bixwim ez nizanim bê kîjan tahl e an şîrîn e." Doktor ji keçîka ber destê xwe re dibêje: "Keça min ka qutiya numareya 8'an bîne" keçîk diçe qutiya numareya 8'an tîne dide mêrik. Doktor ji mêrik re dibêje qutiye veke û dermanê di qutiye de tehm bike! Mêrik qutiye vedike û tiliya xwe li dermên dide û dibe devê xwe, çawa tiliya wî digihê devê wî fêr dike ku gû di qutiye de ye û gû xwariye. Di cih de dibêje: "Doktor te gû da min"? Doktor dibêje: "Aha te fêr ku gû di qutiye de hebû tu baş î, di çêja devê te de tu problem nîn e tu dikarî herî mala xwe."

Mêrik tê malê û her li pereyên ku dane doktor difikire. Dixwaze pereyên xwe bi paş ve bigire. Nexweşiyên ku hene tîne bîra xwe û li ser wan disekine bê kîjanê ji doktor re bibêje. Dixwaze vê carê nexweşiyekê bibêje ku doktor jê re derman nebîne. Paşê nexweşiyekê peyde dike. Hema berê xwe dide cihê doktor, li derî dide û diçe odeya doktor.

Doktor dibêje: "Te xêr e tu disa hatî? Nexweşiya te çî ye?" Mêrik dibêje: "Doktor min hişê xwe winda kiriye. Tu vêga tiştêkî ji min re bibêjî ez piştî deqîqeyekê ji bîr dikim. Ez xwarina sibê nivro ji bîr dikim. Ya nivro ji êvarê ji bîr dikim. Ez ji malê derdikevim nizanim vegerime mala xwe. Gelek caran ez navê jina xwe û zarokên xwe ji bîr dikim. Ez hatim ku tu dermanekî ji nexweşiya min re bibînî."

Doktor weke cara pêşîn ji mêrik re dibêje: "Here pereyên lênêrîne razîne û were ez ê li nexweşiya te binihêrim." Mêrik diçe pereyên lênêrîna xwe dide û bi paş ve tê. Doktor ji keçîka ku li ber destên xwe kar dike re dibêje: "Keça min qutiya numareya 8'an bîne" mêrik dema navê numareya 8'an dibihîze ji doktor re dibêje: "Doktor di numareya 8'an de gû hebû, tu disa dixwazî gû bidî min?" Doktor ji mêrik re dibêje: "Baş e hişê te hate serê te êdî tu ne rîya mala xwe û ne navê jin û zarokên xwe ji bîr dikî. Rabe tu baş î û here mala xwe."

Vê carê hê xirabtir li mêrik tê û nizane çî bike ku bikaribe pereyên xwe bi paş ve bigire. Hemû curên nexweşiyê di serê xwe de dibe û tîne paşî li ser nexweşiyê ku ne mumkun e ku doktor derman jê re bibîne disekine û berê xwe dide cihê doktor. Mîna berê li derî dixwe û diçe jûrê. Doktor ji ber radibe û pîrsa hatina wî dike: "Tu vê carê ji bo çî hatî?"

Mêrik dibêje: "Doktor derdê ku bi min ketiye, Xwedê nede dijmînên min. Ez ji mêranyî ketime. Tu rayên mêranyî bi min re nemane. Ez wisa ji mêranî ketime ez êdî nikarim çêran jî ji kesî re bidim. Berê min rojê ji 10 kesan re dida çêran bi wan re min şer dikir û paşê ez diçûm mala xwe. Vêga ez ne dizanim şer bikim û ne jî dizanim çêran bikim."

Doktor mîna her du carên din disa ji mêrik dixwaze ku pereyên lênêrîne razîne û were da ji derdê wî re derman bibîne. Mêrik diçe pereyên xwe dirazîne û tê ba doktor disekine. Doktor li mêrik dinihêre û gazi keçîkê dike: "Keça min here qutiya numareya 8'an bîne". Çawa dengê navê qutiya 8'an tê mêrik hemû pereyên ku dane doktor ji bîr dike û dest bi çêran dike. "Doktor ez di nivê qû ...diya te kim, kurê qehpikê, ma ji qutiya numareya 8'an pê ve li ber destên te tu qutiye din tune ne? Hey qûnekê kurê qûnekan, bênamûsê kurê bênamûsan de ji min re bibêje!"

Doktor ji cihê xwe jî ranebe û bi aramî bersiva wî dide: "Baş e mêranyî te hate te, tu disa dikarî ji xelkê re çêran jî bidî û tiştên din jî li malê bikî. Here û careke din newe gû nexwe. Mêrik diçe û careke din bi paş ve venagere."



Ger çend bêjeyên min mabin
Li ba te
Li hevraziya birahiyên te mabin
Mîna ferxikên sîselenê
Mîna taya nêrînên diya xwe ne
Ku bi vî halê xwe yê jar
Li çiyayan gefan dixwe

Û dengê min ê lûs û nerm
Mabe di paxila bextê te de
Pêjna hevdengê lingên maran
Ku civandina gevezîniyê
Ku li ku derê dinê estetik bikalê
Pêşî tiliya Picaso ye dihare

Bigire hemîyan ji xwe re bike ristik
Ji xwe re bike xeml û xêzim
Bo evîna givarek givar
Bo beyta jiyanek jînda
Li ser çil kêran e termê min
Tu guh nede min
Ê min ji havîna evînê ye
Ê min ji hêvîda gerdûnê ye

Jixwe morîka diya min ew şev qetiya bû
Bi gavên çûyîna te
Bi guvîna gevriya min kêr
Kêrek koyekî nêr
Di gavên nehatina te de
A bila ev jî cotek guhar bin
Diyariya birînên şînekir
Ji bo pelegoha temenê te

* * *

Bigire û bavêje nav qêrîna Munah
Giriya min a li ba xwe
Yeko yeko bişewitîne pîneyên hilawestî
Bombabarane bajarek baskî de (katalogo)
Û ji dil ve bi wêneyên min ve dalqîne
Ji dil ve bi navê min re bibêje
Rojê sed car Guvernîca
Rojê sed car Helepçe
Û sed rojan carekî Uwerçinka
Û bizanibe ew komkuji sawa hinan e
Her qada lêkdanê egîdên xwe diwelidîne
Bizanibe carinan welatek seranpê ji birçîbûnê
Pêşîra kilamên dengbêjan jî dimêje
Carina kevalek ji bes e
Jîpek cûyî ye pêşenî rijandine

* * *

Ê min ne jêhatî bûne
Dibe ku lêhatîbûn be
Jîna min
Li ser ruyên katebenayên şukulîn
Ev timî giroyê her demî
Ev timî derengmayiyê her kesî
Û pirsekî bi şîrîna evîndarên din
Ê min ne kewejîna dayikan e
Ê min rewrewkê çolan nîn e
Heya ku dengê gaziya kevîran
Govakiya stêrkên li dinê
Dengbêjiya kêzikên kêçka regel
An jî kevçîlek ji birûyên te (ji destê te)
Gewreberhema te ya şahkar
Ez
Qêjîna Guvernîcayê

Ezîz XEMCIVÎN

Jiyana Tentenekirî⁽¹⁾

Bendewar im,
ta ko çiçek ji xilmaşiya heyvê bibişkivin..
Bendewar im,
ta ko tîrêjên rokê
li dilsariya şevînê silavê bikin..
Gulnexwîna⁽²⁾ dil,
hilmê bide kevçikên min
bela viyan,
bi firîna pepola peyvhinguvîna kenê te re bijî..
Qeşema xembariyê ji ser cegerê bihilîne..
bela kevoka awirên nêrgizî
ji ser sîwana gulrêj,
mijê bimijîne..
Pişkokên dev û diyalokê veke
sêvên sînga helbestê ciwan in..
lêvên pênuşa nazik
bi pîroziya wan bihinguvîne..
Bendewar im,
Aska⁽³⁾ ciwanik li mêrga giyan biçêre,
hozana hêviya şêrê dilê te germijî..
Sawîrên xêrê,
li ber bayê pêximbernamê bidêre..
Zeviyên çavan hemû kalkivîk in..⁽⁴⁾
Wêneyê gewr,
di hogirîya te de cîhana gewr e..
Dilêrîya te gewr e..
Nihêniya⁽⁵⁾ zemîna dilê te gewr e..
Salên pêrgîna temen
ji temenê min re bûne gulşen,
her rojekê bi gulekê dihûnim,
her çirkekê bi jîneke tentenekirî dirêşînim..⁽⁶⁾
Bendewar im,
Çav baz in,
bi dîtina bêdawî,
hewr ji asîman xwarin..
Rojekê were,
hilata xwe li welatê hêvidar
bi cejna kêlikan diyar bike..
Dem li ser dêman bûye baxçê binefşan
bi dîtinekê
ji germa sînga te, bihara lal em ê av bidin..

14/7/2007

Têbînî:

⁽¹⁾ Tentene: Ciwaniya rêsandinê (Tetrîz). ⁽²⁾ Gulnexwîn: kulilkek sor e. ⁽³⁾ Ask: Aho, Xezal. ⁽⁴⁾ Kalkivîk: kavkulîk, kumik. ⁽⁵⁾ Nihêni: Raz (sir). ⁽⁶⁾ Çirk: Her demjimarekê 60 xulek û her xulekekê 60 çirk e.

Agir û Xwelî

Îlhamî OZER

Dema tu helbestên bê sî
Di avşara devê xwe de dirêsi
Çend deng tên te
Bi çend zimanan dihesî

Dema tu bi sirûştên
Mîna bihuştên çavên xwe
Li min dinêrî
Ki çi zane bi wî arî
Çend dojah vedisên
Çend bihuşt bi şadî û bextewarî direqisin

Dema lêvên te
Çêj û taman pêşkeş dîkin peyvên te
Çend helbestvanên mirî
Dikevin şopa riya te ya bi kelem û dirî
Çend helbest
Bi dil û hest
Ji te re dibin pace û derî

Gula agîrî
Heke tu yê li min biborî
Ez ê ji te re bibim ax û herî
Bo ku tu tekilî û pêwendî ya xwe ji min nebirî

Û bi ad û sond
Tu çi qas bişewitî
Ez dê ew qas bibim xwelî
Heta ku tu bibî bayekî tenik û hênik
Heta ku tu nebêjî “Diriyo tu çima diheli?”

17 gelawêj 2006

Mirî Têne Jimartin

Cîhan ROJ

Mirî têne jimartin...
Nejmêrin,
ji dil de dicemidim

Mirî têne jimartin...
Nejmêrin;
Hûn dê nikaribin xewnan bibînin...

Mirî têne jimartin...
Li dû miriyan peyv nikarin kirasên reş ji xwe bikin,

Mirî têne jimartin,
Kes nikare tu tiştî bixwîne
Pirtûk jî fedîkar in!..

Mirî têne jimartin...
Nejmêrin,
'Ziman li dayikan reşêşin bûye...'

Gulan Nehêle

Mizgîn AYDIN

Barê avê tîbûn e
Û av em in ji tiyan re
di tas û piyal û cer û şerbikan de
tal in di dema vexwarinê de
li biniya siya maziya...
Lê çi vestirandin destên bihevîr
li payîzên berşîr?

Sira avê meriv e
mirazê avê mêrg û mesîl
çendî ku em wiha av û av diçin, Feqî nabêje:
“Ey av û av ey av û av
Daîm diçim dengê te tê
Ji kê re dikî zikrê helal
Ji kê re dikî vê taetê?”

Silav li te!
Ey, çûyîna me wiha av û av
Zanim, mirazê mirinê ye ev çûyîn
û sira min silava min e
wiha, li derdora van çemên bêkiras...
Guhên me tije nebawerî dikin şevên nehatî
di dendika hêjîrê de diheje dinya
li dora hêlîna çivîkên Yezîdiyan
Şengal şeng nîn e
Şeng di xwinê de mane
û Laleş Laleşan venake...
Derew e.
Gul bi xwinê venabe
lê bedenên me vedibin li mirinê
bihar wiha nayê, derew e...
Ya ku nahêle em razên
şiyariya çavên kuştîyan e
li bin balîfa me
li piyala ava me
li ber siya mijangên me...
Lê êdî here çem û çem, here emrê min
helal e li te her tiştê min
Moriyên min ên şînê
Şeraba min a jehrîn
Gustîla min a sebrê
Maziya min a şewitî
Û pênuşa min a xemrevîn
Helal bin li te!
Dema ku kevirê aşê em dihêrandin digot:
“bi ber bayê nekevin”
Lê dengê me yê zîzik, çawa xewa me danî
li ser birçîtiya sedsalan
a li ber devê mirinê...

Evîn nîn bû
lê em dişa ji şîlanên ber deriyê wê bûn
zanîna ku me dizanî
bendewarên bendixanan bûn em

lew me destên xwe şûştibû
 ji gula hinarê
 ji şeraba lêvên yarê
 ji bêhna şîva dayê...
 Me destên xwe zû de şûştibû
 ji baladên bextewarî û perperîka mizgîniyê
 lew, bendewarî bernade gerdena me...
 Zanîna ku em dizanin
 xêra tu gulbarînê nîn e ji me re...

Nebû. Xew şêrîn, gotin zêrîn nebûn
 û lêvên axîn nikaribûn ramûsanên binin biharê
 Wek çirayek li diwarê xelwetxanê
 bizmarkirî, gêjkirî, jibîrkirinê reşkirî
 û bi qehra êvarên bê şowalye hepiskirîne hin tişt...
 Me li kaniya ava sar hişt
 rûyê xwe yê par
 dê gul serî rakin îşev
 û çîmen leheng bin...
 Siyên tenha man tenê
 li ciyên ku karwanên me derbas bûn
 gulên nehatî vebûn li lêvên me
 û êvarên xwebêj xwe pêçan li porê me...
 Me teşî çêdikir ji dara merxê
 bo birîsin hiriya berxê
 lê memikên Delîlayê
 hew dikarin şîr bidin zarên zemawendê
 ew ê, şîrmijên xwe bi xemên xwe yên zivistanê pêça
 serê wan danî ser havîna canê xwe
 û got: Furûxê, rûnê bin siya dara merxê
 û helbestên xwe nehêle li dinê...
 Pûng şahid in, gulberoj dizanin
 me şopek ji nehişt li pey xwe
 bédengiya me ya qurbanî
 fikir ku tenê “erê” derkevin ji devê me
 erêyên ku bûn êşa xencerê
 lê êdî min guh nîn e ji bo te...
 li ku man, yarê me yên hezarsale
 bi tevli gulên xwe yên sedsale
 xeyîdîn, qulingan ew ji rê derxistin an,
 ketin şiyariya şevên nehatî?
 Baweriyên nemayî bûn ku xwe ditirsandin ji me re
 di dema nevbûna binevşan de
 Şewba nedihat, Şewgul li nemanê vedibûn
 Û diwarê me yê bédawî digot
 “her tişt emrê Xwedê ye”
 Dilopên janan dikevin ser gulên geniman
 nan tal e, şerbet û hingiv jî
 Maziçin nîn in êdî,
 gul girtî, şibak girtî, baran girtî ne
 û ya ku em dikin, tenê,
 berhevkirina rondikên gulê û bilbilê ye...
 Çem û çem here û gulên xwe nehêle dilê min
 bila helal be li te tevayên gunehkariyên min
 Here, ez ê vê payîzê dilê xwe
 birêjim li pey te...

13-17 Îlon 2007

